dî alfabeya latini ya Kurdi da çar tip kê mîdîtin. Lî gor wî: *“Tinebûna wan di elîfbêya me de kêmasiyeke berbiçav e.”* O. Sebri dî cîvinekê da lî ser vê pîrsê bî Mir Celadet ra gotûbêj dîke. Lî ser pîrsa Mir Celadet ku ka kijan tip kê mîn, ew dîbê: *“ç p k t ne, ku zaravaye kurmançî ji wan tîpan dagirtî ye.”* Lî ser vê yekê, M. Celadet jî vê bersivê dîdê: *“Rast e ev her çar tîp di zaravayê kurmançî da hene. Lê em dikarin jî tîpên nîzîkî wan (ç p k t) destkewtî bibin, herwekî me bi tîpên erebî dinivîsand. Va ye hemî elîfbêyên Awropî di navbera 29-31 tîpan da ne. Eve elîfbêya me bûn 33 tîp.”* (26)

3.4. Destûrên Celadet Bedîrxan:

Pîştî van rexneyên Osman Sebri, îca dîvê em wan him û bîngêhen ku Celadet Bedîrxan jî bo alfabeya xwe danine lî vir bî rêzkî. Mir Celadet dîbê:

“Me ev bîngêhen ha di dora şeş destûran de gihandine hev.

1- *Ji wan nîqtan pêva ko xasê denganiya zmanê kurdî ne, di şîkl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabêya tirkan nîzing xistin û jê ne dûrketin....*

... bi vî awayî kurdên welatê jorîn (Kurdîstana Bakur-CÇ) û heçî ko elfabêya tirkî dinasin dê bikarin bê dişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bihêsanîti bixwînin.

2- *Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî ên adetî ko di zmanê din de nas in, di elfabêya kurdî de hîlanîn û neguhertin. Bi vî awayî kurdê bikarin elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsanîti fêr bibin.*

3- *Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin. Bê şîk e ko hînbûn, xwendin, nivîsandin û lêkdana herfên serxwe jî yê hevedudanî hêsanîtirin.*

4- Her dengî bi herfeke cihê nîşan kirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dangan bi herfekê an dengekî bi çend herfan, xwe dan alî

Ev awa ji fikra çêkirina elfabekê bi hindik herfan an ji qesda qenc lisersekinandina danganîyê dikare bizê.

...

Ji xwe di tu zimanî de danganî û nivîsandin ne lêvên yekin, û nivîsandin nikare bi tevayî li danganîya wî zmanî bê. Lewre ko kitkit û rengên danganîyê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa diviya bû elfabêya her zimanî ji (50-60) herfan hevedudanî bibe.

5- Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî. Nîşan ji hêlekî di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide wînda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe ên eslî, bîrîşan, û tevî-hev dibin. Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî dişwarîke din e. Ji lewre ji bona tevayîya herfên binîşan me ev (^) pejirand, û bilindek nav lê kir. Ji ber ko dengên herfan hem diguherîne û hem bilind dike, û ji nîşanên wek (.-.-) qenc têt veqetandin. Ji xwe boş bûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.

6- Herfên welê bijartin ko di şiklên xwe de li hev bîn û bikevin hev. Ji lewre diviya bû ko em di nav herfên latînî de bimînin û ji elfabêyên din wek yûnanî û rûsî herfan megirin. Me jî welê kir û elfabeya xwe bi hindik guhertina dengên herfên latînî û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir. Bi vî awayî û gora destûrên jorîn me elfabêya xwe bi sih û yek herfan hevedu danîye. Herwekî di destpêkê de me da zanîn. Sehîtiya ko di hersê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di zmanê kurdî de dengên bîngehî ev sih û yek deng in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê, herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşîyê tîn xwendin. Lê ev fêrgehî ha ne ji guhêrîna cihderka dangan tîne pê, û ji lewre di elfabêyê de nayên nîşan kirin. Ji ber ko elfabê tîne dangan nîşan dike, ne rengê dangan ” (27) (Di eslê vê nivîsê da, Mir Celadet ji dêlva dengê “k” yê va tipa “q” û ji dêlva

dengê “q” yê ji, tipa “k” bî kar aniye)

Him û bingehên alfabeya Kurdi-latini, ku me jî nîvisara Celadet Bedîrxan girt û li jor dani, vekirî ne û hewce nake ew jî nû va bî nîv tefsîrkirî. Her yek jî wan, jî bo daxwaz û hewcedariyekê hatiye pê û ew bî tevayî jî, di nav xwe da bî aheng in û hevûdû temam dîkî.

3.5. Nisbetên dangan:

Herçend Mir Celadet di nav van him û bingehan da nehesibandibe jî, di hilbijartma tipan da, ewî hm prensibên din jî dane ber çav. Çaxa meriv li nîvisên wî yê li ser her tipekê dinêre, ev prensib baştir diyar dîbîn. Di nîşankirîna her dengê Kurdi di tipekê da, ewî ev pîrs jî xwe kirî:

a- Gelo nîvisandîna vê tipê, dê hêsan be yan na? Heke hêsan nîn be, dê meriv çewa karibe wê jî bo nîvisandîna hêsanî bîke?

b- Gava di navbera herdû xalên (destûrên) pêşin da dubendi derkevin, divê kîjan xal esas bê girtî? Di vê rewşê da ewî feyde û xesaran dane ber hev û hêsanîkirîna alfabeyê jî bo Kurdên Kurdistanê Bakur, jî bo xwe esas girtiye. Ewî jî bo feydên biçûk, xwe jî destûrên xwe dûr nexistiye.

c- Gelo nisbete vî dengî, di nav hemû dengên zîmanê Kurdi da çîye? Li pêş bîkaranîna alfabeya xwe ya bî şîklê di Hewarê da, em tê dîgihîjî ku Mir Celadet li ser nisbete her dengê zîmanê kurdi, di nav hemû dangan da, du lêkolîn çêkirî. Yek jî wan du lêkolînan di “Kürtçe Gramerî” (Gramera Kurdî) da çap bûye. Wek tê zanîn, ev xebata ku bî hevkarîya Celadet Bedîrxan û Roger Lescot hatiye pê, di nav wan xebatan da ku li ser zîmanê kurdi (zaravayê Kurmancî) hatîne kirîn, ya herî fireh û cîdî tê hesibandî. Gava ew me li ser awayê çêkirina alfabeya xwe serwest dîke, ew qala “*sê cedwel*” ên li ser hm lêkolînan dîke û dibê: “*Cedwela pêşî jî me re nisbete herfên*

kurdî nîşan dide.” (28). Dî vê cedwelê da, dî nav 33 798 dengên zîmanê Kurdi da, ew lî nisbeta hîn dengan dinêre û dî danina alfabeya xwe da van nisbetan dide ber çav. Xasme jî, gava ew lî ser danina tipên “v” û “w”, “q” û “k”, “c” û “ç” radiweste, dibê dengên ku nisbeta wan dî zîman da zêdene, divê bî tipên hêsantir û zelaltir bêne nişankirinê.

Ev lêkolina dîduyan ya ku Mir Celadet qal dike, bî tevayî dî tu ciyî da çap nebûye. Dibe ku, her dû lêkolin yekbîn jî, û ya dî “Kürtçe Grameri” da çap bûyî, tenê beşek jî ya dîn be. Me jî wê lêkolina lî ber dest istifade kir û wek tablo û wêne, hîn nisbatên dengên zîmanê Kurdi (Kurmanci) lî jêr dani (29).


	Hejmar	%
a	1500	8.5
b	650	3.6
c	120	0.7
ç	150	0.8
d	840	4.7
e	2200	12.4
ê	1000	5.6
f	150	0.8
g	200	1.1
h/h	350	2.0
î	1800	10.2

	Hejmar	%
i	700	4.0
j	300	1.7
k	650	3.6
l	450	2.5
m	550	3.1
n	1300	7.3
o	400	2.2
p	120	0.7
q	140	0.8
r	1100	6.2
s	340	1.9

	Hejmar	%
ş	160	0.9
t	400	2.2
u	120	0.7
û	450	2.5
v	500	2.8
w	350	2.0
x/x	340	1.9
y	200	1.1
z	150	0.8
	17680	100


Her wek jî xala şeşan ya destûrên Mir Celadet diyar dibê, ew dî danina alfabeya xwe ya latini da, ne tenê dengên zaravayê Kurmanci, her wesa yê “Sorani” û Dîmîlî jî dide ber çavên xwe. Gava ew dibê, *“Sehîtiya ko di hersê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di zmanê kurdî de dengên bîngehî ev sih û yek deng in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin.”*, diyar e ku ew jî lêkolinên xwe dîghije vê encamê. Loma jî divê meriv lî awayê xebatên wî hûr binêre û lî bersiva vê pîrsê bigere: Gava ew sehîtiya ku lî ser her sê zaravayên Kurdi têtê kirinê, Mir Celadet çî pîvan dane ber çavên xwe ? Bî gotinek dîn, ev sehîtikirîna lî gor kijan prensib

an ji prensiban bî ci hatiye? Pivana ku Mir Celadet dîde ber çavan, nisbeta dengên e. Ew radibe, nisbeta hemû dengên ku di denganiya (fonetika) zimanê Kurdi da (her sê zaravayên Kurdi) hene, yek bî yek dîhesibîne û li gor wan dengên ku nisbeta wan zêdeye, di alfabeya xwe da tipan jî bo wan datîne. Ango ew dengên ku nisbeta wan di nav hemû dengên zimanê Kurdi da pîr kêm in, ewi di warê zimanzaniyê da hêja neditiye ku, jî bo wan tipan peyda bike.




Nisbeta dengên Kurdi li gor Mir Celadet

Derheqê vê sehêtikirina li ser sê zaravayên zimanê Kurdi, lêkolîneke wi di pirtûka wi ya bî navê “*Kürtçe Grameri*” (Gramera Kurdi) de hatiye weşandin. Me jî, ev lêkolin esas girt û hîm nisbetên dengên hersê zaravayên Kurdi û hîm jî ew çar dengên zimanê Kurdi yên ku nisbeta wan di nav hemû dengên hersê zaravayan da herî zêdetir in, bî wêne li jêrê dani.




Nisbeta çar dengên bîngehin yê nîzamanê Kurdi

Bî kurdi, çar dengên herî bîngehin, bî dor lî gorê nisbeta zêdetir; di Kurmanci da: "e", "i", "n" û "a"; di Dimili da "e", "i", "a" û "n"; û di Kurmanciya jêrê ("Sorani") da "e", "a", "i" û "n" ne (30).




Nisbeta çar dengên zaravayê Sorani




332

Nisbeta çar dengên zaravayê Dîmlî



292

Nisbeta dengên sê zaravayî zimanê Kurdi



3.6. Mantîq û awayên C. Bedîrxan:

Lî gor destûr û prensibên ku Mir Celadet jî xwe ra bîngêh girtine, alfabeya Kurdi ya latîni jî sih û yek tipan pêk hatiye û bî vi awayî ye:

a, b, c, ç, d, e, ê, f, g, h, i, î, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, ş, t, u, û, v, w, x, y, z.

Herwesa lî gor wî, jî sih û yek tipan, heşt mîqabilê dengdêran (vowel) in û bist û sisê jî mîqabilê dengdarên (consonant) zimanê Kurdi ne. Dengdêrên Kurdi du celeb in; sisê kî in û pênc jî dirêj in. Yê kurt dirêj nabin û yê dirêj jî, kurt nabin, ew her wek xwe dîmin.

Dengdêrên dirêj: a, ê, î, o, û

Dengdêrên kî: e, i, u

Gava him û prensibên alfabeya Hawarê lî ber destên me bin,

wê çaxê dîvê em ji nêzik va lî alfabeyê mêze bîkîn, ka heta çî radeyê dî çêkırîna vê alfabeyê da, ew him û prensîb hatîne bîcianîn . Û heke hîn istîsna çêbûbîn, gelo sedemên vê yekê çine ? Em ê gav bî gav bî dû kevin, ka Mir Celadet bî çî awayî alfabeya xwe daniye.

Wek ji destûrên alfabeya Hewarê dîxuyê, bî şertê pêkanîna bendên 3-6, çavkaniyên vê alfabeyê: 1- Alfabeya Tırki (benda yekê), û 2- Alfabeya Latîni (benda dîduyan) ne. Em ê van her du çavkaniyan lî vir bîmvisîn.

Alfabeya Tırki:

a, b, c, ç, d, e, f, g, ğ, h, ı, i, j, k, l, m, n, o, ö, p, r, s, ş, t, u, ü, v, y, z = 29 tip

Alfabeya Latîni:

a, b, c, d, e, f, g, h, i, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, t, u, v, w, x, y, z = 26 tip

Jî bo çêkırîna alfabeya xwe Mir Celadet bî dengdaran dest pê dîke û dîbê: “...ji si û yek dengdarên (qesda wî dengên alfabeya Kurdi ne-CC) *kurdî, dengên hevdehên jêrîn, dî elfabeya her zmanî de, bî ferqinên kîçîk, yek in.*

b d g h k l m n p r s t f v w y z ” (31)

Ev tipên lî jor, ku hevdeh dengdaran nîşan dîkîn, jî xeynî yekê (w), yê mayî, lî gor hemû xalên destûra alfabeya Hawarê ne. Dengê “w” jî ber ku dî zîmanê Tırki da nine, mîqabîlê wê jî tu tip dî alfabeya Tırki da nine. Jî xwe lî gor benda yekê, heta ku jî dest bê wê ev nêzikayî bê parastîn. Gava ev deng dî zîmanê Tırki da tune be, bêguman nêzikayîyek ku dîvê bê parastîne jî namîne. Jî hêla dîn, ev deng bî tipa adetî dî alfabeya latîni da heye û lî gor xala dîduyan, em ê karîbm têxin nav alfabeya Kurdi. Bî vî awayî, em ê van hevdeh tipan, lî gor pergala alfabeya latîni, jî bo alfabeya Kurdi ya latîni lî jêr bî rêzkîn:

-, b, -, -, d, -, -, f, g, h, -, -, -, k, l, m, n, -, p, r, s, -, t, -, -, v, w,

y, z.

Lı vir Mir Celadet lı ser tipên “v” û “w” dısekine û nisbete wan a dı nav tipên Kurdi (“herfên kurdî”) da, dihesibine. Lı gor wi, “*di zmanê me de nisbete (v) 329/33798 (% 1;-CÇ) û ya (w) 557/33798 (% 1,6; -CÇ) e. Yanî di qisekê ko (33798) herf hene (v) (329) û (w) (557) caran derbas dibe*” . Pışti vê hesibandîne ew dibê dı zimanê Kurdi da, dengê “w” jı yê “v” zêdetır e. Lê gava meriv tipa “w” dınvisine, lı gor tipa “v”, qelem divê du caran bê livandin, “w” du dıran e û “v” yek dıran e. Ango, tipeke ku nisbete wê kême e (v), lê bı hêsani tê nıvisandin û yeka ku nisbete wê zêdeye (w) piçek zehmetır tê nıvisandinê. Lı gor prensibên wi, diviya ev berevaji bûya; tipa jı bo dengê “w” jı ya “v” hêsantır bıhata nıvisandin. Mir Celadet lı vir dıpirse, gelo me dengê “v” bı tipa “w” û dengê “w” bı tipa “v” nişan bıkira çêtır ne dibû ?. Ew bı xwe bersiva vê pirsê dıde: “*Bi vî awayî me dengê van du herfan jı dengên xwe ên navmiletî - ko îrû wek dengên wan ên adetî têne hesêb dûr bixistana.*

Dûrxistina dengên herfan jı dengên xwe ên adetî, gora destûra me a duwîn, tinê di kotekîyê de, an bi destxistina fêdeke mezin de, bıhata çêkirin.

Kotekî yekcar nîne, fêde hebe jî gelek kiçik e, ne welê ye ko em jı bona wê destûreke xwe a bingehî feda bikin.” (32).

Wesa dıxuyê, prensibên lı jor (a-c) herçend gırîng bın jı, jı bo ku ew karıbin destûrên bingehi bıguhêrin, divê lı holê neçari û kotekiyek an jı feydeki gelek mezin hebe. An ne, destûrên bingehi jı bo feydên piçûk divê neyên feda kırin.

Wek me lı jor nıvisi, Mir Celadet jı bı ferqekê, wan hevdeh tipên dengdaran dıxe nav alfabeya xwe. Lı ser tipên “k” û “q” ya iro, ew gelek mutale dıke. Lı gor destûra yekê, dengên “q” û “k” dı alfabeya Tırki da, bı yek tipekê (k) dıhat nişankırin. Lewra dı dengên zimanê Tırki da, dengê “q” tune. Lê dı zimanê Kurdi da, dengên “k” û “q” du dengên herçend nêzi hevbin jı, jı ali cıhderka dıgan va, “q” dengêki paşki û

“k” ji dengêki pêşki ye. Lı gor destûra dıduyan; dı latiniya kevn da, berê ji dêlva dengê “q” tipa “k” û paşê ji, herçend vi dengi bı tipa “c” nişan kırîbın ji, lê ewan disa ji wek “k” yekê bı lêv dıkirin. Mir Celadet piçek lı ser zımanê fransızı ji hûr dibe û biryara xwe dide ku, dengê “k” ya zımanê Kurdi bı tipa “q” û dengê “q” ya Kurdi ji bı tipa “k” nişan bıke. Jı xwe hê dı alfabeya wi ya sala 1928 an da, ev deng bı van tipan hatibûn nişankırin. Bı vi şiklî, Mir Celadet dı bist û sê hejmarên Hawarê da van dangan bı van tipan nişan dide.

Diyar e ku ev yek, dı navbera biryara M. Celadet û destûra wi ya yekem da, dubendiyekê tine pê, ango alfabeya wi jı ya Tırkan dûr dibe. Lewra, dı alfabeya Tırki da dengê “k” ya zımanê Tırki bı tipa “k” tê nişankırin, ne bı tipa “q”. Mir Celadet dı hejmara 24 an da, ev dubendi bı vê notê ji holê rakirîye:

“K-Q

Di elfabêya me de ev her du herf bi hev guhêrîne: ‘k’ ketîye şûna ‘q’ ê, û ‘q’ ketîye şûna ‘k’ê.” (33)

Bı vi awayî em tê gihîştin ku, ka Mir Celadet ew hejdeh dengdarên alfabeya kurdi ya latini, bı çı awayî lı hev anîne. Hejmara dengdaran dı alfabeya wi da bist û sisê ne. Loma ji, pênc dengdar (c, ç, j, ş, x) mane, ku divê em lê hûr bibin.

Mir Celadet lı ser dengdara “j” yê weha dınvîsîne: “*..me (j) ê xiste nav elfabêya xwe bi wî dengê ko frensiz wê bi lêv dibin...*” (34). Bı vi tehri, destûra dıduyan bı cih hat. Gava em lı alfabeya Tırki dînêrın, baş dıxuyê ku destûra yekem ji çûye seri; Lewra alfabeya Tırki ji dengdara “j” bı tipa “j” nişan dıke.

Heçî peydakırına tipekê ji bo dengdara “x” ya Kurdi ye, wesa dıxuyê ku evê tipê ji Mir Celadet ra hın dijawari deranîne. Ev deng dı zımanê Tırki da nine. Dı alfabeya Yûnani û ya Rûsi da ev deng bı tipa “x” tê nişankırin. Herçend “x” ya dı alfabeya zımanê Fransızı da, “*...du dangan bı hev re dinimîne û dide xwendin..*”, wek dengê “ks” û yê “x” ya Kurdi, lê jı ber dengê

wê ya “dutakî” Mir Celadet naxwaze herfa alfabeya Fransîzi têxe nav alfabeya xwe. Ew jî bona nişankirina dengê “x” ya Kurdi, tipa “x” jî alfaba Yûnani digre (35).

Jî bo nişankirina dengdara “ş” yê, di destê Mir Celadet de tu tipeke latîni tunebûye ku, wê tipê jî dêlva dengê “ş” yê bi kar bine (destûra diduyan). Jî hêla din, li gor destûra sisiyan divê ew xwe jî tipên hevedudani jî dîr bihêle. Wek me berê dit, ewi ev dengê Kurdi, berê bi diftonga “ch” nişan kiribû. M. Celadet li ser ev tip weha dîvîsîne: “Ş- *Ev herf berdêla (ش) a erebî ye. Dengê vê herfê di fransîzî bi (ch), di elmanî bi (sch) û di inglîzîyê de bi (sh) têt nişan kirin.*

Ji herfên latînî jî bona nişankirina vî dengî di destê me de tu herf ne ma bûn. Gora destûreke me diviya bû ko em bi herfên hevedudanî emel mekin. Destûra me a pêşîn em dixistin nîzîngî elfabeya tirkan.

Ji hêla din cihderka vî dengî gelek nîzîngî cihderka herfa (s) ye.

Miletên ko di zmanê wan de ev deng nîne li şûna wî (s) dibêjin.

Di zmanê yûnanî de (ş) nîne. Ji lewra yûnanîyên ko nû dest bi frensîzîyê dikin şûna (chambre-şambr) (sambr) dibêjin û pîrsa (paşa) (pasa) dixwînin.

Di encamê deme ev deng, wek tirkan, bi vî herfê nişan kir. Ji xwe ev şikl di elfabeya xelkê Romanyayê de, jî mêj ve hebû.” (36)

Îca em werin ser du dengdarên mayî (c û ç), ka M. Celadet ew bi çî awayî peyda kirine. Celadet Bedîrxan, li gor xala diduyan ya destûra xwe, ku dibê herçend ku

ji dest bê, ewçend dengên tipên latini yê adeti dîvê dî alfabeya Kurdi da bîn bikaranînê, berê xwe dide alfabeya latini. Ew dibîne ku, dî latiniya kevn da, dengê “ç” yê, carna bî tipa “c” hatiye nişankirin. Ev deng iro ji, dî zîmanê Îtalyayî da pîri caran bî tipa “c” tê nişankirin.

Heke ew lî gor destûra xwe ya dîduyan biçûya û ji dêlva dengê “ç” ya Kurdi tipa “c” bî kar bîaniya, dîviya bû ewi destûra xwe ya yekem feda bikira. Ew dibê: *“Digel vê hindê me ev herf ji pêşiya xwe vekir, dengê wê ê kevn da alî û em di warê qebaleyê de man. Ji ber ko qebale li destûra me a pêşin çêtir dihat û ji bona feda kirina wê destûrê çî fêde çî kotekî hebû.*

Di zîmên de nisbeta wan jî hema yek e.

C: 102/33798 (% 0.3 -CÇ) Ç: 103/33798 (% 0.3 -CÇ)

Di encamê de me dengê (چ) bi (c) û yê (چ) bi (ç) nîşan kirin.” (37).

Wek diyar e, ew ne feydeke mezîn û ne jî kotekiyeke tê da dibîne ji bo ku bî awayê alfabeya latini van her du tipan deyne. Loma jî, ew lî gor destûra xwe ya yekem dîçe û her wek dî alfabeya Tîrki da tîn nişankirin, tipên “c” û “ç” dîxe nav alfabeya xwe.

Bî vî awayî, me dît ka Mir Celadet bî çî awayî bist û sê dengdarên alfabeya xwe lî hev anîne. Tipên dengdar dî alfabeya Hawarê da lî gor vê pergale hatîne birêzkirin:

-, b, c, ç, d, -, -, f, g, h, -, -, j, k, l, m, n, -, p, q, r, s, ş, t, -, -, v, w, x, y, z. (23 dengdar)

Îca dîvê em bîn ser dengdêrên Alfabeya Hawarê. Lî gor Mir Celadet, dengdêrên “a” û “o” *“...di zîmanê me de jî wek yê zîmanên din tîne bilêv kirinê, lê her gav drêj in û tucar kin nabin.” (38).* Dengê “a” ya Kurdi jî ya Tîrki dirêjtir e.

3.7. Pîrsa kumîk û nîqutê:

Celadet Bedîrxan dengdêrên mayî di warê şiklî da, dike du tof(beş):

Beşê yekê: e, î, u

Beşê dîduyan: ê, î, û.

Ew lî ser van du beşan bî vî awayî dînvîsîne: “e, î, u, - ê, î, û, Niho, *me ev şeş herf hene ko di pêşberê hev de, du tofên di şiklî de nîzîngî hev ditînin pê.*

Em van çarên jêrên bibin destê xwe û bi wan mijûl bibin: e, î - ê, î

Lê herwekî me berê jî gotî bû, di dengayîya kurdî de, dengdêrek carinan kin û carinan' drêj nabit, yanî herçî dengdêrên ko kin in drêjên wan nîne û herçî drêj in kinên wan peyda nabin.

Ber vê yekê dengdêra (e) herçend bête drêj kirin tucar nabit (ê) jî ber ko cihderkên wan jî hev cuda ne. Herwekî (î) jî bi drêjxwendinê nabit (î).

Di destê me de tu herfên din ne ma bûn, û gora destûreke me diviya bû em herfên hevduanî (hevedudani-CC) emel mekin. Ji lewra jî bona nîşan kirina tofa paşîn me ev (^) nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek.

Ev nîşana ha di hin elfabêyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabêyên din de dengê dengdêran weke xwe dihê le, cihderkên wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguhêrîne û bilink (bilind-CC) dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî drêj in û tucar kin nayin xwendin.

Gora destûrên me ên bingeşî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêkanî û di pêşîya vê bendê de me da zanîn, diviya bû

ko em bê sebebeke zor ji elfabêya tirkan dûr mekevin.

Li hir e, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk (i) ya kin bi (i) ke bê niqte nîşan kirin. Heke me jî welê bikira û (i) ya kin bi (i) ke bê niqte û ya drêj bi (i) ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû ?

No, ji ber ko (i) ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di pêş (pêş-CC)û paşê hin herfan de tevî wan dibe û ji wan derêxistana wê dikeve dişwarîyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesrîyan û ji bona veqetendina (i) ke bêniqte ji herfên jorîn - ko ketiye rex an nava wan - ser herfa ko berî (i) yê dihat îşaretekê berdidan.

Bê şik e ko me nikari bû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin.

Jû pêve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewre ko dengayiyên van du zmanan cihê ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkan dûr ketîye.” (39).

Ji bo dengên “e” û “u”, ewi tipên alfabeya latîni girtine alfabeya xwe. Ji xwe Tirkên ji ev tipên ha girtibûn nav alfabeya xwe, - lê di navbera dengên tipa “u” ya latîni û ya Tirkî da hin ferq hene. Bî vi awayî, neqandina van her du tipan, li gora hemû destûrên wî ne.

Heta vir, em gav bi gav bi dû Celadet Bedîrxan ketin û me ji nêz va lê nihêrt ka ewi di çêkirina alfabeya xwe de çi mantîq bi kar aniye. Ew destûr û prensibên ku ew li ser meşîyaye, bi rasti jî, yê emelî û zanistî ne. Ji bîlî van her du dengdêrên kurdî “î”(ı) û “î”(i), ewi gelek caran, ji bo feydên piçûk xwe ji fedakirina destûrên bîngehin dûr kiriye. Wek me berê dit, heta ku ew mecbûr nemaye, an kotekiyek gelek mezîn derneketiye pêşberî wî, an jî feydeke gelek berbiçav bi dest neketiye, ewi xwe ji destûrên xwe dûr nekirîye. Me ev yek, di nîmûnên “v” û “w”, “c” û “ç” û di yê “k” û “q” da ditin.

Nexwe, ew çî sedem bûn ku Mir Celadet mecbûr kırım, bî koteki pê dan qebûl kırım û feydên berbiçav jî bo alfabeya wi deranin pêşberî wi, ku wi rabû destûrên xwe da alîkî û jî bo du dengdêrên Kurdi tipên “î” û “î” girtin nav alfaba xwe ? Ew bî xwe lî vê yekê baş hîşyar e, û bî vî awayî ewî xwestiye xwe jî hîn dişwariyan dûr bike.

Wek têtê zanin, dî sala 1928 an da dî derbekê da M. Kemal alfabeya erebî da alîkî û jî dêlva wê va, ya latîni anî. Xelkê Tirk, bî kêmasî şeş sed sal alfabeya erebî dî mekteban da, dî kîtêb û çapemeniyên dm da, dî nîvisandîna dî navbera darûdezhêhên idara Dewleta Osmani da bî kar anîbûn. Jî nîşkava guhertîna alfabeyê, gelş, tevlihevi û sergêjayiyên gelek mezûn bî xwe ra anîn. Loma jî, pîştî vê guherandîne, demekê dî rojnamên Tirkî da du alfabe, - ya latîni û ya erebî, - bî hev ra hatûn bikaranîn. Em jî Mir Celadet hîn dibî ku dî nav wan salên jî alfabeyekê derbasbûna yeka dîn da, jî bo xwendevanên Tirk hîn dişwari derketîne. Jî ber ku, “*(i) ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di pêş û paşê hin herfan de tevli wan dibe û jî wan derêxistina wê dikeve dişwariyê*” û ev yek serê xwendevanê Tirk tevlihev dîkîr, Tirk rabûne jî bo veqetandîna tipa “î” jî “n”, “u”, “m”, - çî “î” dî nav an lî rex wan be-, îşaretek danîne ser wê herfa ku berî “î” hatiye.

Gelo ev tevliheviya dî warê şiklî de çî tîşt e ? . Gava meriv lî van her çar tipan dinêre, muşterekiya wan ew e, ku tev kê-m-zêde jî xetên serbijêrkî pêkhatî ne. Heçî tipa “î” bî xwe ye, ew tenê xetê rast û ser bî jêr e. Lî vîr, em ê tecrubekê bikin, jî bo ev sergêjayiya wê rojê baştir ron bike. Em ê pênc xetên rast û serbijêr lî rex hev binvisin: “uuuu”. Gava em nîçikên jêrê yê herdû xetên pêşî, piçek bî guloverkî bişhînin hev, dê ev şiklî çêbibe: “uuu”; em nîçikên jorê yê herî yê paşiyê, disa bî awê berê bişhîjin hev, ev şiklî “uum” çêdibe. Nîçikên jorê yê herî yê xetên, ku dî nav xetên pêşî û paşiyê da ne, em bişhîjin hev: “uum” çêdibe. Wesa dixuyê, ev nêzîkbûna xetên dî ber hev da, jî bo Tirkên wê demê,

sergêjayi û diwari deranine. Lê wek em tev ji dîzanin, Tirk hêdi qet îşaretên veqetandinê naynin ser hiç herfekê lî pêşiya herfa “î” yê. Jî hêla dm, heçî Kurd in, tucar ev tevlihevi jî bo wan çênebûye. Nexwe, ev tevliheviya ku di wan rojan de, -jî nîvisara Mir Celadet diyar dibe-, jî bo Tırkan hebûye, ewende tevliheviyek mezînbûye, ku bûye sedemê fedakîrîna çend bendên destûra danîna alfabeya Kurdî. Ango, jî sedemên lî dervayî zîmanê Kurdî, destûra jî bo çêkırma alfabeya Kurdî, xwe jî rîya xwe ya bî prensîb veqetandiye û ketiye ser şîverêyek teng û kort kortkî. Jî xwe, çewa lî jor me da zanîn, ev sedemê biyani îro lî meydanê nemaye û xwediyên vê sergêjayiyê bî xwe jî, evî tîştî jî bir kîrîna û tu gotûbêjek lî ser nakîn.

4. DÎTINÊN LI DIJ RAKIRINA KUMIK Û NIQUTÊ

4.1. Nîmûne: Dîtinên REŞO ZILAN

Yek ji wan aligirên ku bi dijiwari li dij rakirina nîqut û kumikê dertê, Reşo Zilan e, ku ewi bi niviski çend caran dîtinên xwe diyar kirine. Ewi cara pêşî, bi mînasebeta destpêkirina weşana “Berbang”ê, di hejmara 1 ê ya vê kovarê da, bi awaki fireh dîtmên xwe li ser vê pîrsê diyarkir (40). Sedemê vê gotûbêjê ew bû ku, di Berbangê da ev her du dengên Kurdî bi du curan dihatin nivisandin: Pîraniya Kurdên ku piştî 1980 î hatibûn Ewrûpayê, her weki ku ewan berê li welêt ji nivisibûn, di nîvisarên xwe da nîqut û kumêka li ser van her du tipan bi kar nedînin. Ango ewan ev her du deng bi tipên “î” û “i” nişan didan. Kesên ku ji mêj va li Ewrûpayê bûn ji, eynî deng ji dêlva van tipan, bi tipên “i” û “î” didan xuyakirin. Her çiqas Kurdên Suriyê ji wek beşên di duyan dinvisandin ji, bi hêsanî meriv kare bêje ev pîrsa hanê, pîrseke di navbera du tradîsyonên (adetên) ku di warê mekan da ji hev dûr mabûn da, xwe dida der.

R. Zilan di nîvisara xwe da, nîvisandina van herdu dengên bi tipên “î” û “i”, wek “*pêngaveke zîyandar*” didit û digot “*..nabe ku kovareke Kurdî li gor daxwaza dilê xwe û zanyariya zimên dîr, rabe û rûnê û bibizive. Heke welê nebe dê di zimanê Kurdî de birînen mezin vebin. Dê hîm û bîngehên zimanê Kurdî yên nivîsandin û xwendinê bên birîndar kirin.*” Ewi nîvisandma bi vi awayî, wek bêberpîrsiyarî didit û digot “*Berpirsiyariya vê kir û kirdarê jî*

pir giran e. Hîç mafê me jî tune, ku em bingehên zimanê xwe aloz bikin". “..Divê ji bîr neçe, ku mafê hîç kesekî tune, ku bi zimanê Kurdî ve bilîze. Berê pêşveçûna vî zimanê, çi yê nivîsandin û xwendinê û çi jî yê axaftinê, bi alîkî bervajî de yan jî bi alîkî tijî bi asteng de bide.”

R. Zilan lî dij wan kesên ku bê kumîk û bê nîqut dînvîsandm, rexnên xwe yên tûj û giran dîdomand û dîgot “*Divê Kurdên Tirkîyê di warê nivîsandinê de, serê xwe bi hîç û pûçî ji alfabeke nû û ji awakî nû î nivîsandina zimanê Kurdî re neêşînin. Li tiştine nû negerîn, tiştine nû ji ber xwe bi dernexin û çenekin. Ziman ne mijûlî û ne jî ‘hobî’ ye.”*

Gava R. Zilan bî van gotinên xwe, gelek nivîskarên Kurd sûcdar dike, divê ew xwediyê ditin û delilên gelek qewim be. An ne, wê ev gotinên wî, jî gotinên hîssî û bî hêrshatigotin pêva neyên tu maneyê. Xwediyê van iddiayên lî jorê, R. Zilan, gelo çima lî dij modifiyekirina du tipên alfabe ya Hewarê ewende bî şîd dertê ? Emê lî vîr berê yek bî yek raman, ditin û iddiayên R. Zilan bî rêz bîkî û paşê jî lî ser ditin û iddiayên wî, lî gor zanebûna xwe tiştina bêjî.

Lî gor R. Zilan:

a- Hawarê jî bo nivîsandina Kurdi bingehêk daniye. “*Ev hinde deh sal in, ku Kurdî li ser wê bingehê têtê nivîsandin.*”. “*..çawan ku alfabe û awayê nivîsandina HAWAR-ê ji zimanê Kurdî re, herwekî ku lî perçên din yên Kurdistanê û li hemû zanîngeh û unîversitên ku lê pişka Kurdnasiye hene, bûye bingeh, her wisan divê ew ji Kurdên Tirkîyê re jî bibe bingeha nivîsandinê.”*

b- “*..di şûna -î-ya Kurdî de -i-ya Tirkî û di şûna -i-ya Kurdî de -î-ya Tirkî nivîsandin pîr şaş e. Ji ber ku hem -î- û hem -i-ya Kurdî ne wek -i- û -î-ya Tirkî ne. Ji alîyê fonetîkî de ferqeke pîr mezin di navbera wan de hene.*”. “*... heke hin dengên zimanê kurdî bi yên zimanên Tirkî ve bî gihartin û bi tipên Tirkî ve bî nivîsandin, bingehên fonetîkî yên zimanê Kurdî*

tên birîndar kirin.”.

“Heçî -i-ya Tirkî ye, li gor ya Kurdî kurt e. Ji lew re Tirk, heta bi îro jî, gelek peyvên Iranî (Farisî, Kurdî û hwd.) û erebî, yên di zimanê Tirkî de cih girtine û herweha di zimanê Osmanî de jî dihatin bi kar anîn, bi tîpa -î- ve dinivîsîn.” R. Zilan ji bo vê ditma xwe, ji ferhengê Osmani-Tirki çil gotinan bi rêz dîke. Wek nîmûne, em ê çende ji wan li vir binivîsim: “Alîf”, “asîl”, “cebîn”, “mîsak”, “lîme” ... û hwd.

Ji bo vê ditina xwe qayimtir bîke, ew nîmûnan ji navdêrên neberbiçav û rengdêrên ku ji “zimanên Iranî û Erebi” ketine Tirki ji dîde pêş. Ew dibê, ev navdêr û rengdêr di zimanê Tirki da “...bi paşpirtika (paşdani) -î- ve tên nivîsandin”. Ji bo vê yekê jî, “Germî”, “heykelteraşî” û “hunî” ji di nav da, ew heşt nîmûnan dide.

c- Ji bo ber bi yekbûna zimanê Kurdi da gavên berbiçav bêne avêtinê, divê em guh bîdîn yekitiya zimanê xwendin û nivîsandinê. R. Zilan vê ditma xwe bi van gotinan didomîne: “Ji lew re, heke hin bawer bin ku, ji Kurdên Tirkîyê re holê hêsantir e (Mebest li vir rakirina nîqut û kumîkê ye-CC), bi a me, şaş in. Heye ku dûr nabînin. Bi hînbûna bi tenê du tîpan ve ziman zor nabe... Li milekî din jî, gava zaravayê Kurmancîya jêrîn (sorani) bi tîpên latîni dinivîsin, alfabeya HAWAR-ê bi kar tînin”.

Ji xwe R. Zilan, ditina modifiyekirina du tîpên Hawarê, ji ber ku ji bo Kurdên Kurdistanê Bakur xwendin û nivîsandina Kurdi (Kurmanci) hêsantir dîke, ditmek ne zanîsti dibîne. Loma jî ew weha dinivîsîne: “Heke dabaşa me bes li ser ‘ji Kurdên Tirkîyê re hêsantirbûn’ be, wê çaxê divê Kurdên Tirkîyê bi temamî li gor awa û destûra nivîsandina zimanê Tirkî binivîsin (!?). Çawan be, zimanê Tirkî dizanin, awa û destûra nivîsandina zimanê Tirkî jî dinasin û pê dinivîsinin jî (!?)...”

...Em ê li alîkî yekbûna zimanê Kurdî bixwazin û ji bo vê armancê jî têbikoşin, lê li alîkî din jî em ê bêjin: ‘Ji Kurdên

Tirkîyê re çer, ji Kurdên din re jî wer' !.”. “Heke Kurdên Tirkîyê dev ji ya xwe bernedin, dê bibin sebebên sergêjiyên mezin û têkçûna ziman û bêjeya Kurdî”

ç- “Heçî -i-ya Kurdî ye, wek pir Kurdîzanan jî gotine, du cûre ne. Yek ji wan pir kurt e. Wek di peyva -tişit-de. Yek ji wan jî ne hinde kurt e. Wek di peyva --tîvir- de” (Ne diyar e gelo ev yek,- ku ne rast e -, jî ali R. Zilan va bî çî awayî wek îspat û delila mayîna nîqûta li ser tipa “î” yê tê pêşkêş kirin !)

d- Ne li ser vê pîrsê (î-i), lê di warên din da, “..zimanê Kurdî ..., tîjî pîrs û pîrsgirêkên dijwar e. Pîrs û pîrsgirêkên welê kûr û aloz, ku ji taqeta yek yan jî çend zimanzanan derbûna wan, bê guman e. Heye ku ji wan re çaredîtî ne karê îroyîn be. Teqez, bi tenê akademîya Kurdî dikare ji wan re çare bibîne...” (R. Zilan di vê nivisara xwe da venake ka ev pîrs û pîrsgirêk çine. Lê belê vê ditîna wî, di gotûbêjên li ser modifiyekirina nîqûta û kumîkê da, jî ali hm kesan va, yê ku bî vê pîrsê hîsiyane, lê ne xwedi insiyatîfîn, gelek caran tê dubare kirin)

Çend sal piştî vê nivisara wî ya ku me qal kir, li ser pîrsa ku di zimanê Kurdî da gelo çûna kumîkê tê bîkaranînê, R. Zilan evê bersivê dide: “Di zimanê kurdî de qanûnên taybetî hene. Bîngeha alfaba kurdî bi kumîk hatiye danîn; lê dema M. Kemal alfaba Tirkî guhart, Celadet Bedirxan jî di alfaba xwe de hinek guhertin çêkir û alfaba xwe nêzî ya tirkî kir. Lê dengdêr cûda man ‘î’ ya kurdî dirêj û ya tirkî kurt e...” (41)

e- Di van salên dawî da, jî bo qayînkirina ditîna û iddiayên xwe, R. Zilan tîştîne nû jî dîbêje. Li gor wî: “..dengdara ‘î-î’-ya zimanê kurdî û ‘î-î’-ya zimanê tirkî ne mîna hev kurt in... Li ser ‘î’-ya hûrdek, jî bilî zimanê tirkî, di hemû zimanan de xalek heye. Heçî li ser ‘î’-ya girdek e, zimanê tirkî jî tede, di hîç zimanekî de xal li ser tune ye. Gelo biraderên Tirk çima grafema ‘î’-ya hûrdek ji ya xelqê cihêtir nîgar kirine, bê îzah e. Heke em Kurd bidin ser rîya Tirkan û grafema tirkî ya ‘î’-yê

weha bi awayekî awarte nîgar bikin, aya em ê vê kir û kirdeya xwe çawan îzah bikin. Heya niha bi tenê 'îzahêk' hatiye kirin. Ew jî qaşo 'hêsantir'e. Na, ne rast e. Ne hêsantir e. Hema ji nivîsandina bi daktîlo bigre ! Ji bo ku em bi daktîloyeke bi alfabeyêke latînî, lê ne ya tirkî, binivîsin, divê em ewçend xalên li ser 'î'-yên ku di nivîsarê de derbas dibin, yek bi yek jê bibin. Ma ev e rehetnivîsîna kurdî, hêsan û gengaztir kirina nivîsîna kurdî ?" (42)

ê- Sedemên van tevliheviyan, ji salên 60 i tên. Ew dibê: "Alfabeya kurdî ya latînî, li Kurdistana bakur, bi awayekî destpêkî, di salên 60-î de dest pê kir bi riya hin kovar û rojnameyên Kurdan kete kar.

.....

Di van weşanên han de hin tîpên ku Mîr Celadet danîbûn, hatibûn guhartin. Di kovar û rojnameyan de, tîpa 'I-i' ya kurdî bûbû mîna tîpa 'I-i' ya tirkî û tîpa 'I-î' ya kurdî jî carna bûbû mîna 'I-i' ya tirkî. Hindek caran hin tîpên din yên kurdî jî dihatin guhartin. Wek: 'Ê-ê' dibû 'é', 'X-x' dibû 'Ƶ-ğ', 'Û-û' dibû 'ö-ü', 'K-k' dibû 'Kh-kh' û hwd. Di gel vê çendê, rêzêkirina alfabetîk ya tîpan, ango rêz û dora tîpan ya di alfabeyê de jî gelekî dihatin guhartin. Wisan xuya bû, ku kesên bi kurdî dinivîsandin û li ser zimanê kurdî kar dikirin, alfabeya ku Mîr Celadet danîbû, yan nedîtibûn û yan jî wan ew hîç hesab dikirin. Bi vî awayî, bi zanîn yan jî bê zanîn, tovê wêrankarî, aloz û tevlihevkirina alfabeya kurdî dihate reşandin..." (43)

f- R. Zilan di vê nivîsara xwe ya nû da, hinek tiştên din jî li ditma xwe ya ku di benda (b)-yê da hati behskirinê zêde dîke. Piştî ku ew cardin dide diyarkirin ku " 'î'-ya kurdî" jî " 'i'-ya tirkî" dirêjtir e, ew nivîsara xwe bi vi awayî didomine: "Ew nîşana kumîkê ya ku hatîye ser vê grafemê (tipê-CC), ango bilindek -nîşana sîrkumfleksê-, dide xuya kirin ku divê ew dengdar bête dirêj kirin. Hinek zimanên din, ji bo dirêjkirina dengdarên dirêj yên zimanê xwe, rêyine din dane ber xwe. Wan ya bi riya cotnekirina tîpên bêdeng yên bi dû re tên, yan

bi riya bikaranîna du grafeman, yan jî bi riya çend nîşanên bi hev re ev pîrsgirêk çareser kirine. Heçî Mîr Celadet e, ew xwe 'ji awayê nîşankirina çend dangan bi herfekê an dengê bi çend herfan' yan jî bikaranîna çend nîşanên bi hev re dide alî,... Ji lewre ew vê nîşana bilindekê çêtir dibîne û diêxe ser hersê dengdarên me yên dirêj...

Ji xwe di zimanê kurdî de sê dengdar hene, ku ew jî dengdarên 'ê', 'î' û 'û'-yê ne, dirêj in. Eger em vê nîşana girîng ji ser yekê ji wan rakin, gelo maneya li ser yên din hiştinê çi ye ?”

Me li jor, heta ku ji dest hat, bi serûber ditin û iddiayên R. Zilan bi rêz kîrin. Li ser van ditin û rexneyên R. Zilan, hê di wan salan da, hin ditinên hêja û di ci da hatin weşandin (44). Bi a min ev ditin û ramanên R. Zilan gelek girîng in. Giringiya wan ne ji ber ku ew rastiyê diyar dikim û zanisti ne, lê ji ber ku, wek ditinên pîsporeki li ser zimanê Kurdi, li ser gelek kes û rêxistinên tesireke kûr kirine û ew xistîne nav bêdengi û bêbızaviyê. Wek nûnûne, gava bi insiyatîva Enstituya Kurdi ya Parisê di bîhara 1983 an da zimanzanên kurmancîaxêv, tevi pîrsîne din pîrsa alfabeya Kurdi ji şêwîrin, li ser pîrsa nîqut û kumîkê ji ditinên xwe bi riya kovara Hêvîyê dan der. Di navbera wan ditin û ditinên R. Zilan da, ferqên her biçav tunebûn. Ev ditin di “Hêvî”yê da bi vi awayî tîrîkirin:

“ LI SER ‘î’ Û ‘î’, ‘î’ Û ‘î’ ”

Di salên 1960an de li Tirkîyê hin kitêb û kovar di dewsa i ya Hawarê de, i ya tirkî û di şûna î de ji i bikar anîn. Di destpêkê de ev ji ber sedemên teknîkî bû (di çapxanên tirk de peyda kirina î dijwar bû); paşê di hin hawîran de bû adet.

Ev yek ji me re xelet dixuye.

- Di dema ku Kurdên Sovyetî jî berebere alfabeya Hawarê bikar tînin, hin tîpên vê alfabe guherandin dibe sedemê

perçebûneke nû di nav Kurdan de. Di van rojên tunehiya otoriteke merkezî de berpirsiyariya xwenda û ronakbirên kurd mezin e. Divê ku em tiştên bi zor, cefa û zehmet avakirî, heta ji me tê, têkûztir bikin, lê xweyi derkevin, pêş ve bibin.

- Di warê zanistî de jî ev ne rast e. Tîpa ı tenê di tirkî de heye û dengekî taybetî dide. Ev deng jî dengê i ya kurdî cihê ye; i ya kurdî wek ya inglîzî (di this is de) ye. Gava ku wê wekî ı ya tirkî binivîsin ew him jî bo Kurdên Tirkîyê û him jî ji bo kesên din ên ku bi tirkî dizanin û dixwazin hînî kurdî bin dikare bibe sedemê tevliheviyê.

î ya kurdî wekî ee ya inglîzî dengekî dirêj e.

- Di alî pratîk de, li Tirkîyê bikaranîna ı hêsatir e, ji ber ku ev tîp di alfabeya tirkî de heye. Lêbelê li welatên din, xasme li Awrûpa, makînên ku tê de tîpa ı hene bi destxistin gelek dijwar e. Herwekî îro piraniya mezin a kitêbên kurdî li dervayî Tirkîyê çap dibin, di alî pratîk de bikaranîna i û î yên Hawarê ji ya ı û î çêtir e.

Em ji hemû welatîyên xwe hêvî dikin ku di vî warî de berpirsiyariya xwe ji bîr me kin, cih nedin peydabûna dijarî û tevlihevîyan.” (45)

Îca divê em yek bi yek li ser van ditin û iddiayên li jor bisekinin, wan bîdîn ber pivanên zanyariyê, bîdîn ber tarixa alfabeya Kurdi ya latini û ya niviskiya bi vê alfabeyê.

4.1.1. Hawarê ji bo çi bîngehek daniye ?

Heçî ditîna ku Hawarê ji bo nîvisandina Kurdi bîngehek daniye, ditînek rast e, lê divê bê zelalkirin ji kîjan zaravayê Kurdi ra ev bîngeh hatiye danin. Herçiqas di danîna alfabeya Kurdi da hewldanek heye ku ew li ser dengên hersê zaravayên Kurdi bête avakirî, lê belê Hawarê ji bo Kurdiya bi zaravê

Kurmanci bingehêk daniye, ne ku ji bo hemû zimanê Kurdi. Herwiha ev bingeh ne tenê di warê alfabeya latini da, her wisa di warên hatina ba hev û lihevdukirina dengên, avakirina kitan, bêjeyan, di hevokan da rêz û dora bêjeyan, tewandin û guhertinên di bêje û endamên rêzimana Kurdi ... û hwd da ji, hatiye danin. Lewra diyar nine, ku mebesta R. Zilan, ji bingeha ku Hewarê daniye tenê alfabeya Kurdi ya latini ye, an ji hemû qayde û awayên ku Hawarê di warên fonetik, morfoloji û sentaks de anîne ye. Lê gava ew dibê *“Ev hinde deh sal in, ku Kurdî li ser wê bingehê tête nivisandin”*, dixuyê ku ew bingehê tenê bi alfabeya latini ya Kurdi nagre, lê awayên bêje û rastnivisînê ji dide ber çavan. Ew dibê ku alfabe û awayê nivisandina Hawarê ne tenê *“li perçên din yên Kurdistanê”*, lê her weha *“li hemû zanîngeh û unîversîtên ku lê pişka Kurdnasiyê hene ”* buye bingeh. Ji ber vê yekê ji divê *“ew ji Kurdên Tirkîyê re ji bibe bingeh”*.

Ev ditin, ji ber gelek sedeman ne rast in. Ez ê xwe bispêrim sebra xwendevan û van sedemên ku ditin û iddiayên R. Zilan pûç dikin, bi hîn agahiyên dirêj bin ji, li jêr deynim.

Wek tê zanin, piştî Mir Celadet Bedîrxan çû rehmetê, yên ku ji ekola Hawarê bi xwe bûn ji, di hinek waran da, bi awayek din nivisîne. Di navbera nivisandinên wan û yên Hawarê de, di warê rastnivisandinê de ferq hene. Wek nîmûne, li ser pîrsa gelo nivisandina daçekî neyiniyê, divê bi *“lêkera laperamendî”* va bê nivisandin an ji divê cihê bê nivisandinê, di navbera Mir Kamuran Bedîrxan, Osman Sebri û Hawarê de ditinên cihê hene. Di Hawarê da, Mir Celadet carna ev daçek bi lêkerê va û carna ji cihê nivisiye. Osman Sebri û Nûredin Zaza daçekî neyiniyê her bi lêkerê va nivisîne. Û Mir Kamuran, wek imla zimanê fransîzî, ev daçek her cihê nivisandiye (46).

Osman Sebri di sala 1954 an da alfabeyeke latini, ku bi sîh û pênc tipan e, ji bo zimanê Kurdi çêdike. Di vê alfabeyê da, ji bilî alfabeya Mir Celadet ya bi sîh û yek tipan, tipên “L” û

“R” yê n qelew, û “h” (ya dî navê Hesên) û “x” (ya dî gotîna “axa” da) jî hene. Disa Osman Sebri, dî sala 1982 an da bî navê “*Elifbêya Tikûz*”, alfabeyek nû nivîsi û lî Swêd da çapkîrîn. Ev alfabe jî sîh û heft tîpan pêk tê û bî vî awayî ye:

a, b, c, ç, `ç, d, e, ê, f, g, h, `h, i, î, j, k, `k, l, m, n, o, p, `p, q, r, s, ş, t, `t, u, û, v, w, x, `x, y, z. (47)

Em werin ser ditîna, ku lî hemû perçên Kurdistanê alfabe û awayê nivîsandîna Hawarê jî bo zîmanê Kurdi bûye bîngêh. Xweziya ev ditîna rast bûya. Lê mîxabm ne rast e. Lî Kurdistanî Başûr û Rojhîlat çî Kurdên kurmançîaxêv û çî jî yê nî soranîaxêv, alfabeya Kurdi ya ku jî modîfîyekîrîna alfabeya Erebi hatiye lî darxîstîne, bî kar tînin.

Kurdên Êrîvanê jî, ku bî kurmançî dîaxîvîn, bî guhertînen lî ser alfabeya Rûsî ya kirilî, jî xwe ra alfabeyek pêk anîne. Çewa alfabeya latînî ya Kurdi jî xwe ra ya latînî nîmûne girtîbe, wîsa jî ya erebî û ya kirilî jî, dî warê tîpan anîna kêleka hev da, dî rêz û dora tîpên dî alfabeyê da, alfabeyên Erebi û Rûsan jî xwe ra nîmûne girtîne. Bî hêsani meriv dîkare bêje ku, dî warê rêza tîpan da û dî warê nivîsandînê da ferqên gelek mezin dî navbera van alfabeyan da hene. Wek nîmûne dî alfabeya latînî da tîpa “z” dî dawîya alfabeyê da tê, lê dî ya kirilî da dîbe ya nehan, dî ya erebî da dîbe ya yazdehan. Hmîk tîpên alfabeya erebî bî heva nayê nîvîsandînê, hmîk dî destpêkê da bî şîklekî, dî nivê bêjeyê da bî şîklekî dm û dî dawîyê da bî şîklekî jî yê nî dî cîhê, têne nivîsandînê. Her çende zîman yek zîman be, ango zîmanê Kurdi be jî, ku em “*Alfabeya Êzîdîya*” jî lê zêde bîkî, ku hînek Kurdên Êzîdî hê jî vê alfabeya kevnare bî kar tînin, mîxabm îro Kurd çar alfabeyên ku dî warê adet, dîrok û nivîsandînê da jî hev cîhê ne, bî kar tînin.

Vêca ka ev bîngêhiya ku R. Zîlan jî bo Kurdên hemû Kurdistanê tîne lî kuderê ma. Heke mebesta R. Zîlan jî vê bîngêhê, tenê ew nivîsandînen bî alfabeya latînî bîn, disa jî ev

ditin ne rast e. Wek tê zanin, ronekbir û zımanzanê ji Kurdistanê Başûr Tewfiq Wehbi ji, demekê dıxwest ku, alfabeyekê latini ji bo zımanê Kurdi pêk bine. Beriya derketina Hawarê, li Şamê Mir Celadet Bedîrxan û Tewfiq Wehbi hevdû dibinin û dıxwazın alfabeyên xwe bîkî yek. Lê sed heyf, beriya ev xebat here seri, Tewfiq Wehbi vedigere Îraqê û ev karê piroz û hêja, nivcû dîmine û ev keysa tarixi ya ji bo damezrandina yek cure alfabe, ji dest dıçe (48). Tewfik Wehbi xebatên xwe yê li ser alfabeyekê latini ji bo zımanê Kurdi domand û di sala 1941 ê da, di kovara Gelawêjê da, alfabeya xwe ya latini car bi car weşand. Di warê ortografiyê da, ev alfabe dışibe alfabeya zımanê İngilizi û zêde muşterekiya vê alfabeyê bi ya Mir Celadet Bedîrxan ra tune. Karbîdestên dewleta Îraqê, pêra pêra hîn tedbir girtin, ji bo ku ev alfabeya latini di nav Kurdan da zêde belav nebe (49).

4.1.2. Alfabeya Kurdi ya bi tipên Erebi:

Gava diyar bû ku şert û mercên çekirîna alfabeyekê latini li Kurdistanê Başûr dijwar e, rewşenbîrên Kurd zêde xwe bi vi kari mijûl nekirin û hewl dan ji bo ku, alfabeya erebi li gor zımanê Kurdi biguhêrin û alfabeyekê li gor zımanê xwe pêk bin. Xebatên di vi wari da, hê di salên 1920 i da li dar ketibûn. Xasme ji kovara "*Zari Kurmanci*", ku di nav salên 1926-1932 da li Rewandîzê derdiket, di tekûzkirîna alfabeya Kurdi ya erebi da, dewreke mezîn leyist.

Wezareta Zanyari ya Îraqê rê da ku di mektebên destpêkê yê li Kurdistanê da, xwendina bi Kurdi dest pê bike û ji bo vê yekê ji, Tewfiq Wehbi di sala 1933 an da alfabeyekê Kurdi bi tipên erebi li hev ani. Lê belê kesên paşverû, rê li ber belavbûn û bikaranîna vê alfabeyê girtin, bi sebebê ku, qaşo ev alfabe, bi hîn nîçik û dûvikan, alfabeya Erebi ya ku ji bo zımanê Quranê hatiye bikaranîn, xera dıke û loma ji ev kîrîn, kîrmeke dûrketina ji riya din e. Ji sala 1950 û bi şûn va, ev alfabeya Tewfiq Wehbi bere bere hatiye bikaranîn û hîn kêmasiyên di

vê alfabeyê da ji, ji ali Elaeddin Secadi va hatine sererastkirin. Dî vê alfabeyê da, ji bo dengê “î”-ya Kurdi, Tewfiq Wehbi (س) yeke erebi ya bê nîqut datine (Kirdin-کردن) û ji vi dengê Kurdi ra “bızroke” dibêje. Ji ber ku ev tipa ji bo dengê “î” ya Kurdi dî alfabeya Erebi ya adeti da tune bû, hê dî destpêkê da nehat bikaranin û iro tu kes vê tipa Tewfiq Wehbi bî kar nayne. Ew kovar û rojnameyên ku dî deîna Komara Kurdistanê da (Mehabad) derketine, tev lî gor alfabeya Erebi ya Kurdên Kurdistanê Başûr hatine nivîsin.

Dî salên 1950 yan da, lî Kurdistanê Rojhelat, Ayetullah Merdûxi Kurdistanî alfabeyek erebi-farîsî, ku ji sîh û şeş tipan pêk dihat, ji bo zîmanê Kurdi pêk ani. Ev alfabe lî tu deran nehatiye bikaranin. Dî salên 1970 yan da “*Kori Zanyari Kurd*” ji, dî alfabeya Kurdi ya bî tipên erebi da hîn guhertin çêkîrin. Pîraniya pêşniyarên “*Kori Zanyari Kurd*” yê lî ser alfabeya Kurdi, dî jiyanê da zêde rûmet neditin û loma ji nehatin bikaranin (50).

4.1.3. Alfabeya Kurdi-latîni lî Kurdistanê Başûr:

Herçend Kurdên başûr alfabeya erebi-farîsî guhertine û hîn nişan dane ser hîn tipan, an ji hm tip lê zêde kirine, disa ji alfabeya erebi-farîsî nikaribûye bersiva dengên zîmanê Kurdi bide. Loma ji xebatên ji bo alfabeyeke latîni pîştî xebatên Tewfiq Wehbi û pîştî salên 1940 an ji, her dom kirine. Yek ji wan zîmanzanan ku dî vi wari da gelek hewl daye û hê ji dixebite, Cemal Nebez e. Ew dî wê baweriyê da ye ku, bî alfabeya Kurdi ya latîni wê zîmanekî edebî yê muşterek dî nav hemû perçên Kurdistanê da çêbibe. Herwesa lî gor ditma wi, ne qabîl e ku bî milyonan Kurdên Kurdistanê Bakur ji nû va alfabeya erebi -farîsî hîn bibin. Ew dibê, ji ber van sedeman, dîvê Kurdên başûr û yê rojhelat ji, alfabeya latîni bî kar binin. Cemal Nebez vê nêrîna xwe bî hîn tecrubeyên pedagojîkî ji qayim dike. Ewî bî salan ji bo Kurdên hemû perçên Kurdistanê, mamostetiya zîmanê Kurdi kirîye. Ew

dîbê, fêrbûna nîvisandîna zîmanê Kurdi bî alfabeya latini, jî bo Kurdên Kurdistanê Bakur ("Tirkîyê"), dî demeke gelek kurt da pêk tê. Herwesa jî bo Kurdên başûr û rojhelat jî, fêrbûna nîvisandîna bî vê alfabeyê zêde wext nagire (lî dor du sê hefteyan). Lê belê, herçend ew bî alfabeya erebî jî zanîbîn, jî bo karîbîn bî vê alfabeyê zîmanê Kurdi binvisîn, bî kêmasî dîvê ew şeş meh bîn perwerdekîrîn. Kurdên ku xwendin û nîvisandîna wan tunm (yên jî her çar aliyên Kurdistanê), dî nav şeş heta deh hefteyan da, hînî alfabeya Kurdi ya latini dîbîn. Lê belê ev yek bî alfabeya erebî, jî salekê zêdetir dîkşîne û piştî salekê jî, ew dî xwendin û nîvisandîna da zehmetîyan dîkşînin. Lî gor Cemal Nebez ku vêga lî Universita Berlinê profesorê zîmanê Kurdi ye, alfabeya Hawarê lî gor dengên zaravayê Kurmancî hatiye danîn û kêma zêde bersîva vî zaravayê Kurdi dîde. Lê belê hîn dengên ku dî Kurmancîya jêrê (sorani) da hene, bî vê alfabeyê nehatîne nişankîrîn. Wek nîmûne, ew dîbê ku, "r" û "l" ya qelew, dengên "π" û "ü" ku, dî hîn devokên zaravayê sorani da hene, dî vê alfabeyê da nînin.

Gava Cemal Nebez dî salên 1950 yî da lî herêmen Kerkûk û Hewlêrê mamostetî dîke, ew xwendevanên xwe hînî alfabeya latini dîke. Jî bo vê armancê, dî sala 1957 an da, bî navê "*Nûsîni Kurdi be Latîni*" ewî pirtûkeke (kîtêbokeke) piçûk da çapîrîn û ew belav kir. Lê belê jî du alîyan va, ew dî bîn êrişan da ma. Hm musulmanên paşverû, jî vê alfabeya latini ra dîgotî "*alfabeya ladîni*" (alfabeya bêdîni). Êrişên herî dijwar jî rojname "*Ittihad-ûl Şe'eb*" (Yekgirtîma Gel) hatî. Ev rojname, organa "*Partiya Komunist ya Iraqê*" bû û tê da, bî navê "*Sewtûl Şe'ebûl Kûrdî*" (Dengê Gelê Kurd) beşek hebû. Dî vê beşa rojnamê da, sala 1959 an, Partiya komunist bî hêrs û bî gef xwarîne, nîvisarek weşand û ithamên gelek gîran lî Cemal Nebez kirîn. Ewan dîgot, kesên ku xîzmeta alfabeya Kurdi ya latini dîkî, ew lî dîjî "*parastîna yekîtîya niştîmanê Iraqê*" ne.

Piştî 11 ê Adara 1970 yî, Cemal Nebez lî Kurdistanê hewil

dide ku, alfabeya Kurdi ya latini belav bibe û di mektebên Kurdi da bête fêrkirin. Ew di wê baweriyê da ye ku, dûr an nêzik di pêşerojê da, wê hemû zaravayên zîmanê Kurdi bi alfabeya latini bêne nivisandinê. Ew vê yekê, wek tîşteki li dervayi irada mirov, wek qanûneke zanistiyê dide pêş.

Cemal Nebez jî bo alfabeya xwe, alfabeya Mir Celadet bîngeh digre û dide zanin ku ew jî sala 1956 an û bi vîr da li ser vê alfabeyê dixwebite û dixwaze wê baştir û tekûztir bike. Li gor wi, alfabeya latini ya têkûz, ya jî bo zîmanê Kurdi bi vî awayi ye:

a, b, c, ç, d, e, ê, f, g, h, h, i, î, j, k, l, l, m, n, o, ö, p, q, r, r, s, ş, t, u, û, v, w, x, x, y, z. (51)

Wek diyar e, ewi pênc tip li Alfabeya Mir Celadet zêde kirine: tipên “h”, “l”, “ö”, “r” û “x”.

Di sala 1974 an da, bi navê “*Ber bi yekbûna zîmanê Kurdi va*” Cemal Nebez kitêbek nivisi. Ewi vê kitêba xwe jî Kurdistanê şand Bexdayê jî bo bête çapkîrîn. Mîxabin, ev kitêb du sal bi derengi, di sala 1976 an da, li Ewrûpayê hat çapkîrîn. Pîraniya agahdariyên li ser diroka alfabeyên Kurdi yên erebi û latini li Kurdistanê Başûr, me jî vê kitêbê girtme. Disa di vê kitêba xwe da, jî bo sîvîktir û hêsantir kirina alfabeya Kurdi ya latini, ew çend pêşniyariyan tîne. Li gor wi, jî bo vê armancê, heta ku jî dest tê, ew nişanên ku li ser hîn tipên alfabeya Kurdi ya latini hene, divê bêne rakirin. Yek jî pêşniyariyên wi bi vî awayi ye: “*Herweha jî bo ‘bızroke’; jî dêlva (î) va, bi (î) bînvîsin -wek ku Tirk dînvîsin-, û li şûna (î) ji, bi (î) bînvîsin. Wê demê, em xwe jî kumîka li ser (î) rîzgar dîkîn.*” (52).

Wek jî gotinên Cemal Nebez jî dixuyê, bi rakirina kumîka li ser (î) û nîquta li ser (î) yê, jî bo Kurdên başûr û rojhelat ji, xwendin û nivisandina Kurdi sîvîktir û hêsantir dibe.

Herwesa di destpêka salên 1960 i da, li Kurdistanê Rojhelat,

Seyid Ubeydullah Eyûbiyan û Qadîr Fetahê Qazî jî alfabe ya latîni jî bo zîmanê Kurdî bî kar anîne. Dî nav çend kitêbên ku S. U. Eyûbiyan bî tipên latîni dane der da, yek jê bî navê “*Xec û Siyamend*” e (53).

Lî Hewlêrê dî sala 1972 an da, Gîm Mukriyanî alfabe ya latîni û bî wêne amade kir û jî bo ku zîmanê Kurdî pê bê nivîsandin, weşand.

Dî cîvîna zîmanzanên Kurd da, ku dî sala 1983 an da bî inîsyatîva Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, lî Parîsê pêk hat, zîmanzanên Rojhîlat û Başûrê Kurdistanê jî dî nav da, hemû beşdarên cîvîne hemfikir bûn ku, “*..alfabe ya latîni baştir bersîva hewcedariyên nivîsandîna zîmanê kurdî dide û divê rojekê Kurdên Iran û Iraqê jî derbasî tipên latîni bin. Lê mixabin, di hoyên (şertên) îroyî de, ew yek hê ne mimkin e. Ji ber ku:*

- *zîmanên resmîyên van dewletan alfabe ya erebî bikar tînin û Kurdên ku xwendekar in jî bî tipên latîni kêr dîzanin.*

- *guhêrandîna alfabe, di dorbenda (çarçewa) van dewletan de, wekî daxwazîyeke serxwebûn an veqetînxwazî dîxuyê û dikare Kurdan jî hêzên siyasîyên van her du dewletan dîr bixîne ...”*
(54)

Herwek jî vê neqîlîkirîna lî jor jî dîxuyê, divê neyê jîbîrkîrîn ku, heçî pîrsa kîjan alfabe baştir e û divê bê bikaranîne, pîrseke siyasî ye. Heye ku zîmanzan û pedegog xwedî dîtin, gotm û pêşniyariyên zanîstî û maqûl bî. Lê gava em lî dîrokê dînerîna nîmûnên ku vê dîtinê teyîd dikin kêr nînin. Yê ku bîrîyara guhertîna alfabe ya krîlî girt û xwest lî şûna wê, alfabe ya latîni bîne Lenîn bû. Lê paş çendî sal bikaranîna alfabe ya latîni, yê cardî ya kevn, ango alfabe ya krîlî jî para anî, ne zîmanzanên Rûs bûn, lê Stalîn bû. Her wesa, yê ku jî nîşkava alfabe ya erebî rakir û ya latîni anî şûna wê, M. Kemal bû. Heçî Mir Celadet e, em dîzanîna ku lî gel welatparêzî û zîmanzanîyê, ew her wesa siyasîetvanekî Kurd bû. Ew jî

siyasetê qet dûr nema. Dibe ku, gava ewrên reş û tari bî ser esmanê Kurdistanê va girtin, ewî giraniya xwe dabe hîn warên din, lê di wan waran da jî, ewî her cehd kîriye çîrûskên agirê welatperwerî û şoreşgeriyê di nav Kurdan da her dade. Jî bo Kurdan xweşbextî ye ku, di dema tûnebûna otoriteyeke siyasî da, yekî wek Mir Celadet rabûye bî salan xwe bî vê pîrsê êşandîye û jî me ra bîngehek daniye.

4.1.4. Kurdên Sovyeta Kevn û alfabeya latîni:

Heçî Kurdên Sovyeta kevn m, her çiqas giraniya nivîsên wan bî alfabeya krîlî bîn jî, ewan alfabeya latîni jî bî kar anîne. Çewa me berê jî qal kîr, ewan cara pêşîn di sala 1921 î da û bî dûra jî di navbera salên 1929 û 1946 an da alfabeyên latîni bikar anibûn. Di van salên dawiyê da, li ser alfabe û rêziman, hm Kurdên Êrivanê bî alfabeya latîni, hîn berheman weşandîne. Ditin û awayê nivîsandina alfabe, rêziman û rastnivîsina Kurdên Êrivanê, jî bal hînik zîmanzanên Kurd va, wek ekolekê tete hesabandin. Ev ekol, ne wek şaxek jî ekola Hawarê, lê ekolek wek alternatîva Hawarê dixuyê.

Nivîskar û zîmanzanê herî bî nav û deng yê vê ekolê, Prof Qanadê Kurdo ye. Gotin û terminolojiyên zîmanzaniyê yên Mir Celadet û yên Qanadê Kurdo di warê fonetîk, morfoloji û sentaksa zarava Kurmancî da jî hev cîhê ne. Jî ber ku em xwe li babeta deng û alfabeya Kurdî ya latîni dîgrin, em ê tenê nîmûnên derheqê vê pîrsê bîdm:

I- Li gor Mir Celadet Bedîrxan *“Elfabêya kurdî jî sîh û yek herfan hevedudaniye:”*

a b c ç d e ê f g h î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z.

Ev tip du texlîtin : *“Dengdêr”* û *“dengdar”*. *“Di zîmanê kurdî de heşt dengdêr hene: a e ê î û o û*
Lewre ko di danganîya kurdî de dengdêrek geh kin û geh drêj

nabe, dengdêrê kurdî di drêjahîya dengên xwe de sersekinî ne: kin û drêj.

Dengdêrên kin: e...i...u

....

Dengdêrên drêj: a ê î o û ” (55)

II- Lî gor Prof Qanadê Kurdo “*Lî zîmanê K’urdîda 38 h’erf hene....*

Alifbayê K’urdi u navên wan:

A, B, C, Ç, `Ç, D, E, Ê, E’, G, G’, H, H’, F, J, I, Î, K, K’, a, bê, cê, çê, çê, dê, e, ê. e’, gê, g’ê, hê, h’e, fe, je, i, î, kê, k’ê, Q, L, M, N, O, P, P’, R, R, S-, Ş, T, T’, U, Ê, V, W, Y, Z. qê, lê, mê, nê, o, pê, p’ê, rê, rê, sê, şê, tê, t’ê, u, û, vê, wê, yê, zê.

Jî van h’erfan h’êşt h’erf h’erfên danganine, ew h’erf evim: a, e, ê, u, û, o, i. u h’erfa 1 kurt nivdengani.

Bist u neh h’erf jî yê bêbangine.” (56).

Lî ser pîrsa hejmara dengên (fonemên) Kurdi, Qanadê Kurdo hejmarên cihê cihê dide. Carna ew dibê “*Sewtên bêbangani dî zîmanê meda bist u h’êft hebîn.*”(57) Ew jî dêlva gotina dengê da, pîri caran gotina “*sewt*” ê bî kar tine. Lî gor wi: “*Sewtên zîmanê K’urdi p’are ve dibîn (dabeş dibîn) ser du k’om:*

a) sewtên dengani, b) sewtên bêdengani.

....Sewtên dengani dirêj u kurt têne gotinê mesele, yê kurt: a, û, e, o, u, y, ê, i, yê dirêj: a, ê, i, o, u, e, î.” (58)

Hewce nake, em nîmûnan zêde bikin. Eşkere ye ku dî navbera van her du zîmanzanên Kurd da, lî ser terminolojiya zîman, lî ser hejmara dengên zîmanê Kurdi û tipên alfabeyê, ferqine mezin hene. Meriv baş pê nîzane gelo jî sedemên şaşiyên dî çapkîrîna da ne, an jî Prof Qanadê Kurdo bî xwe bî wi awayî nîvisîye, hînik tevliheviyên gelek berbîçav dî fonetîk û alfabe ya wi da hene. Wek nîmûne, ew bêyî hoy û sedemek nîşan bide,

çı dengên ku di zımanê Kurdi da hene, xwe mecbûr dibine ku, wan bi tipekê nişan bike. Gelemşeyek din ji ev e: ewi tipa “y” yê li ciki wek dengdêrek kurt nişan daye. Wek tê zanin, di hinek alfabeyên latini yên mîletên Ewrûpi da, ev tip mîqabilê dengdêrekê ye. Lê di alfabeya Hewarê da ev tip, tipeke dengdar e. Sergêjayiyeke dm ji ev e ku, Mir Celadet dibê dengdêrên zımanê Kurdi ya kın in yan dirêj in. Ew nabe ku, hem kın û hem ji dirêj bın. Qanadê Kurdo dibê dengdêr hım kurt û hım ji dirêj in.

Helbet li vir mebesta mm ne ew e ku, bi hûr û kûri li ser van her du ditinên cihê rawestim. Ji ber iddiaya R. Zilan ya ku dibê, alfabe û awayên rastnıvisandma Hawarê ji bo zımanê Kurdi û hemû Kurdistanê bûye bingeh, me ji ev pirs piçek veda.

Li mîleki din, ne tenê di navbera Q. Kurdo û Hawarê de, lê herwesa di navbera zımanzanên Kurdistanê Başûr û Hawarê de ji, li ser navlêkirina tipan ferqme hene. Tipên ku Mir Celadet ji wan ra dibê “*tîpên dengdêr*”, Tewfiq Wehbi dibê “*piti bızwên*” û Maruf Xeznedar ji dibê “*piti dengdar*” (59)

Bêşik, ı Prof Qanatê Kurdo be û ı ji Mir Celadet Bedırxan be, her du ji zana bûn û li ser zımanê Kurdi bi dehan sal xebitine û berhemên gelek hêja li dû xwe hıştine. Lê wesa dıxuyê ku, di warê zanıstiyê da, ewan ji xwe ra pıvanên cihê û zımanên cihê nımûne gırtine. Bi ya min, ku di rûpelên berê da piçek li serê hat sekınandın, bingehê ku M. Celadet daniye di gelek waran da zelaltır e û xasme ji, di warê pedegojiyê da hındıktır gelemşe û sergêjiyan bi xwe ra tine. Ji ber vê yekê ji, bi alfabeya Hawarê nıvisandın, ji ya bi ekola Kurdên Sovyeta kevn nıvisandınê tekûztır e.

R. Zilan dibê “... *hemû zanîngeh û unîversitên ku lê pişka Kurdnasîye hene*” alfabe û awayên nıvisandina Hawarê ji xwe ra wek bingeh qebûl kırine. Hewce nake em dûr herın; Prof Qanatê Kurdo bi kêmasi bist salan serokatiya beşê

“Kurdzaniyê ya Enstituya Rojhilatziyê ya Leningradê” kır. Me çend ditinên wi yên li ser deng û tipên Kurdi bi alfabeya latini li jor nivisin. Bêguman, heye ku li hinek zaningeh an ji universitan, alfabe û awayê rastnivisandina Hawarê wek bingeh hatibe pejirandin. Lê divê meriv bîpirse, gelo ev dezgehên zanistiyê heta vêga li ser van bingehan çend berheim deranîne û ew li ku deran belav kirine.

Pışti van rastiyan li jor, ditina R. Zilan a bi hinceta gotubêjên li ser kumîk û nîqutê, ku ew di benda “a” yê da dide pêş, nabe tu delil û bingeh ji bo parastina kumîk û nîqutê.

Divê li vir em bîdîn zanin ku, R. Zilan bi xwe ji, di nivisarên xwe yên van salên dawiyê da, wesa dîxuyê ku dev ji hin iddiayên xwe yên sala 1982 an berdaye. Di sala 1991 da, R. Zilan weha dinvisine: *“Berî her tistî divê bête zanîn, ku ev alfabeya Mîr Celadet, bi tenê ji bo nivîsina zaravayê kurmançî ye. Bi vê alfabeyê nivîsîna hemû zaravayên kurdî, eşkere ye, ku ne mumkun e. Ji ber ku herwek di zaravayê kurmançî de heye, di zaravayên din yên kurdî de jî hin fonemên taybetî hene, ku bi vê alfabeyê nivîsîn dijwar e.”* (60)

Beriya vê nivisara xwe, li ciki din R. Zilan bi vi awayi dinvisine: *“...herçendî tecrubeya nivîsîna kurdî ya bi tîpên latînî ne ji nîvsedsalî bêtir be jî, pirsên ku heta niha derketine pêşîya me, kê-m-zêde, xuya ne. Hinek ji wan pirsan, di wextê de ji alîyê rehmêtî mîrên me Celadet û Kamuran beg de, bi awayekî pêvîst nehatine zelal kirin. Yan jî wan ew bi awayekî kê-m, ne rast û ne di cîh de existîne nav awa û destûra nivîsîna zimanê me. Ji bilî van sedeman, heye ku wan hîç ji alîyê pedagojîk de bîr û hizra hin awa û destûrên ku danîne, nekiribin. Herweha, divê mirov guhertinên siyasî, aborî û civakî yên li perçeyên Kurdistanê qewimîne jî bibîne û tesîr û bandorên wan yên li ser zimanê me bûyî jî hilde ber çavan.”* (61).

Herwesa R. Zilan di vê nivisara xwe da li ser hin babetên ku li ba Mir Celadet û Kamuran Bedîrxan ne zelal in an jî şaş in,

disekine û gelek pêşniyarên hêja li ser pirsên rêzîmanî û rastnivîsînê tine.

4.1.5. “î-ya Kurdî” û dirêjîya dengê î yê:

Em werin ser iddia û ditîna ku, “î” û “i” yên “kurdî” û “i” û “ı” yên “tirkî” ne wek hev in. R Zilan dibê: *“Ji alîyê fonetîkî de ferqeke pir mezin di navbera wan de hene.” “Heke hin dengên zîmanê kurdî bi yên zîmanên Tirkî ve bîn guhertin û bi tipên Tirkî ve bîn nivisandin, bîngehên fonetîkî yên zîmanê Kurdî tîkî birîndar kirin.”*

Berîya ku em li ser van ditînan rawestin û li gor zanebûna xwe, li wan hûr binêrin, divê bête gotin ku dirust nîvîsîn ku meriv gotinê “î-ya Kurdî” an jî “i-ya Tirkî” bî kar bîne. Ji ber ku, ev tipên ku di her du alfabeyan da tîkî bîkaranîne, ne malê Kurdan û ne jî yên Tirkan in, lê belê yê xelkê Romaya kevnare ne. Gava em û Tirk rabî tipên alfabeyê li hev parve kî, ne tenê em ê li xwedîyê rasti yê vê alfabeyê neheqiyê bîkî, lê her wesa jî, em ê bî hev kevin. Lewra bîst û çar tipên me û yên Tirkan wek hev in. Gelo tipên “a”, “b”, “ç”, “d”, “p”, “r” yên Kurdan in yan jî yên Tirkan mî? Nexwe rasti çîye?

Rasti ew e ku, di her zîmanî da deng hene û hejmar û xîsûsiyetên wan dîngan, fonetîka wî zîmanî pêk tînin. Di navbera fonetîka zîmanan da ferqme hene. Alfabeyên zîmanan wek hev bîn jî, dengên (fonemên) zîmanan di hemû wîrî da ne wek hev in. Her çiqas di alfabeyên Fransîzî, Îngîlîzî, Almanî, Swêdî, Kurdî, Tirkî... û hwd da tipên “a”, “c”, “g”, “h”, “p”, “r”, “s”... û hwd ci dîgîrî, lê di navbera wan dîngan da ku li van tîpan tîkî barkirîne, her zîman xwedî xîsûsiyetên cîhê ne. Ango, her çiqas bî aynî tîpa “a”-yê tîkî nivisandinê jî, dengên Kurdî û Tirkî yên mîqabîlê vê tîpê, ne wek hev in. Tîpa “r” di alfabeya Îngîlîzî û ya Fransîzî de gelo eynî dengî dîdî? Na, du dengên cîhê dîdî; yek dengê Îngîlîzî û yê dm yê Fransîzî.

Bı kurtebıri, ferqên ku dı navbera zımanan da hene, ne jı ber şıklê tipên alfabeyan, lê jı ber ferqiyên dı navbera dengên zımanan da ne. Heke ferqı jı teşeyên (formên) tipan çêbûbûna, dıviya Kurdên ku bı tipên latini, erebi û krili dınişin, jı hev fêhm nekırına, zımanên cıhê bixıviyana. Ê her wesa, gava mıleteki dev jı alfabeyekê berdide û dest pê dıke yeka dın bı kar tine, lı gor mantıqê R. Zilan dıvê ew mılet dev jı zımanê xwe berde (!). Bêşik, ev dıtın ne rast e. Lewra gava Mir Celadet Bedirxan, alfabeya erebi terıkand û jı dêlva wê va ya latini jı xwe ra bingeh gırt û bı kar ani, ewi ne dev jı dengeki Kurdi berda û ne jı dengeki biyani bı vê alfabeyê êxıst nav dengên Kurdi. Ewi ne dı şıklê tipekê da, lê dı şıklên sıh û yek tipan da guhertın çêkır û diyar e ku, tu dengeki Kurdi jı birindar nekırıye...

Baş e, şaşıya R. Zilan çiye ? Şaşıya wi ew e ku, ew alfabeya mıleteki û denganiya (fonetika) zımanê wi, yek dıbine. Bı gotınêk dm, ew tip û fonemê tevlihev dıke. Jı ber vê yekê ye ew dıbê, gava Kurd dev jı kuınıkê berdın û bı “i” bınişin û dev jı nıqutê berdın û bı “ı” bınişin, dê dengên Kurdi xerabıbın û bıbın yê Tırki (!). Dıvê merıv jı R. Zilan bıpirse, gava em bıst û çar tipên xwe wek tipên ku dı alfabeya Tırkan da hene, dınişin, gelo em bıst û çar dengên Tırki dıxın nav zımanê kurdi ? Ango lı gor vê mantıqê, şıklê tipan e yê ku dangan tayin dıke. Lê belê wek me lı jor jı nıvısi, em ın yê deng dıdın tipan.

Dı zımanzaniyê da, herçend pırsên alfabeyê bı pırsên fonetikê va têne gırêdanê û têkiliyên wan bı hev hebın jı, lê her du ne yek tişt tên hesıbandınê. Lı ser rûyê dınê tu zıman tune ku xwedi alfabeyekê be, ku her deng û tip sedi sed mıqabilê hev bı. Deng gava dıkevın ser kaxez û dıbın tip, hınık xısûsiyetên xwe wenda dıkm. Lı ser vê yekê Mir Celadet weha dıbê: “*Ji xwe di tu zmanî de danganî (fonetik-CC) û nivîsandin (tipên alfabeyê-CC) ne lêvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li danganîya wî zmanî bê.*” (62).

Jı aliyê dın va, her mîletek lı gor dengên zımanê xwe tipan bı lêv dıke; ne ku tip bı xwe lı her derê yek dengeki nişan dıdın. Heke ku wısa bûya, ango dengê her tipekê lı hemû derên cihanê standard û wek hev bûya, dê dı fêrbûna zımanên biyani da tu zehmetiyên bilêvkırınê tunebûya. Û herwesa, dê tu hewcedariyek jı bo alfabeya fonetiki jı tune bûya. Jı xwe diyar e, her keseki ku dıxwaze zımaneki biyani hin bıbe, her çıqas tip wek hev bın jı, dı bilêvkırma wan dengên zımanê biyani da, ku ew lı tipên alfabeya wi zımani hatine barkırınê, zehmeti dıkşine. Loma jı dı warê zımanzaniyê da hewcedariya alfabeyeke, ku jı ali hemû kesi va bı yek awayi were bilêvkırmê derketiye meydanê. Jı bo vê yeki jı, *alfabeya fonetik* ya navnetewi tê bıkarandin. Bı vê alfabeyê kurti-dırêji, bıındi-nızmiya dangan jı têtê nişankırın. Gava yek bıxwaze bızanıbe, ka tipên dı bêjeyek biyani da bı çê awayi tên bilêvkırınê, ew ne ku lı gor alfabeya zımanê xwe, lê bı alikariya alfabeya fonetiki, dê karıbe bilêv bıke. Ev yek ne tenê dı navbera alfabeyên nefonetiki (wek alfaba ingilizî) lê her wısa, jı bo alfabeyên fonetiki (wek alfabên latini yên Tırki û Kurdi) jı rast e. Jı bo cerıbandına vê rastiye, fermo çend hevokên Kurdi yên ku tipên “ê”, “x”, “q”, “û” û “w” tê da tunebın, -mıqabilê dengên van tipan dı alfaba Tırki da tune ne-, bınvısın û bıdın destê yeki Tırk, bıla jı wera bıxwine. Her çıqas şıklên tipan dı her du alfabeyan da wek hev bın jı, bê şık yê Tırk wê wan lı gor dengên Tırki bıxwine. Gava yeki Kurd guhê xwe bıde yê ku dıxwine, wê yekser pê bıhişê ku, ew ne Kurd e.

Wek tê zanin jı bo dengeki nû bıkeve zımaneki, an jı jı zımaneki dengek wenda bıbe, bı sed salan wext dıvê. Heta nıha, lı ser diroka peydabûn û guhermên dı dengên zımanê Kurdi da, mıxabın kême xebat hatine kırın (63). Loma jı, heqê me heye ku em xwe bıspêrın ditına lı jor ya gelemperi û bêjin, ev çend sed sal ın ku, tu dengeki nû neketiye fonetika Kurdi. Bê guman, bı rakırına kumık û nıqutê jı, wê tu dengên Kurdi bırındar nebın û herwesa jı, tu dengên Tırki dê nekevın nav dengên zımanê Kurdi. Lewra, ditına R. Zilan ya ku rastiye lı jor berevaji

dike, ne ditinek zanisti ye.

Lı vır, dibe ku pırsêk bê hışê meriv: Gelo dı navbera şıklên tipa û dengên wan da, qet tu têkılı tunın? Bersiva vê pırsê, hın hene ji û hım tune ne ji. Bersiva pırsê, bêtır bı mebesta pırsê va gırêdayi ye. Heke pırs ev be ku, çıma gava ayni fonema “r” dı alfabeya latini da dibe tipek, bı şıklê “R û r”, dı alfabeya krili de bı şıklê “ P ”, û dı alfabeya erebi de bı şıklê “ ر ”, dıvê bê gotm ku, dı navbera fonem û şıklê tipê da tu têkılıyeke aqılane tune (hebe ji, ez pê nızanım). Lewra, eyni fonem bı sê şıklên ku naşibın hev tên nişan kırinê. Her wesa dı alfabeya latini de, ayni deng gava bı tipa mezın û ya pıçûk tê nıvisandın, şıklê tipê tê guhertın. Her wek me berê ji qal kır, hın deng gava bı tipên erebi tên nıvisandın, lı gora ciyê tipê (dı destpêkê da, dı nivê gotinê da, dı dawiya gotmê da), ew şıkıl dıguhêrın. Çıma şıklên van tipan bı vi awayi tên guhertinê, ez bı xwe nızanım.

Na heke pırs, ne bı awayê jor, lê bı awayê jêrê be, dê bersiv cihê be: Gelo bı nêrrina şıklên tipan, meriv dıkare bêje ku, ev tip dırêj an kın ın ? Belê, dı hmek alfabeyên latini da meriv dıkare bêje. Gava em lı ser ditinên R. Zilan yên dı xala “f” yê da rawestın, emê lı ser qanûn û qaydeyên ku dı vi wari da hene ji, rawestın.

i. “î-ya Kurdî” ji ya Tırki dırêjtır e:

Heçi ditına, ku dengê “i” ya Kurdi ji ya Tırki dırêjtır, ditineke rast e. Lê belê ev rasti, dıvê nebe sedem û delila ji bo parastma kumika lı ser tipa “î” yê. Jı ber ku, dı dengên zımanê Kurdî da, hm dengên dın ji hene ku ji yên Tırki dırêjtırın; lê belê bı tipên bê kumık tên nıvisandinê. Wek nınûne, dengê tipa “a”, ji ya Tırki dırêjtır e. Lê her du ji bı eyni tipê tên nıvisandın.

R. Zilan ji bo vê ditına xwe qayimtır bıke, xwe dispêre gotinên biyani (Kurdi, Farisi û Erebi) yên ku ketine nav zımanê Tırki. Heke ew dıxwaze bıde serwext kırın ku, dengê

“i” ya Kurdi ji ya Tırki dirêjtir e, ewi bê sebeb xwe ewqas westandiye. Ji ber ku, di serê tu kesi da li ser vê rastiye tu şik tunin. Lê heke mebesta wi ew be, ku bi vi awayi ew dixwaze rastiya bikaranina kumîkê bide nişandan, bi ya min ew di warê metodê da, li vir di nav şaşıyekê da ye. Lewra babeta kumîk û nîqutê, ne li ser dengên biyani yê ku dikevin nav dengên zımanê Kurdi ye, lê li ser dengên Kurdi bi xwe ye. Heke me, wek nîmûne, li ser dengê tipa tırki ya “ö” gotûbêj bıkıra û êm pê biheyirina ka gelo emê vi dengi di alfabaya xwe da bi çı awayi nişan bîdın, wê gavê rast bû, diviya me li ciranên xwe binêrta, ka ewan pîrsên wulo bi çı awayi çareser kîrîne. Lê wek me got, pîrs ne ev pîrs e. Li mileki dın, ev pîrsa dengên biyani yê di alfabeya Tırki da, xasme ji pîrsa dengê “i” ya dirêj, pîrseke ji bo demekê (periyodekê) bû. Gava M. Kemal ji nîşkava alfabeya erebi da aliki û ya latini êxist şûna wê, wek me berê ji qal kir, sergêjayi û tevliheviyên dijar derketin holê. Zımanê Tırki yê wê çaxê, hê ji zımanê Osmani bû. Ê wek tê zanin, ev zıman bi gotinên Erebi, Farisi û Kurdi dagirti bû. Di vê geremol û tevliheviyê da, Tırkan xwestine ku, ew dengên ku di alfabeya erebi da hene, û her wesa ji ali şair û nivîskarên wan yê klasiki ve hatme bikaranînê ji, biparêzin. Tırkan di vê dema sergêji û derbasbûnê de, rabûne li ser hınîk tipên alfabeya xwe ya nû hın guhertin çêkirine. Wek “â” û “î”. Lê divê bê gotin ku, Tırkan xwe zêde bi van awayan neêşandine û xwestine ku rojekê zûtir xwe ji van gelemşan xelas bikin. Lewra ji, ewan nexwestine ji bo dengên “w”, “q” û çendine dm, ku di “zımanê Osmani” de dihatin bikaranînê, alfabeya xwe modifiye bikin û tipên nû peyda bikin. Loma ji, ji bo “w” û “q” bi dest xîm, Tırkan kumîk nedan ser tipên “v” û “k”. Ji xwe, tipên “â” û “î”, wek tipên serbixwe neketine nav alfabeya Tırki.

Îro ji, di zımanê Tırki da bi hezaran gotinên Erebi, Farisi û Kurdi hene. Lê hêdi Tırk, van gotman bi dengên wanên esli bi lêv nakin, lê li gor dengên zımanê xwe wan bi lêv dîkin. Wek nîmûne, “qanûn”(A) -“kanun”, “dewlet”(A)-“devlet”, “çarçove”(K)-“çerçeve”, “henûz” (F)-“henüz”...û hwd.

Mîn meraq kîr û lî wan çîl gotinên ku R. Zilan jî bo pîrsa kumîkê jî ferhenga Osmani-Tîrki ya sala 1959 an girtine, nîhêrt. Mîn tenê yazdeh jî wan gotinan di ferhenga “*Türkçe Sözlük, TDK*” (1983) da ditin. Gelek xerib e, ku lî ser yek jî wan yazdehan jî, tu kumîk tune bûn. Wesa dîxuyê ku Tîrkan dev jî bist û neh gotinên biyani yê ku bî kêri wan nayên berda ne (yên ku R. Zilan jî bo kumîkê wek delil nişan dîda !) û di ferhenga xwe da, her çende bî hezaran gotinên Erebi, Farisi û Kurdi jî hebûn jî, hêdi tu kumîk danaynî ser tipa “î” yê.

R. Zilan, bêyi ku vê meselê piçeki bîkole û rastiyên lî jor birêzkîri, bîde ber çavan, dîpîrse: “*Gelo Tirk çima hin peyvên Iranî û Erebi bi -î-ya dirêj ve dinivîsin? Gelo zimanzanên Tîrkan, ku ev hinde sal in bi paqijkirina zimanê xwe ve mijûl in, evçend nezan in, ku vî tîpî jî alfabeya xwe bi dernaxin ? Gelo em bi vê nezaniya xwe ya zimanzanîyê ve, zimanzanên Tîrkan zanetir in, ku em dev ji -î- û -i-ya xwe berdî ?*” (64) Nexêr, di vî wari da em jî Tîrkan zanatîr nînin, jî ber ku ewan jî zû va ye dev jî vê sergêjiyê berdane û “î” ya bî kumîk bî kar naynî (!).

Tîrkan di demek sergêjayiyê da, lî gor pêwistiyên wan rojan hînek gav avêtine, ku iro ew bî xwe lî wan gavan xweyi dernayên. Ew xwe jî teşqe û tevliheviyên bî vî awayî dîr dîkm û zimanê xwe sıvîk û rewantîr dîkin. Vêca dîvê lî vîr bê pîrsin: Gelo emê bî çî aqlî bîdî ser vê rîya tewşo mewşo ya ku Tîrkan dev jê berdaye?. Em çima xwe bî bermeyên Tîrkan qayil dîkin û bî zîmaneki ku mîrî ye (“zîmanê Osmani”), xwe hê jî mijûl dîkm ? Bî rasti ez tê nagijîm.

4.1.6. Yekitiya zîmanê xwendî-nîvisandî:

Rast e, bêyi ku meriv guh bîde yekitiya zîmanê xwendî û nîvisandî, meriv dê nîkarîbe zaravayên zîmanê Kurdi nêzîkî hev bîke û di pêşerojê da yekitiya zîmanê xwe pêk bîne. Lê

belê, sedemên vê yekê ne guhertinên piçûk m, ku di nav çarçeva alfabeyekê da tîn kîrînê, lê sebeb ew in, ku di xwendin û nivisandinê da sê çar alfabeyên ku ji bîni va ji hev cihê ne, ji alî Kurdan va tîn bikaranîn. Diyar e, ku sebebê vê rewşê jî, angî rewşa ku Kurd yek cure alfabeyê bi kar naynin, siyasî ye û bi perçekirin û parvekirin Kurdistanê va girêdayî ye. Te divê bi kumîk an jî bê kumîk bînvise, heta ku Kurd bi alfabe ya Erebî, Latînî û Krîlî bînvîsin, jî bo yekîtiya zîmanê xwendin û nivisandinê, em ê nîkarîbîn hîm gavan bavêjin.

Gava tîpa “î” ya bê kumîk, xwendin û nivisandinê Kurdî jî bo Kurdên Kurdistanê Bakur hêsantir bibe, ev tiştê qenc e û bi dilê Mir Celadet bi xwe ye jî. Jî ber, ewî her hewil daye ku, xwendin û nivisandinê Kurdî di nav Kurdan da belav bibe. Lê mîxabin ev yekê hanê bi R Zilan nexweş e. Loma jî ew dibê: *“Heke dabaşa me bes li ser ‘ji Kurdên Tirkîyê re hêsantirbûn’ be, wê çaxê divê Kurdên Tirkîyê bi temamî li gor awa û destûra nivîsandina zîmanê Tirkî bînvîsin (!?). Çawan be, zîmanê Tirkî dizanîn, awa û destûra nivîsandina zîmanê Tirkî jî dinasin û pê dinivîsinin jî (!?)...”*. Heke yekî ku jî ferqên di navbera zîmanê Kurdî û yê Tirkî bêhay ev gotin bigota, heke yekî ku bi zîmanzaniyê mijûl nebûya bigota, me yê lê negirta û bîda ber xatîrê nezaniya wî. Lê hî vîr rewş cihê ye; zîmanzanekî Kurd, ku hî ba me hemûyan ditîn wî bi qedir û rûmet in, tiştî wî jî zanyariyê dûr dibê, ku hemû laşê meriv jî ber dîrehî. Gelo ev çî kumîka bi efsûn e ku, di derbekê da zîmanê Kurdî û yê Tirkî jî hev vedîqetî. Ev ewende îşaretek bîngehî ye, ku dikeve şûna awa û destûrê nivîsandina zîmanê Kurdî !. Me zanibû ku, awa û destûrê nivîsandina zîmanekî, jî alî tipên ku di wî zîmanî da mîqabîlên denga ne, awa û qaydeyên morfem, morfoloji û sentaksa wî zîmanî va diyar dibûn. Me nîzanibû ku, ewçend ev awa û destûr hêsan m; tenê kumîkek kare bikeve şûna van hemîyan. Lî vîr, R. Zilan di warê zîmanzaniyê da hîm tiştên nû diafirîne. Lê mîxabin, tiştî şaş. Jî ber ne babeta vê xebatê ye û her wesa jî hewce nake, em ê awa û qaydeyên morfoloji û sentaksa Kurdî û Tirkî nedîn ber hev. Lê divê lî vîr bête dubarekirin

ku, di alfabeya Kurdi û ya Tırki da 24 tip wek hev m. Jî bîli dengdarên “q”, “w” û “x”, ku di mîqabilê van tipan da tu deng di zımanê Tırki da tunin, hemû tipên dengdar yên zımanê Kurdi û Tırki wek hev tîp nîvisandin. Her wesa, di alfabeya Kurdi, Îngilîzi û Fransîzi da, 25 tip wek hev tîp nîvisandin. Çende 25 tipên wek hev, awa û destûrên nîvisandina zımanê Kurdi, Îngilîzi û Fransîzi dîghijine hev, 24 tipên muşterek yên Kurdi û Tırki jî ew çende, di awa û destûran da her du zımanan dîghijînin hev. Bî rakırîna kumîk û nîqutê, hejmara tipên wek hev, jî 24 an dertê 25 an. Ne kê m û ne jî zêde. Bê şîk, sedemê muşterekiya van tipan, jî alfabeya latîni tî; ne ku jî muşterekiya awa û destûrên nîvisandina van zımanan tî. Heke wesa buya, wê çaxê dîviya Kurdên Sovyeta kevn, bî alfabeya krîlî ra, awa û destûrên nîvisandina zımanê Rûsî û Kurdên rojhîlat û başûr jî, yên zımanê Erebi tîxîstîna nav nîvisandina zımanê Kurdi. Bê guman, her çend alfabe muşterek bî jî (çî latîni, çî erebi û çî jî krîlî), jî ber ferqîne morfolojîkî û sentaksî ku di navbera van zımanan da hene, awa û destûrên nîvisandina wan ne wek hev in.

4.1.7. Alfabeya Kurdi-latîni û salên 1960 û 1970 yî:

Lî ser pîrsa di salên 1960 î da, Kurdan zımanê Kurdi bî kijan alfabeyê nîvisîne, heta nîha xebatek cîddî nehatiye kirin. Her çiqas, tîştên di nav wan salan da bî Kurdi hatme nîvisandin kê m in û hîn jî wan lî ber destan m jî, lê baş diyar nîne ka Kurdên Kurdîstana Bakur kengê alfabeya Hawarê ditîne, lî ser vê alfabeyê ditînen wan çîbûne û kengê wan dest pê kirîne bî vê alfabeyê nîvisîne. Gava Kurdên bakur, lî welat cara pêşî bî alfabeya Tırki tîştên Kurdi nîvisîn, gelo çiqas haya wan jî alfaba Hawarê hebû ?. Beriya ku ev pîrsên lî jor bî vedan, meriv nîkare yekser bêje ku, ewan alfabeya Celadet Bedîrxan guhertîne. Gava meriv bî yek qelemekê wan mîrovan gunehkar nîşan dîde, dîvê meriv şert û mercên wan rojan baş bîde ber çavan û bî wîjdan be. Çî R. Zîlan û çî jî kesên ku di bî

tesira ditinên wi da ne, zêde lı ser pırsên jor nasekının û dıbên, wan kesan dı salên 1960 i da alfabeya Celadet Bedirxan guhertine û jı dêlva tipên ê, û, x, k, tipên é, ü, ğ, kh bı kar ani ne û ev şopa hanê ye, ku heta iro didome. Û her wesa ev şop e, ku iro jı dıxwaze tipên î û î ya Hawarê, bı tipên î û î ya alfabeya Tırki bıguhêzin.

Ev ditin jı çend aliyan va şaş in. Beri her tışti, Kurdan hê beriya salên 60 i hin tıştên Kurdi bı alfabeya Tırki nıvisine. Wek têtê zanin, sala 1958 an, dı rojnama “*Ileri Yurd*” (Welatê Pêşketi) da, ku lı Diyarbekirê derdiket, jı aliyê Musa Anter va hin tışt bı Kurdi hatine nıvisandin. Her nıvisandmeke bı Kurdi, -her çıqas bı tipên alfabeya Tırki bin ji-, dı nav Kurdan da dibû bûyere mezin û her wesa dibû sedemê êrişên rojname û karbidestên Tırkan. Mehkeman dawê lı ser dawê vedikirin. Nıviskarên nıvisaran jı dı nav da, kesi jı xwe bala xwe nedıda ser, ka ew bı kijan alfabeyê hatme nıvisandin. Bı qasi ku em pê dızanım, dı nav rewşenbirên Kurdan da, dı wan rojan da lı ser pırsa alfabeya Kurdi, tu gotûbêj nehatine kırım.

Wek nımûne jı bo awayê bıkaranina alfabeyê, em ê jı rojnama “*Ileri Yurt*”ê, nıviseke Musa Anter ya bı Kurdi, lê bı alfabeya Tırki, lı jêr bınavisin:

*Bı çiya ketim lo apo, çiya melûlbûn rebeno
Ceh seridin lo apo, genim hurbun avdalo
Kımlı hati lo apo bı rafaya rebeno
Xuar genimi lo apo hişti kâye rebeno
Hat kımlı lo apo jı zozana lo apo
Xuar genimi lo apo me Xezana lo apo
Ro hatıbu lo apo vaxta dana lo apo
Pez heriki lo apo ser şwana rebeno
Çar kûleke me man apo lı ser gûhana rebeno” (65)*

Wek dıxuyê, Musa Anter jı dêlva tipa “û” ya alfabeya Kurdi, geh tipa “ü” û geh jı ya “u” ya alfabeya Tırki bı kar aniye. Lı kêm ciyan, ewi lı şûna tipa “ı”, tipa “i” bı kar aniye, (wek dı

gotmên “ketim” û “genim” da), weki dîn ewi her dî şûna dengê “ı” ya Kurdi da, tipa “ı” emilandiye. Dî gel vê tipê, dî vê nivîsê de ewi lî şûna “q”, tipa “k”, lî şûna diftonga “xw”, diftonga “xu”, lî şûna “ê”, tipa “e”, lî şûna “w”, tipa “v” û lî şûna “u”, tipa “ü” bî kar aniye. Dî vê nivîsê da çend tişt bala meriv dîkşînin. Jî bîlî tipa “x”, nivîs bî alfabeya Tırki hatiye nivîsandin. Heke haya M. Anter, jî alfabeya Hawarê hebe, gelo çima ew, van tipên lî jor tevlihev dîke ? Na heke haya wî jê tune be, ew çewa bir dîbe jî dêlva dengê “x” ya Kurdi, tipa “x” bînivîsîne ? Gelo dîbe ku haya wî jî “x” ya dî alfabeyên Rûsî û Yûnani da hebe ? Tîşteke dîn ku bal dîkêşe, ew tipên ku ewi şaş nivîsîne, lî gor zîmanê Tırki, pîrani mîqabilê dengên xasê zîmanê Kurdi ne: “û”, “q”, “ê”, “w”.

Dî sala 1962 an da, kovara “Dicle-Fırat” derket. Dî rûpela pêşîn ya hejmara yekem da, disa em nivîseke niv Kurdi-Tırki ya M. Anter dîbinin. Dî vê nivîsa bî sernivîsa “Cav pis” da, bendeke Kurdi heye. Ew bend bî vî awayî ye:

“-Krive Şexo (Şeho), em Filleh, bî we musulmana re mane heyirî. Gî em mîr u bî ziravî, hun jî mîre dîben ‘çî fillehe wek baraz kî.’ U gî em feqîr u tîrsonek bîn, wê çağê jî merê disa dîben ‘çî fillahe cav pis’...” (66)

Dî nav sê salan da, em dîbinin ku, ew alfabeya ku M. Anter bî kar aniye, bere bere ber bî alfabeya Hawarê va dîçe. Dengên “ı” û “i” ya zîmanê Kurdi, her bî tipên “ı” û “i” hatîne nivîsandin.

Gava em lî kovara “Deng”ê (1963) dînêrîn, baş dîxuyê ku lî gor nivîsên Kurdi yê dî “İleri Yurd” û “Dicle-Fırat”ê da, hîn ferq dî alfabeyan da hene. Dî hejmara pêşî da, bî Kurdi armanca kovarê bî vî awayî hatiye danîn:

*“Armanca Me.,
Pîştî 27 Mayîse (Sewra me) tîrja azadî u serbestiyê da ser welatê me.*

Deng, di nav rojname u mecmuayê me da réyeke nuh (teze) vedike: Ew ji bî zîmanê kurdi nivisandîne !

Pîştî Cûmhuriyetê, zane u xwendîkarê me nivisar u xwendîna kurdi bî herfê latîni hin ne bubun. Zîmanê me heta iro hatîbu gîredane. Zane u xwendîkarê me kî 'ehlê din bun', ewana nivisandî u xwendîna kurdi bî herfê (êrebî= arabî) ne terîkandî. Ew jî xîzmeteke pîr ewzele; lê ne bese !

Iro, xwendîkar u xortêd me zîmanê bav u bapîrên me hin bune. Tê gihîştîne kî zîmanê kurdi, pîr kur u pîr hêjaye.

Vê carê, zîmanê bav u bapîran bî herfe latîni (goreyî elif ba Tîrkî) tede avakîrînê(-CÇ) Deng, bî vê xîzmetê şaxêke nuh (teze) lî Tûrkiye vedika. Vê şaxêda em rêwiye pêşî nîn. Armanca me jî welat u milletê mera xebate.

Deng, dîzane u dibeje kî: nivisar u xwendîna zîmanê kurdi dîlxweşiya temamê xelkê Tîrkiyaê. Dî vê rêyêda çîqas xîzmet bete kirîne, xelkême ewqas serfînyaz bibe.

Lî jore me got kî, em rêwiye pêşînin. Me tevna zîmanê kurdi lî darxîstîye.

Gelî xwendîkaren delal (xweşhevîst) bî dest girtî u arika-riye we emê nexşê zîmane kurdi bîbîne sêrî.

....." (67)

Wesa dîxuyê ku, jî bo bî tipên latîni dest bî xwendî u nivisandîna Kurdi bîkî, Kurd 27 Gulanê jî bo xwe keysek baş dîbin. Ev nivisar qet behsa xebatên berê yê di vî wari da hatme kirin nake. Bî ser da jî, berpîrsiyarê Dengê gazîda jî zana û xwendevanên berê dike, ku ewan heta wê demê zîmanê Kurdi tenê bî alfabeya erebî nivisandîne. Kovara Deng dîde zanî ku, lî Tîrkiyê rêwiye pêşî yê ku wê alfabeya latîni jî bo zîmanê Kurdi bî kar bînin, ew in. Herçend tê gotî, ku ev alfabeya nû, dê lî gora ya Tîrkî be, jî nivisarê jî baş diyare, ku ewan xwe di nav çerçova alfabeya Tîrkî da negirtîne. Çûnki tipên "w", "q", "é(ê)", "x" di alfabeya Tîrkî da nînin. Lê belê gava ew dîbêjin, "em rêwiye pêşînin. Me tevna zîmanê kurdi lî darxîstîye", hêdi meriv nîzane ka, gelo çîqas haya wan jî Hawarê hebûye. Jî ber ku, pîraniya wan tipên ku wan bî kar anîne, yê ku di al-fabeya Tîrkî da nînin, bî eynî şiklî di alfa-

beya Hawarê da hene. Loma ji, bivê nevê, meriv nîkare wan ji tesira Hawarê dûr bîbine. Belkû, ev yek ji bo nivisa Musa Anter ya sala 1959 an rast be, lê ji ya Dengê ra rast naxuyê.

Dî nav çar pênc salan da, baş dixuyê ku alfabeya Kurdi hêdi hêdi şikleki ber bî alfaba Hawarê va distine. Heke meriv nivisa Musa Anter(1959) û ya Dengê ya lî jor, bide ber hev, ji bo wan dengên xasê zîmanê Kurdi, van tipên nû hatine pejirandin: (ê) û carna ji (ê), (w), (q) û diftonga (xw). Heçî dengên "î" û "î" yên Kurdi ne, wek dî "Dicle-Fîrat"ê da, bî nişankirîna tipên "î" û "î", ji bo Kurdên wan rojan tu alozî derneanîne. Wek diyar e, kêmasiya herî mezîna ya dî van nivîsaran da, tipa ji bo dengê "û" ya Kurdi ye, ku ew bî tîpek serbixwe ne hatiye nişankirin, lê belê du deng ("u" û "û") bî eynî tîpê (u) hatine nişankirin.

Bî vî hali Kurd gihîştin sala 1965 an. Dî vê salê da kitêba Kemal Badîllî, ya bî navê "*Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*" (Rêzîmana Kurdi ya bî İzaha Tirkî, Zaravayê Kurmancî) derket. Lî gor welatparêzên wê demê, Kurd ji mêj va lî benda xebateke bî vî awayî bûn û derçûna vê kitêbê bûyerek gelek mezîna bû. Ji alî gelek zîmanzanan va, ev kitêb yek ji wan kitêbên hêja û cîddî yên ku dî van bîst sî salên dawiyê da derheqê zîmanê Kurdi da hatme nivîsandîne, tê hesibandin.

Lî gor Kemal Badîllî, dî denganiya zîmanê Kurdi (zaravayê Kurmancî) da sîh û heşt deng hene, ku sîsê ji wan bî tesira zîmanên cîranan ketine nav dengên Kurdi. Loma ji, peyvîst nîne ku ev deng bî tîpekê bêne nişankirin. Lî gora K. Badîllî, ev deng ev m: "h'" (ح), "a" (ع) û "x'" (خ). Çar dengên dm ji hene ku, dî alfabeya Kurdi da nehatme nişankirin. Ev deng ji bî vî awayî ne: "ç'", "k'", "p'" û "t'". Her çend ew dî wê baweriyê da ye ku, ev dengên dawiyê dî nav dengên Kurdi da hê ji hene û divên bî tîpan bêne nişankirîne, disa ji ew vî kari ji bo pêşerojê dihêle û wan ji bî tipên adetî, ango ç, k, p, t nişan dide. Ew dîbê, du cure "l" û "r" hene, lê lî gor wî,

ferqên dî navbera wan da ne ewqas zêde ne. Loma ji, ew zêde lî ser van herdû dengên nasekme.

Lî ser hejîmara dengên bîngêhin yê zîmanê Kurdî, dî navbera Celadet Bedîrxan û Kemal Badîllî da hiç ferqek nîne. Kemal Badîllî heşt dengdêrên zîmanê Kurdî bi vi awayî nişan dîde: a, e, ê, î, î, o, u, û.

Bîst û sê dengdaran jî, ew weha bi rêz dîke: b, c, ç, d, f, v, g, h, x, j, q, k, l, m, n, p, r, s, ş, t, w, y, z.

Wek dîxuyê, dengê ku Celadet Bedîrxan bi tipa “î” nişan daye, ew bi tipa “i” nişan dîde. Her wesa dî pergala (rêza) dengdaran da, ciyên tipên “v”, “x” û “q” dî her dû alfabeyan da ne wek hev m. Mir Celadet lî gor pergala alfabeya latîni û Kemal Badîllî jî, lî gor cîhderka dengên, pergala alfabeya latîni û ya erebî bi hevra bi kar aniye (68).

Çend nîmûne jî vê berhema K. Badîllî: “*Ez lî ser gir rûniştî bûm.*”, “*Mî ji Mem reşbelekek girt.*”, “*Kî ji welêt hatibû ?*” (1965)

Musa Anter, dî “*Ferhenga Khurdi-Tirkî*” (1967) da, alfabeya Hawarê jî xwe ra bîngêh digre û tipekê (diftongekê) lê zêde dîke. Ev tip, bi vi şiklî ye: “Kh”. Bi vi awayî, alfabeya ku ew bi kar tîne, sih û du tip m. Wek tê zanîn, lî çend ciyan Mir Celadet jî diftonga “Kh” bi kar aniye. Lê bi ferqa ku, ew van du herfan jî bo “k” ya hîşk (Çewa dî gotîna “kher” -kesê ku nabîhize-), lê M. Anter ev du herf jî dêlva dengê “k” ya adetî, û tipa “k” ya adetî jî, jî dêlva dengê “k” ya hîşk bi kar tîne. Wek nîmûne, M Anter jî dêlva “kurd” va, “khurd” û jî dêlva “kew” (k ya hîşk) va “kew” dînvîsîne. Kurdologê bi nav û deng, Roger Lescot, dî pêşgotîna jî bo “Grammaire Kurde” (wergera tirkî “*Kürtçe Grameri*”) da, dibê tu maneyek tê da nîne ku, M Anter jî bo hî xîsûsiyetên piçûk yê denganiyê nişan bide, ev tip xistiye nav alfabeya Kurdî (69).

Jî xwe, Musa Anter jî, dî nivîsên xwe yê dî van salên dawiyê

da, tu diftongek bi vi awayi bi kar ne aniye. Nivîsên Musa Anter him bi tipên “ı”-“i” û him ji bi yên “î”-“î” hene. Lê ewi pîraniya nivîsên xwe bi awayê dawî danine.

Çend gotin ji vê berhema M. Anter: *“Min ev ferheng di sala 1963 yanda, li Enqerê, di bendexana mamakê î leşkerî da, di khunca ‘î’ da nivîsî.”*(1967)(70)

M. Emin Bozarslan ji, di “ALFABE” xwe ya sala 1968 an da, alfabeya Kemal Badîllî bi kar tîne. Çend gotin ji pêşgotina vê ALFABE yê:

“Amanca vê Alfabê ev e ku bi awakî hêsan xwendm û nivîsînê hînî xelkê, xasme hînî xortan bike. Lê divê ku ev hînkirin bi alîkarîya xwendayan bê pêkanîn. Lewra xelk ji ber xwe ve nikare hînî xwendin û nivîsînê bibe.”(1968) (71)

Nîmûneyeke din ji sala 1969 an:

*“Ew kîye li ser banê min ?
Dîkê sêslêmanî ye
Çi dixwe ?
Nan û mast
Bi qelibe al (alî-CÇ) rast”* (72)

Ji vê tarixê û pêva, heta sala 1980 yî li Kurdistanê Bakur, ji bilî çend istisnayan, Kurdan her dengê “ı” ya Kurdi bi tipa “ı” yê nişan kirine. Li ser vi dengî û vê tipê, bi qasî ku ez pê dizanim, di navbera Kurdan da, ne di salên şêstî da û ne ji di salên heftêyan da, tu gotûbêj çênebûne. Û gava Kurdan ev tip xwendme ji, bê şik her li gor dengê Kurdi xwendme, ne ku li gor dengê Tirkî.

Heçî pîrsa tipa “î” ya bi kumîk e, ew cara pêşî bi çapbûna kitêba K. Badîllî ra, bere bere di nav hin nivîsên Kurdi da dixuyê. Her wesa ji bo eynî dengî, tipa “i” ya bi nîqut ji, bi qasî ya bi kumîk di nav wan salan da hatiye bikaranîn. Lê ji sala 1975 an heta 1980 î, li Kurdistanê pîr kêmkî “î” ya bi

kumîk bî kar aniye, piraniya nivîsên kitêb û kovarên wan rojan, bî “î” yên bê kumîk in. Û hema hema hemû bî “î” ya bê nîqut hatine nivisandin.

Çend nîmûne jî salên cihê:

“Geli Kurdan !

Heke hûn naxwazîn jî hev taromar û wînda bîbîn, beri her tiştî, zmanê xwe bixwinîn û bîdîn xwendîn.

Lê heke dixwazîn xwe nas bikin û xwe bîdîn nas kîrîn û hezkîrîn; û bî hevaltî û dostaniya millêten dîn re pêş ve herîn; û bî rûmet û serbîlînd bûjin, disa zmanê xwe bixwinîn û bîdîn xwendîn.” (Dr. Nûredîn Zaza, 1976) (73)

“Zman şertê mirov bihevra peyvin, dan û stana fîkir, hev serwext kîrîn, zanîn û zaniyari (çandî) pêş da birîn û jîna cîvatî û bî hev ra mamêle kîrînêye.” (Rîzgari, 1976) (74)

“....

Roj

Mîna klöreke rûnî, jî genimê sorgul

Ku di tendûrê de sorgizirî

Di şebaka me de,

lî rohîlat

lî esman

jî mîn re

Weki bişîrandînên dayyîka mîn

dîbişîrî

.....

Ez mendaleki çar salî me, mamo !

Di sala mendalên dinê de

Ez mendaleki çar salî

Lî hewşê

pîtîk lî ber dîl

pîtîk lî hembêz

laşekî

Laşekî parî bî parî

cenge cenge

jî bombên mêtîngehkari

Ew laş,

Yê

Dayika min e.

.....”

(Rojen Barnas, 1979) (75)

Mir Celadet cara pêşî alfabeya xwe di sala 1932 an da diyar kîr û di Hawarê da ceriband. Mixabîn, piştî 26 salan, gava M. Anter di “Îlîrî Yurd”ê da bi tipên latîni, dest pê dike bi Kurdî hîn tişt dinvisine, wesa dixuyê ku haya wî jî vê alfabeyê tunebû. An na, dê ewî “q” û “k”, “û” û “ü”, “ê” û “e”... û hwd, tevli hev nekira. Jî xwe, eynî nivîskar (M. Anter) di sala 1967 an da, ferhenga Kurdî -Tirkî li gor alfabeya Hawarê dinvisine û dide çapkirin. Îca meriv wê çewa karibe bêje, M. Anter alfabeya Celadet Bedîrxan guhertiye. Jî ber ku, gava haya meriv jî tişteki tune be, bê şîk meriv nîkare wî tiştî biguhêre jî. Jî sala 1962-63 an bi şûn da, bere bere tipên alfabeya Hawarê di nav nivîsên Kurdî da dixuyên. Heke em pergala alfabeya K. Badîllî ne din ber çavan, jî bîlî ferqekê, alfabeya wî û ya C. Bedîrxan wek hev in. Ev yek nişan dide ku, K. Badîllî, alfabeya Hawarê jî bo xwe esas girtiye. Di alfabeya wî da, dengê “î” ya Kurdî, bi tipa “i” tê nişankirinê, lê belê wek tête zanîn ev deng di alfabeya Hawarê da bi tipa “i” yê dihat nişankirin. Her çend M. Anter li hîn ciyan wek Hawarê nivîsi be jî, lê wesa dixuyê ku, nivîsandina vî dengê Kurdî bi tipa “i” yê, nebûye sebebên tu teşqele û bihevçûnan.

Lewra li ser vê pîrsê, jî sala 1958 an heta salên heştêyan, di navbera Kurdan da tu gotûbêj derneketine. Bi gotînek din, di nav salan ra, ew dengên ku bi tipên Tirkî dihatin nivîsandin, yek bi yek dev jî tipên alfabeya Tirkî berdan û tipên Hawarê wergirtin, lê tecrubên ewende salan, tipa “i” yê paraztîn. Jî ber ku, ev tip rojekê jî rojan jî bo tu Kurdeki sergêjayî derneani.

Jî xwe jiyan jî nişan dide ku, çewa Kurd bi alfabeya Hawarê

hısıyane, ewan bî qasî mecalan rê daye, gav bî gav wê bî kar anîne. Meriv bî reheti kare bêje, jî derketina kitêba K. Badîllî û bî şûn da, alfabeya ku Kurdan bî kar aniye, alfabeya Hawarê ye.

Jî alî dîn, dîvê bê gotin ku, ew alfabeya ku Mir Celadet jî bo Kurdên Kurdistanê Bakur çêkiribû, nêzîkî sî sal piştî damezrandina wê, cara pêşî dê di nav welêt da bihata ceribandin. Heke Mir Celadet ev alfabe jî bo Kurdên lî dervayî welêt û yê lî Sûriyê nivisandî buya, dê hm pivanên dm bîda ber çav. Lê her di xewn û xeyala Mir Celadet da bû ku, rojekê Kurdên “welatê jorin” vê alfabeyê hin bîbm, bî wê bixwinin û bînivîsin. Mir Celadet bî xwe, piştî ceribandina di bist û sê hejmarên Hawarê da, radibe di alfabeya xwe da hin guhertinan çêdike; jî bo dengê “k” ya Kurdi, dev jî tipa “q” yê berdide û wê bî “k” yê nişan dide û eynî tiştî jî bo dengê “q” ya Kurdi dike. Ango, Mir Celadet ne muhafizekar bû û jî guhertinan nereviyaye. Ewî jiyanê jî xwe ra pivan girtiye. Piştî ceribandina demekê, ewî alfabeya xwe lî gor rastiyên xelkê xwe guhartiye.

Bî ditina mm, salên destpêka şêstan jî, ceribandîneke bî vi awayî ye. Kurmancixêvên ku Mir Celadet dixwest rojekê alfabeya wî bî kar binin, lî gor şert û mercên xwe, hê di destpêkê da, nîquta lî ser “î” ya Hawarê rakirine û bî vi awayî bikaranîna wê jî xwe ra qencîrî dine. Û rakirina vê nîqutê jî, bî dehan salan jî bo wan tu sergêjayîyek derneaniye. Gava wan bî Kurdi nivîsîne, heps û zindan dane ber xwe, hatîne girtin, di îşkencan da derbas bûne. Loma jî, gava R. Zîlan dibê, ewan “...*tovê wêrankarî, aloz û tevlihevîkirina alfabeya kurdi*..” reşandine (1991), ew jî rastiyên dûr e û lî ked û xebatên camêrên wan rojan neheqiyê dike.

Jî xwe, ew kesên ku di destpêkê da, haya wan jî alfabeya Hawarê tune bû (wek M. Anter), an jî di demek kurt da bî awayekî cihê nivîsîne (wek Yaşar Kaya, ... û hwd), tuçar lî ser awayê ku ewan di wan rojan da nivîsîne, pê nekutane erdê û negotîne, “*ya rast ya me ye !*”. Em tev jî baş pê dizanin ku, hemû

rewşenbirên wan rojan (yên çûne gorê, rehma xwedê lı wan be), iro alfabeya Hawarê jı xwe ra bingeh dıgrın, te dıvê çı bı nıqut û çı jı bënıqut bınvısın, bingeh her yek e. Loma ji, dı destpêka salên şêsti da, cihê nıvisandına jı alfabeya Hawarê, iro hêdi bûye tarix. Ev tarix, tarixa dı nav Kurmancıaxêvan da qonaxên cihê cihê yên bıcibûna alfabeya Kurdi-latini ye.

4.1.8. Salên 1980 yi û gotubêjên kumık û nıqutê:

Her çiqas dı salên şêsti da, hm zımanzan û rewşenbirên Kurd yên lı Ewrûpayê û hın Kurdên lı Sûriyê bı alfabeya Hawarê hm tişt nıvisibın ji, lê belê jı destpêka salên heftêyan û pêva ye, ku hın Kurdên jı Kurdistana Bakur yên ku lı Ewrûpayê bûbûn mihacır, bı alfabeya Hawarê dest bı weşanan kırine. Dı destên wan da tenê deqtiloyên Ewrûpayê hebûn. Wek tê zanin, dı daktiloyên Ewrûpayê da tipa “ı” tune. R. Zilan, lı ser vê dijwariya tunebûna tipa “ı” yê jı bo Kurdên lı Ewrûpayê, bı vi awayi dınvısine: “ *Ji bo ku em bi daktiloyeke bi alfabeyeke latîni, lê ne ya tirkî, binivîsin, divê em ewçend xalên li ser ‘i’-yên ku di nivîsarê de derbas dibin, yek bi yek jê bibin. Ma ev e rehetnivîsîna kurdî, hêsan û gengaztirkirina nivîsîna kurdî ?* ” (1991).

Diyar e ku R. Zilan çiqas lı ser pırsa daktiloyên Tırkan hıssi ye. Hew maye, ew alfabeya Tırkan jı nav alfabeyên latini bıqewırine. Heke em vê ditına R. Zilan qenc û maqûl bıbinın, dıvê Kurdên Kurdistana Bakur, hemû daktiloyên lı ber destên xwe bavêjin ser sergoyan û jı xwe ra jı Ewrûpayê daktiloyên nû ithal bıkın. Ê paş her nıvisarekê, dıvê ew rûnı û yek bı yek nıqtên lı ser “i” yên ku dı wê nıvisandınê da hene, jê bıbın û lı şûna her yeki ji, kumıkeki deynın. Lewra dı daktiloyên Ewrûpayê de, “i” ya bı kumık (î) tune. Diyar e ku, awayê ku R. Zilan dıparêze û dıde pêş, karê Kurdan du car gırantır dıke: Carek nıqut tên paqijkırın û bı dûra ji, kumık tên şûna nıqutan.

Dî nav salan ra, ev xebata lî Ewrûpayê lîdarketî lî gor Ekola Hawarê têtê meşandin. Her wesa lî welat jî, wek me berê qal kîr, jî bîlî tîpa “î” yê, lî ser bîngeha alfabe ya Hawarê kovar, rojname û kitêb derketin. Ev her du tradîsyonên (adetên) piçek jî hev cîhê, dî destpêka salên heştêyî da leqayî hev bûn. Bî vî awayî, gotubêjên lî ser “î” ya bî kumîk û “î” ya bî nîqut dest pê kîrin. Yê ku jî mêj va lî Ewrûpayê bûn û bî xwendin û nivîsandina Kurdî mijûl bûbûn, bî şîd lî Kurdên nûhati rexne digirtin û wan bî sûcdariyên giran îtham dikirin. Nîmûna herî berbiçav ya dî vî wari da, Reşo Zîlan e. Kurdên nûhati, herçend dî dîlê xwe da qanî nebûn jî, bere bere ewan jî nîqutek anîn ser “î” yê û nuqta ser “î” yê rakîrm û lî şûna wê kumîkek danîn. Lê hemû insan bî van dîtînan qanî nebûn, û loma jî bî salan, dî kovara Berbangê da, her du cure tîp hatî bî kar anîn. Bo nîmûne, “*daxwuyaniyek*” e dî Berbangê da, ya jî sala 1985 an:

“ DAXWUYANIYÊK

Xwendevanên hêja !

Nivîsarên Berbangê, hînek bî ‘î-î’ û hînek jî bî ‘î-î’ t ên nivîsandin. Ev problem jî destpêka Berbangê ve heta îro dom dike. Lê, wîha xwuya ye, ku ev yek dê bîn demê-ke dîr û dirêj bigre. Nivîsarên ku jî me re tîn; em her nivîsarê, lî gor orjînalê wê dînivîsin û diwêşînin. Û her wîha Berbang, bî du alfaban tî nivîsandin. Jî ber vî yekê jî xwendevanên me gelek zehmetî dikşînin. Dîwê xwendevan dî vî wari de lî me bîborin !” (76)

Pîraniya yê ku berê bî “î-î” dînivîsandin û vî paşîyê dest pê kîrin bî “î-î” nivîsandin, wek me berê jî got, dî dîl û hîşê xwe da ne îqna bûn. Lê, piştî biryara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, ku dîgo, dîwê hemû Kurd berpîşîyariya xwe zanîbîn û bî kumîk û nîqut bînivîsin, pê bawer nînbîn jî, hêdî xelkê nadîxwest ku mora “*bêberpîrsiyarî*” yê lî wan bê dayîn.

4.1.9. Bê kumîk zîmanê Kurdi têk dîçe !?

Diyar e ku, R. Zilan pîr jî kumîkê hîz dîke. Ew bî qîma xwe ye. Gava dîl dîhebine, ray lê nabe. Lê belê, çaxê ew xwe dispêre zîmanzaniyê, bî dijwari lî dij kesên ku bê kumîk dînvîsîn dertê, û wan bî ithamên gelek gîran sûcdar dîke, dîvê meriv bê deng nemîne. Lewra, bî hûr û kûrî lî ser dîtîn û iddiayên wî em dîsekînm.

Keremkîn, iddiayek dîn jî R. Zilan: *“Heke Kurdên Tirkîyê dev jî ya xwe bernedin, dê bibin sebebên sergêjiyên mezin û têkçûna zîman û bêjeya Kurdi”*. Bî a mîn ev iddia, iddiayek gelege cîddî û her wesa jî, bî curet e. Cîddî ye, jî ber ku, heke ev dîtîn rast be, kovar, rojname, kîtêbên ku bî bêkumîk û bêniqut der dîçîn, jî feydê bêtîr zerarên mezin dîdîn *“zîman û bêjeya kurdî”*. Curetkar e, jî ber ku gellek şair, zîmanzan, siyasetvan, nivîskar û rojnamevanên Kurd, bî vî tehîrî nivîsîne û hêjî dînvîsîn. Iddiayên R. Zilan bî van gotînên lî jor jî namîn, iddiayên wî gelek in. Lî gor wî, ev kes *“hîm û bingeheên zîmanê Kurdî yê nivîsandînê ...birîndar”* dîkîn, *“bingehên zîmanê xwe aloz”* dîkîn, bî awakî *“hîç û pûçî”* serê xwe lî ser alfabeke nû dîşînin; bîyî ku mafê wan hebe, *“bî zîmanê kurdî ve..”* dîleyîzîn û *“Berê pêşveçûna vî zîmanê, çî yê nivîsandîn û çî jî yê axaftînê, bî alîkî bervajî de yan jî bî alîkî tijî bî asteng de”* dîdm, *“...kesên jî xwe re hobî nedîtî lî ser vê pîrsê rastoçepo... galegalên tewşomewşo”* dîkîn, *“...zîmanzanî ne karê her kesî ye.”*,....û hwd.

R. Zilan bî van iddia û sûcdarkirinên xwe qîma xwe nayne, hê zêdetîr dîçe û jî *“zanava(îdentîtêt) xwe nasîn”*a ew kesên ku bî vî awayî dînvîsîn, dîkeve şîkê. Ew dîxwaze bala van kesan bîkşîne: *“...em kurd ne xwedî zanaveke qewîn in. Me hîna xwe baş nas nekiriye, ku em jî zanava xwe ya kurdîniyê re jî xwedî derkevin. Heta niha, me pê xweş e, ku em jî bîyanîyan re serî biçemîn û xwe dî bin destên wan de bîhêlin...”* (77).

Vêca, em ê jî van gotînên R. Zilan ra bêjîn çî ? Bî a mîn, dî

bersivdanê da, ji dêlva iddia û sûcdarkirînên bê pergal, divê meriv xwe bispêre jiyanê û binêre, ka ev gotinên R. Zilan rastin an na.

Hê ji salên 1960 î û nemaze ji sala 1975 an û bir va, gelek kovar, kitêb û hin rojname, di nivisên xwe da, kumika li ser “î” yê û nîquta li ser “i” yê bi kar naynin. Di warê navrokê de, çê kitêb, çî kovar bin, pîr texlit in. Ji nûçeyên rojnaman bigre, heta nivisên zanisti yên texlit texlit. Gava em bala xwe didin ser wan xwediyên nivisarên çapkiri, hinek ji wan bi dehan salan li ser zimanê Kurdi xebitine, hinên dm bi salan Kurdayeti kirine û huviyeta wan eşkere ye. Wek berê ji me qal kir, Qanadê Kurdo li ser zimanê Kurdi ji si salan bêtir xebiti, di vi wari da gellek berhem dan, nêziki bist sal serokatiya Beşa Kurdzaniyê ya Enstituya Rojhilatnasiyê ya Leningradê kir. Her wesa em tev pê dizanin, ku hê ew neçûbû rehmêtê, gelek nivisar û kitêbên wi bêkumik û bênîqut hatme çapkirînê. Kesi rojek ji rojên Xwedê, nebîhist û li tu deri nexwend ku, ev zana û welatparêzê hêja li diji vê yekê derketibe. Heke ew iddiayên R. Zilan rastbin, çewa zimanzanaki wek Prof Qanadê Kurdo, bi destê xwe rabe zerarê bide ziman û bêjeya Kurdi?. Ew, wê çewa li berhemên xwe yên bi vi teheri, ku wê di “*ziman û bêjeya kurdi*” da birinên xedar vekin, çav bigre ?

Em dev ji Qanatê Kurdo berdm. Dibe ku bê gotin ev zanayê hêja, ji ekola Hawarê nine, ji ya kurdên Sovyeta kevn e. Lê em dibinin, ku nivisên Cegerxwin, Osman Sebri û Nûredin Zaza ji, car bi car bê kumik hatine çapkirînê. Wek tê zanin, van her sê niviskar û welatparêzên Kurd, di Hawarê da ji nivisine. Baş e, ev çî hikmet e ku ev zanayên Kurd rê bîdî şaşiyên ewende mezin û li dij derneyên.

Divê meriv li tu camêri bêwîcdani neke. Tu şikek min tune ku, çî tiştên ku bêkumik û bênîqut hatine çapkirin, bi qasi yên bi kumik û bi nîqut çapkiri, hêja û bi nerx in. Ewan zanabûna me zêde kirme û qinyata dîlê me ya Kurdayetiyê qayimtir kirine. İddiayên R. Zilan, yên di vi wari da ji, yên hissî ne û

loma ji mîxabin, ne zanîsti ne.

* * *

R. Zilan dî nîvisara xwe ya lî ser nîvisandîna Kurdi da, dîbê dî zîmanê Kurdi da du cure “i”(1) hene : Yek pîr kurt e, ya dîn ne hinde kurt e. Lî ser vê ditînê, ew xwe dispêre kurdizanan, lê navê wan nabêje ka ew kî ne. Eşkere ye, lî vîr R. Zilan dev jî ditîna xwe ya xala “a” yê berdide. Ew, lî gor him û bîngeha ku dî Hawarê da hatiye danîn, lî vê pîrsê nanêre. Dî Hawarê da, ne bî tenê lî cîkî û carekê, lê lî gelek cîyan Mir Celadet dîbêje ku dengdêrên zîmanê Kurdi yan kîn in yan jî dirêj in. Dî zîmanê Kurdi da, dengdêrek ku him kîn be û him jî dirêj be tune. Ê disa lî gor Mir Celadet, dengdêra “i”(1) dengdêrek kurt e. Heke pîvan Hawar û Mir Celadet be, ev ditma Reşo Zilan ne rast e. Dî nîvisara R. Zilan da diyar nabe, gelo çî tîkîliya du curebûna “i”(1) yê û nîquta lî serê, bî hev heye. Çewa me berê jî got, jî ber ku R. Zilan deng (fonem) û tîpan (grafem) tevlihev dîke, dîbe ku bî vî awayî hîzîr kîrîbe: Çaxa dengê “i” ya Kurdi jî ya Tîrki cudatîr be, dîvê bî awayê ku Tîrk dînvîsîn, ew deng neyê nîvisandî. Her wesa, eynî mantîq e, ku dirêjbûna dengê “i” ya Kurdi, dîke sedemê kumîkê.

4.1.10. “Bîngehê alfaba Kurdî bî kumîk hatîye danîn” !?

Dî sala 1985 an da, dî paneleka bî navê “*li ser wêje û zîman*” da, jî R. Zilan tê pîrsîn: “*Di zîmanê kurdî de gelo çîma kumîk tê bî karanîn ?*”. Her çend xwedîyê pîrsê, dî pîrsê da behsa dengê “i” yê nake jî, lê jî alî R. Zilan û guhdaran va diyar e ku ev pîrs, pîrseke lî ser tîpa vî dengî ye. Jî xwe, dî bersivdana R. Zilan da jî, ev eşkere dîbe. Loma, bî hêsani merîv dîkare bêje ku, gotûbêjên lî ser alfabeya Kurdi ya latîni, ev deh panz-deh salên dîçîn û tîn lî ser vê pîrsê dîcîvîn; an jî, bî hmceta vê pîrsê ye ku hîn pîrsên dîn jî dertên pêşberî me. Îca ka em vegerîn ser bersiva R. Zilan. Ew weha dîbê: “*Di her zîmanî de*

qanûnên taybetî hene. Bingehê alfaba kurdî bi kumik hatiye danîn; lê dema M. Kemal alfaba tirkî guhart, Celadet Bedirxan jî di alfaba xwe de hinek guhertin çêkir û alfaba xwe nêzî ya tirkî kir. Lê dengdêr cûda man ‘î’ ya kurdî dirêj û ya tirkî kurt e...”.

Ez bî xwe tê nagijim, ka çî têkîlî di navbera qanûnên zıman û kumîkê de hene. Heke qesda R. Zilan ew be ku, jî ber qanûnên zımanê Kurdi, “*Bingehê alfaba Kurdî bi kumik hatiye danîn*”, divê wê çaxê em jê bîpîrsin: Gelo bî çî aqilî wê Mir Celadet dev jî hmîk qanûnên zımanê Kurdi ber de û rabe alfabeya xwe biguhêze û nêzîkî ya Tırkan bike?. Divê bê gotin ku, ditîna “*Bingehê alfaba kurdî bi kumik hatiye danîn*”, ne ditîna himdarê vê alfabê, Mir Celadet Bedirxan e, lê ya R Zilan e. Lî tu derê Mir Celadet nenivisiye, ku ewî bingeha alfabeya xwe lî ser kumîkê daniye. Dî Hawarê da, bî zımanekî gelek vekirî, jî alî Mir Celadet va, prensibên jî bo bingeha alfabeya Kurdi ya latini, hatine nivisandin. Mir Celadet wan bingehan, di şeş destûran da dîcivine.

Mir Celadet di destûra xwe ya pêncan da lî ser pîrsa kumîkê dîsekîne. Ew, heta ku jî dest tê, xwe jî barkirîna herfan bî nişanên nû dîr dixê. Bî gotinek dm, ew ne dîldarê nişanên lî ser herfan e. Heta xwe mecbûr nediye, nişan bî herfan va nekîrîne. Pîrî caran, gava ewî lî mîqabilê hîn dangan, di alfabeya latini û ya Tırki da tipên mînasib nediye, wê çaxê xwe mecbûr ditiye ku, nişana bîlîndekê bî kar bine. Jî xwe ew dîbê, nişan di nivisandinê da, dîbîn sedemê wext wendakirîne; bî jîbîrkîrma wan tevlihevi çêdibîn; û ew nivisandinê qîrêj dîkîn. Dî rewşek weha da, gelo meriv çewa dîkare bêje ku “*Bingehê alfaba kurdî bi kumik hatiye danîn*”.

Hemû tipên ku kumîk lî ser wan in (ê, î, û), dengdêrên dirêj m. Dirêjayiya van dangan, ne jî ber wê yekê ye ku lî ser tipên mîqabilê wan kumîk hene, lê jî ber ku ew deng (fonem) di eslê xwe da dirêj in. Heke bî kumîkê qesda Mir Celadet nişankirîna degdêrên dirêj buya, wê çaxê diviyabû ku, ewî

kumîkek lî ser her du degdêrên dirêj “a” û “o” jî nîvisibûya. Lî gor destûrên ku ewî jî bo alfabeya xwe daniye (bendên 1 û 2), heta ku jî destê wî hatiye, xwestiye alfabeya xwe nêzîkî ya Tirkî bike û her wesa jî, heta ku jî dest bê, dengên herfên latîni yê edetî bî kar bine. Dî alfabeya latîni ya edetî da, mîqabilên dengên “ê” û “û” tunm, lê yê “î” heye, ku “i” ye. Baş e, gelo çima Mir Celadet ev tip dî alfabeya xwe da bî kar ne anî ? Jî hêlekê va ew dibê, bêyî bîr guhertin, *“Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî ên adetî...dî elfabêya kurdî de”* bîr hîlanin, jî hêla din va, ew dengê herfeke latîni ya edetî bî kar nayne û wê herfê diguhêre. Me lî gor zanebûna xwe, bersiva vê pîrsê dî rûpelên berê da bî dîrûdirêjî daye.

R. Zilan dibê, çaxa Mir Celadet dî alfabeya xwe da hîr guhertin çêkîrîn û wê nêzîkî ya Tirkî kir, dengdêr cûda man. Ev ne rast e. Jî ber, gava Tîrkan dest pê kirin alfabeya latîni bî kar anîn (1928), lî ser tu tipên dengdêrên alfabeya ku Mir Celadet bî kar dîani, kumîk tunebûn. Ewî dî sala 1928 an da, jî dêlva tipa “ê”, carna tipa “e” û carna jî tipa “î”; jî dêlva tipa “î” va, tipa “i”; jî dêlva tipa “i” va, yê “i” û “e”; û jî dêlva tipa “û” va jî, diftonga “ou” bî kar dîani. Tipên dengdêrên ku Mir Celadet neguhertine, ew tip bûn ku, dî alfabeya wî û ya Tîrkan da wek hev dîhatin nîvisandin. Ango tipên a, e, u, o.

4.1.11. Bêizahiya î-ya bê nîqut

R. Zilan ne tenê lî ser kumîkê ditîn û iddiayan dide pêş, lê her wesa lî ser “î” ya bî nîqut û ya bê nîqut (î) jî hîr tîştan dibê. Lî gor wî: *“...dengdara (qesda wî dengdêr e-CC) ‘î-î’-ya zîmanê kurdî û ‘î-î’-ya zîmanê tirkî ne mina hev kurt in...”*. Ev ditîn, ditîneke rast e. Lewra, dî deranîna van dengên da, bîlîndî û nîzmiya piştî zîman ber bî esmanê dev ra, dî herdu zîmanan da jî hev cihê ne. R. Zilan dibê, jî xeynî zîmanê Tirkî, dî hemû zîmanan de lî ser “î” ya piçûk nişanek heye. Lê lî ser “î” ya mezîn, zîmanê tirkî jî dî nav da, dî tu zîmanekî da nişan tunîn. Ev tîşt, jî bo R. Zilan bê îzah e. Ew dibê, vêca em ê çewa bîdîn

ser vê şopa şaş, ya ku Tırk lı serê çûne û “*em ê vê kir û kir-deya xwe çawan îzah bikin.*” Mın meraq kir û lı çend alfabeyên latini nihêrt (alfabeyên Îngilizi, Fransızı, Almanî, Swêdi, İtali, İspanî). Dı hemûyan da lı ser tipa “i”(î) ya hûr, nişanek heye, lê belê dı hiç yeki da lı ser tipa “i”(î) ya gır, nişanek tune ye. Lê belê, çı hûr çı gır be, lı ser ya me û ya Tırkan nişanek heye. Ango, çı bı awayê Hawarê be û çı ji bı awayê bê kumik be, tipên hûr û girên ji bo dengê “i” ya Kurdi bı vi awayi tên nıvisandınê: “I-î” (Î-î). Baş e, R. Zilan vê yekê wê çewa izah bıke.

Jı xwe, nımûnên ku R. Zilan ji bo tipa “i”(î) ya Hawarê) dide, dı rastiyê da ne ji bo vê tipê ne, lê ew ji bo tipa “i”(î) yê ne. Jı ber ku, çend istisna cihê, dı hemû alfabeyên latini yên zımanên sereke yên dmyayê da, yek cure “i” hene, kû mıqabilê alfabeya latini ya esli ne. Ew ji, tipa “i” ya bê kumik e. Dı wan zımanên lı jor da, tenê yek cure “i” heye û bı modifiyekırına vê tipê, tu dengeki dın nehatiye nişankırın. Jı ber vê yekê ji, gava ew “i” ya gır dınvısın, hewce nine ku nişanek bıdın serê. An na, ev yek dı nıvisandınê da, dıbe israfa wext. Lê belê dı alfabeyên ku bı modifiyekırma tipa “i” yê, dengek cihê û serbıxwe tê nişan kırınê da, dı nıvisandına tipên gır da meriv nıkare du “I” yên bê nişan deyne. Lewra diyar nabe ku, ka ev tipa gır ya bê nişan, ji wan her du dengên cihê, mıqabilê kijanê ye. Loma ji, dıvê nişanek bê ser yekê. Heke “izahetek” pêwist be, izahet ev e. Jı bo pıraniya alfabeyên zımanên Ewrûpi, sergêjiyek bı vi awayi tune. Jı ber ku, çewa lı jor ji hat gotın, dı alfabeyên wan da yek cure “i” heye, tipên ji vê “i” yê modifiyekırı nınm.

Bı ditına mın, tıştê ku Tırkan dı alfabeya xwe da çêkırıne, tışteke xerib nine, aqılane ye: tipa hûr û ya gır, ji bili ferqa mezinahiyê, wek hev dınvısın. Her wek tipine dın: “C,c; Ç, ç; K, k; M, m;...û hwd”. Ê mm heta iro, tu Tırkek neditiye ku ji ber vê yekê, pêra sergêjayi çêbûbe. Pivana R. Zilan, dıbe ev: Jı ber ku Tırk tipa hûr bê nişan (ı) dınvısın, dıvê em wek wan nekin. Lê bı şaşı, ew radıbe, tipa ji bo dengê “i” ya adeti ya ku

dî zîmanên dîn da heye, bî tipa dengê “ı” ya Tırki ra dîde ber hev. Wek meriv tipên “a” û “e” bîde ber hev, û paşê jî, jî navê nîkarîbe derê û lî izahetan bigere.

4.1.12. Awa û qaydeyên dirêjkirina dengdêran:

Em vegerin ser xala dawî ya çend ditin û iddiayên R Zilan. Çend sal berê, dî nivisarek xwe da, R. Zilan dibê: Nişana kumîkê (bîlîndekê) ya ku tê ser grafema “î” yê, dîde xuyakirin ku dîvê ev dengdêr bête dirêjkirin. Ew, jî zîmanên dîn jî, jî bo dirêjkirina hîn dengdêran, hm awa û qaydeyên ku dî alfabeyên wan zîmanan da hene, bî rêz dîke. Ew weha dîvîsîne: *“Hinek zîmanên dîn, jî bo dirêjkirina dengdarên (qesda wi dengdêr e-CC)dirêj yên zîmanê xwe, rêyîne dîn dane ber xwe. Wan ya bî riya cotnekirina tîpên bê deng yên bî dû re tîn, yan bî riya bikaranîna du grafeman, yan jî bî riya çend nîşanên bî hev re ev pirsgirêk çareser kirine. Heçî Mîr Celadet e, ew xwe ‘jî awayê nîşankirina çend dangan bî herfekê an dengêkî bî çend herfan’ yan jî bikaranîna çend nîşanên bî hev re dîde alî, ...Jî lewre ew vê nîşana bîlîndekê çêtir dibîne û diêxe ser hersê dengdarên me yên dirêj. Mîna hîn zîmanên dîn, dî zîmanê kurdî de jî taybetmendîya serekî ya vê nîşanê, dirêjkirina dengdaran e...*

Jî xwe dî zîmanê kurdî de sê dengdar hene, ku ew jî dengdarên ‘ê’, ‘î’, û ‘û’-yê ne, dirêjin. Eger em vê nîşana giring jî ser yekê jî wan rakin, gelo maneya lî ser yên dîn hiştinê çî ye ?” (78)

Me berê jî nêzik va dit ku, bî çî awayî Mîr Celadet kumîkê (an jî bîlîndekê) jî bo alfabe ya xwe pejirand (qebûl kir). Beriya ku em lî ser ditinên R. Zilan yên lî jor bisekinim, dîvê em şaşîyeke wi rast bikin: Dî zîmanê Kurdî da, dengdêrên dirêj, ne wekî ku ew dibê sisê ne, lê pênc in. Jî bîlî ew hersê dengdêrên bî kumîk, ku R. Zilan behsa wan dîke (ê, î, û), du dengdêrên dirêj yên bê kumîk jî hene: “a” û “o”. Wek dîxuyê, bî tipên bê kumîk jî meriv kare dengdêrên dirêj nîşan bike.

Heçi ditîna ku, dî hîn zımanan da awa û qaydeyên jî bo dîrêjkırîna hîn dengdêran hene, ditîneke rast e. Lê ev awa û qaydeyên ku dî van zımanan da hene, ne weki hev in û lî gor her zımani jî tînen guhertin. R. Zilan ev pîrs pîr bî gelemperi derbas kîriye. Gava ku meriv jî nêzik va lî van zıman û awayên dîrêjkırîna hîn dengdêrên wan dînêre, ne encama ku R. Zilan dîde pêş, lê hîn rastiyên dîn dertên meydanê.

Dî zımanê latîni da, ku alfabeya wê jî bo gelek zımanên dîn bûye bîngeh, tipên dengdêr hîm kurt û hîm jî dîrêj in. Kengê ew tip dîrêj û kengê kurt tîne xwendîne, bî tipên bêdeng yê bî dû re tînen ve girêdayî ne. Wek qayde, gava pîştî tipa dengdêrekê tîpek bê deng bê, tipa dengdêr pîçek bî şîd tî xwendî û ew dîrêj dibe. Lê gava pîştî tipa dengdêr du an sê tipên bêdeng tînen, ew kurt. tî xwendîne, Çend nîmûne:

Hordeglun (Bûkık) “o”-ya pêşî kurt û ya bînxêtkırî dîrêje.
Commotio (Çelqbûna mêjî)

Ev qaide derbasi hîn zımanên Ewrûpi jî buye; wek zımanê Swêdi.

Glas (şûşe) “a”-ya dîrêj
Glass (besteni, dondırîne) “a”-ya kurt

Hîn zıman, jî dêlva dengdêrên xwe yênen kurt yek tip, jî dêlva yênen dîrêj jî, du tîpan lî kêleka hev dînîvisin. Wek nîmûne, zımanê Finî (Finlandiyayî):

Sata (sed) - sataa (baran barin). -a-ya kurt: “a”; ya dîrêj: “aa”

Vika (çewt)- viisi (pênc). -i-ya kurt: “i”; ya dîrêj: “ii”

Dî hîm zımanên wek İngilîzi da, jî bo aynî dengdêrê, gava dîrêj e, ew bî çend tîpan, gava kurt e jî, ew bî tîpek an jî çend tipên dîn tî nişankırin. Çend nîmûne:

Sheep (mi, mêşin) - east (rojhilat) -i-ya dirêj: "ee", "ea".
Diploma (şahadetname) - dinner (şiv) -i-ya kurt: "i"

Hin zıman ji hene, ji xwe ra qaideyên cihê qebûl kirine. Gava dengdêrên wan kurt in, ew bi awayê tipên qaydeyi, gava dirêjin ji, bi anina nişanek li ser tipên qaydeyi tene diyarkirin. Çend nîmûne ji alfaba Macari:

Ma (iro) - hát (pışt). -a-ya kurt: "a", ya dirêj: "á"
Fel (ber bi jor) - ég (esman). -e-ya kurt: "e", ya dirêj: "é"
Mi (em) - ír (nivisin). -i-ya kurt: "i", ya dirêj: "í"

Em nîmûnan zêde dirêj nekîn û werin ser pîrsa xwe. Dî danina vê pîrsê da, R. Zilan hin tîştan tevlihev dîke. Beri her tîştî, gava ew radibe ji zımanên din awayên dirêjkirina dengdêran tine, bala xwe nade ser, ku ew dengdêr him kurt û him ji dirêjin. Bi gotmek din, çî kurt û çî ji dirêj, deng aynî deng in. Bi dirêjkirina dengê kurt, yê dirêj çêdibe. Lê dî zımanê Kurdi de, dengdêr ne bi vi awayî ne; ew yan kurt yan ji dirêj in. Dengdêrên kurt, bi dirêjkirina nabin yê dirêj û heçî yê dirêjm ji, kurt nabin. Dengê "î" (î), bi dirêjkirina dengê "ı" (i) çênabe. Ji ber ku, dengê "ı" û dengê "i" du dengên serbixwe ne, cihderkên wan cihê ne, ne ku yek kurtkirina ya dm e. Ji xwe gava Mir Celadet, bilindeka xwe dide nasandin, weha dinvisine: *"Ev nîşana ha di hin elfabêyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabêyên din de dengê dengdêran weke xwe dihêle, cihderkên wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguherîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî drêjin û tucar kin nayên xwendin."* (79).

Li vir divê bala xwendevan bê kışandin ku, xisûsiyeta sereki ya kumîkê ew e, ku dengêkê diguhêre dîke dengeke din. Ne ku dengeki ku kîn e, dirêj dîke. Gava Mir Celadet dibêje, *"...dengdêrên bi bilindek hemî jî drêjin..."*, ev nayê wê manê ku, hemû dengdêrên dirêj bi kumîk in - ku çewa R. Zilan

wê çaxê wê dî navbera destpêk û dawiya hevoka wi ya lî jor da dubendiyek derketa.

Bî kurt û kurmancî, M Celadet dîbê gava bîlîndek tê ser tîpa “e” yê, wê dîke “ê”; dengêkî nû û bê şîk tîpeke nû çêdibe. Fonksiyona kumîkê ya taybetî, çêkırîna tîpek nû ya jî bo dengêkî dîn, dengêkî serbixwe ye. Lê dî alfabeya Kurdî ya latînî da, ew dengên ku bî tîpên bî kumîk tîn nişankırînê, hemû jî dengê dirêj m, ne ku jî bo xatîrê kumîkê ew tîn dirêjkırînê. Çaxa me lî hev kîr û me ew dengdêrên xwe yê dirêj, bî tîpîne bêkumîk nişan dan (wek dî tîpên “a” û “o” da), bê şîk gava em wan bîxwinîn, em ê dirêj bîxwinîn. Lewra, deng in yê ku tîpan bî lêvdîkîn, te dîvê bîla tîpek tazi ipela be, te dîvê bîla bî kumîk be, bî dûvîk be, bî nîçîk be an jî bî nîqut be, hiç ferq nake. Me çewa hî hev kîrîbe, ku fîlan dengî em ê bî kîjan tîpî bînimîn, ew dê bîbe mîqabîlê wi dengê me û em wi şîklî lî ku derê bîbinîn, em ê wi dengê xwe lê bar bîkîn. Mir Celadet jî bo tîpeke nû jî bo dengêkî nû bî dest bîxe bîlîndek pejîrandîye, ne ku jî bo dirêjkırîna dengêkî ku bî tîpekê hatiye nişankırîn. Ew awa û nîmûnên jî zîmanên cîhê cîhê, ku me lî jor dan, hemû jî bo dengên bî du xîsûsiyet in (kurt û dirêj). Guhertîna dî deng da, dengêkî nû çênake, lê rengêkî nû dîde wi dengî. Lewra jî, ew guhertîn, guhertînek dî mîqdarê (kvantativ) da ye. Lê belê, dî alfabeya Kurdî da, bî hatîna kumîkê lî ser tîpeke qaydeyî, ew tîp tê guhertîn dibe tîpeke dîn. Ne ku ew tenê kurt û dirêj dibe. Loma jî, guhertînen bî vî awayî, ne dî warê mîqdarê da ne, lê dî warê wesfê (kvalitetê) da ne.

Jî ber van sedemên, iddiaya R. Zilan ya ku dîbê, xîsûsiyeta sereki ya kumîkê, dirêjkırîna dengdêran e, iddiayek jî rastîyê dîr e. Kumîk tê ser tîpekê û wê tîpê dîguhêre û dîke yeke dîn, ne ku jî bo dirêjkırîna wê tîpê ew tê bîkaranîn.

Em ê lî vîr rexne û dîtmên xwe yê lî ser dîtîn û iddiayên R. Zilan bîqedîn.

Heçî lî ser vê pîrsê dîtinên Enstîtîya Kurdî ya Parisê ne, ew du

kêm çar zêde, wek yê R. Zilan in. Lewra jî, hewce nake ku ji nû va em li ser wan ditinan yek bi yek, bi hûr û kûrî rawestin.

5. DÎTINÊN DUDILKÎ Û ŞERMOK

Em werın ser ditın û ramanên ew kesên ku carna dîbên, raste sergê-jayiyeye bı vi awayi heye, lê divê meriv ne lezine, bêwext vê pîrsê venede. Em bîsekının heta ku hın muesesên Kurdi tên damezrandın. Wê çaxê pîsporên zimên dê vê pîrsê çareser bikin.

Aligirên vê ditinê ji, du beş m: Yên ku dî ditın û delilên xwe da, dî bîn tesira R. Zilan da dîminın. Ew dî navbera ditmên R. Zilan û yên ku dîbên pîrsek weha heye da, dîçin û tîn. Loma ji, ew carna dîbên pîrsek weha heye û carna ji vê pîrsê nabinın. Jî wan kesên ku dî vê komê da ne, em ê lî ser ditinên S. Rêving bîsekının.

Yên ku dî beşê diduyan da ne, bı rasti jî jî vê pîrsê agahdar in. Ew carna nivîsên xwe bê kumîk û bê nîqut jî dîweşinın. Jî wan kesan jî, em ê lî ser ditinên Malmisanij û yên Mahmûd Lewendi rawestm.

5.1. Ditinên S. Rêving:

Bî qasî ku ez pê dîzanım, lî ser pîrsên alfabeya Kurdi ya latini du nivîsên S. Rêving dî kovara Armancê da derketme. Nivîsa pêşî, bı sernivîsa “*Divê em xwe jî alfabetîzebûna Tirkî xelas bikin*”, dî sibata 1992 an da û ya diduyan jî, dî ilona 1993 an da, bı sernivîsa “*Li ser rapora Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*” der çûn.

Ew dî nîvîsa pêşî da pêwîst dibîne ku, dîvê pîrsên alfabeya kurdi ya latîni bêne munaqeşekirinê. Sernîvis û çend encamên dawiyê ne tê da, ew nîvisar dî warê uslûb û naverokê da gelek bî nîrx û informativ e.

Nîvisara dîduyan, wesa dîxuyê bêyî ku bî dûr û kûrî lî ser hîn meselan bê sekînan dî, bî bersivên gelek lî rû û tevî hîm şaşîyan hatiye nîvisandin. Lî gelek cîyan, dî navbera her du nîvisên wî da dubendiyên berbiçav hene.

5.1.1 Awayên danîna hîn pîrsan:

S. Rêving ditîna R. Zîlan ya derheqê peydabûna hîn pîrsên alfabeya Kurdi-latîni dubare dîke. Ango lî gora vê ditînê, hîn tipên alfabeya Mir Celadet, jî alî şiklî va wekî xwe ne mane. Ev guhertîna dî şiklê tipan da, dî destpêka salên 1960 î da, bî derketîna hîm kovar û pirtûkên Kurdi ra; tipa “î” wek ya “i”, ya “i” wek “ı”, “ê” wek “é”, “x” wek “ğ”, “û” wek “u” û “u” wek “ü” hatî nîvisandin. Ew vê ditînê bî vî awayî dîdomîne: “Wek R. zîlan jî ...dibêje..”, “Van guhertînan şopa xwe lî ser Kurdên Kurdistanê Bakur bişt û piştî 1980’î lî Ewrûpayê bî derçûna kovar û rojnamên Kurdî, problemê careke dî serî hilda; vê carê pîrani gotûbêj lî ser şiklên î û i yê alfabeya Celadet Bedîrxanî bû. Tevî ku lî Ewrûpayê hejmarên pêşî yê kovar û rojnamên kurdî pîr in jî gotûbêjên lî ser şiklên î û i yê, lê heta îro jî dî kovar, rojname û pirtûkên Kurdî de yek cûre alfabe nayê bî kar anîn; hinek î û i dinivîsin, hinek i û ı dinivîsin. ”

Tîrsa wî ew e ku, “*problema nivîsandina du şiklên cuda jî bo dengekî wek î û i, yan i û ı ...*” lî welêt jî serî hilde û “*bibî sedema alozî û tevîheviyê*”. Ew lî ser van pîrsan bî dengiyê şaş dibîne û dibê: “*Bi ya min berî ku ew alozî lî perçê herî mezin û lî nav nîfûsa herî mezin ya Kurmancîaxêvên Kurd belav bibî, gotûbêja lî ser wan û hewldana jî bo yek cûre alfabe û yek cûre rastnivîsandî, tevî nebûna dezgeyên*

otorîter, yan bisporên Kurd jî, baştir e ji bêdengîyê, çunkî Kurdan berî peydabûna dezgeh, yan bisporan dest bi nivîsandina Kurdîya bi tîpên latînî kiriye û wê binivîsin jî. Bê guman dema tê nivîsandin jî wê ev problem serî hildin. Em bipên jî, problem napên.” (80)

Her çend S. Rêving tevliheviya ku heye dibine û wê rast ji bi nav dike, lê mîxabin, ji bo çareserkirina vê pîrsê, ew ne xwedîyê tu pêşniyarane. Ji dêlva ku çend gav pêş va here, pîrsên ku hene rahêje destê xwe û bi wan mijûl bibe, here kûrahiyê û li sedeman bigere, ew hîrû dimine û xwe ji bin siya ditmên R. Zilan xelas neke: “...kesên ku bi tenê tîpên î-i yên Celadet Bedirxanî diguherin û bi awayên î-ı dinivîsîn jî,...sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş: ‘Hêsantir e.’ Çima ? ‘Çunkî nêzî alfabeya Tirkî ye û piranîya Kurdan li Kurdistanê Tirkîyê dijîn.’ ”. S. Rêving rexne li gotina “piranî” yê dîgre û dibê, “... eger 12 milyon Kurd lê hebin, her 12 milyon tev de ne xwenda ne û alfabeya Tirkî nizanin, hetta bi Tirkî peyivîne jî nizanin.” . Ji meriv ştirê ku ew li hêviyê ye, gava hemû Kurd hini zîman û xwendma Tirkî bûn, dê wê gavê ewê bêje, “Başê ezbenî, em niqte û kumikê rakin, çare nîne.” Ew xwe li ser ditîna “hêsantir e” naêşîne û dibê “..eger hêsantir e ji bo Kurdên Kurdistanê Tirkîyê, lêxa divê em xî jî wek ğ ya Tirkî, û wek u ya Tirkî, u wek ü ya Tirkî, ê jî wek (é) ya ku berê dihat nivîsandin, binivîsin. Bi tenê dûvika î,i’yê girtin, înadekê bêbingeh e.”.

Lî gor çî û bi çî awayî û çîma hêsantir e? Têkiliyên ku di navbera hêsan an jî zehînetkirina xwendina zîmanê Kurdî û asimilasyonê de çine? Têkiliyên hêsanbûnê û alfabetîzebûna bi alfabeya Tirkî çme ? Heke tîkîlî hebin jî alî zanîstî va îzahên van tîkîlîyan çme? Ew serê xwe bi pîrsên weha naêşîne, raste rast ditîna R. Zilan dubare dike.

Ne tenê S Rêving, Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî jî gotîna “hêsanbûnê” wek şablonekê dîgrî û dibê: “Heke em wek alfaba Tirkî ‘î’ û ‘i’ bikar bînin wê gavê çîma em ‘ü’ û ‘u’ ya Tirkî jî nagrin ? Madem ‘î’ hêsantir e, ‘ü’ jî hêsantir e.” (Mal-

misaniy). “Ger mesele mesela hêsanîyê be wê wextê dengên ‘û-u’ ya Kurdî jî dikarin wek ‘u-ü’ ya Tirkî bên qebûlkin.” (M. Lewendî). Lî vîr, ew xwe dispêrîn teoriya R. Zilan: Teoriya Komploiyê.

Lî gor R. Zilan, yê ku tipên “î-i”-yên Celadet Bedîrxan bi şiklê tipên “i-ı” dmvisinin, ew kes ın, ku ew jî xwe ra lî “hobi” û mijûliyan dîgerin. Ew bi zımanê Kurdî dileyizin, berê vî zımani ber bi aliki berevaji va tajon. R. Zilan şîreta lî van kesan dîke û dîbê “Zıman ne mijûlî û ne jî ‘hobî’ ye. Divê jî bîr neçe, ku mafê hîç kesekî tune, ku bi zımanê Kurdî ve bilîze.” (Berbang, 1982). S. Rêving bi sergîrti be jî, vê mantiqê dîparêze. Ew dîbê, ne ku “hobi” û mijûlî divê tenê lî ser “î-i”-yê bêne kîrînê, lê hobi û mijûliyên dîr jî (“ğ”, “ü” û “é”) hene. Paşê ew jî, jî bir nake ku hîr şîretan bîke, “Divê em mesûlîyeta xwe bizanibin û bi guhertinên keyfî nebin sedemên tevîhevîyan.” (Armanc, 1992). Bî vî awayî ev pîrsa gelek cıddî, jî aliyê her duyan va jî, bî awakî jî zanistîyê dîr û gelek lî rû, tê ravekirin.

Heçî lî ser pîrsa ku çiqas Kurdên jî Kurdistanê Bakur bi Tirkî û çiqas jî wan jî bi Kurdî diaxivin, rast e statistik dî destên me de tunin, lê belê hm texmin hene. Lî gor hesabandinên M. Lewendî, ku ew jî statistikan bêtir wek texminan ın, em ber bi rewşek gelekî xerab û tari va dîçin. M. Lewendî dîbê, “Eger em gundan hesab nekin, îro lî bajaran kesên ku emrê wan dî ser 30’î re ne, bi Kurdî dizanin, lê nîşên dîr yan nizanin, yan jî zımanê wan ê yekem Tirkî ye. Yanê teqrîbî em dikarin bibêjin ku îro lî Kurdistanê ancax 3 milyon Kurd bi Kurdî qise dîke” û ew lî ser vê malxerabîyê bî vî awayî dîdomine, “Eger rewş bi vî awayî biçe, lî hember vê teknîka komunîkasyonê ku îro dewleta Tirk bi kar tîne, piştî 15-20 salan lî Kurdistanê nufûsa Kurdîaxêfan wê dakeve sed hezaran û belkî jî nemine, emê jî bibin wek ‘Ibix’an.” (81). Lî vîr divê meriv bine bira xwendevan ku, bî kêmasî 5-6 milyon Kurd, îro lî ser axa Kurdistanê najin û lî bajarên Tirkî dîminin. Pîraniya nîşî jî van Kurdên ku jî Kurdistanê dîrketine, sed heyf û mîxabin,

zımanê xwe yê zıkmaki bere bere wenda dıkın. Heke insanên me lı ser pırsa asimilasyonê, lı ser pırsên alfabeyê û xwendın û nıvisandınê bı awaki cıddi nesekının, tırsa mm ew e ku, texminên M. Lewendi yek bı yek dê rast derên. Têkiliyên dı navbera “i” ya Hawarê û asimilasyonê da, dê dı rûpelên pêş da pıçek bên vedan.

5.1.2. Tipên “é”, “ü”, “ğ” û “v”:


Em tev ji pê dızanin ku, ev panzdeh bist salên ku tu kesê Kurmancıxêv ji dêlva “x” yê va “ğ”, ji dêlva “û” yê va “ü” yan ji “u” nenıvisiye. Gava dı çapxanan da hın tip bı şaşı hatine çapkırinê ji, Kurdan lı van şaşıyan çav negirtme û pêra pêra rast kırine. Nımûneyek ji sala 1976 an: “NOT: *Tipa (ê) ya Kurdi ku dı nıvisarê Kurdi daye ji xeletiya çapxanê hınek ciyan da (ê), hınek ciyan da (é) derbaz bûye. Rastiya wi (ê) ye.*”(82). Ev nımûne ji nişan dıde ku, Kurd dı van salan da çıqas lı ser alfabeya Hawarê hesas bûne û parastine. Yên ku berê nıvisibûn ji, ewende sal dev ji nıvisandına bı vi awayi berdane. Lewra Kurd dızanin ku alfabeya Kurdi, lı gor alfabeya Tırki, alfabeya zımaneki cihê ye. Ji xwe dı nav Kurdan da iro munaqe-şeyek lı ser tipên “x”, “û” û “ê” ji tune ye.

Gelo qey S. Rêving dıxwaze hm Kurd bıla ji nû va ji dêlva x, û, u, ê yê va, ğ, u-ü, é yê bı kar binın ?. Na heke qesda wi ne ev yek be, nexwe S. Rêving çıma bı vi awayi dınvisine ?.

S. Rêving û hın kesên dın van pırsên xeyali bı zanin dıdın pêş. Ji ber, çıqas pırsa “î” ya bı kumık û “i” ya bı nıqut hatiye pêş û lı serê gotubêj hatine kırın, yên lı dij guhertinê ne, ji nexwe-dibûna bersiv û delilên maqûl, xwestine vê pırsê bıgemırinin, hın pırsên xeyali bıdıne pêş. Ev ji dıde xuyakırm ku, ew bı xwe ji bı hebûna van pırsên xeyali ne bawerm, lê mexsed tenê bı pırsên xeyali vê pırsa cıddi ji rojevê daxıstın e. Bı vi awayi şolıkırına vê pırsê, heke Kurdan iqna kırıbûya, dê ev pırs carek dın derneketa pêşberi me. Jiyan bı me dıde xuya kırın

ku, her çiqas ein vê pîrsê ji rojevê daxin an ji bincil bîkîn, dê pîştî çend salan disa derê pêşberî me. Loma ji, di gelemşê da hîştî û şolîkirîna vê pîrsê, ne tu rê ne.

Heke iro li ser wan tipên xeyalî yên ku S. Rêving ji alfabeya Tirkî tine, em bêtîr gotûbêjek hebûya ji, dîya ew gotubêj bîbûya gotûbêjêke derêca duhemîn. Ji ber ku nisbêta wan dengên, ku xwedê giravî wê bi van tipan bihatana nişankirî, li gor dengê “ı” ya Kurdî gelekî kêmtir. Heke em Mir Celadet ji xwe ra bîgeh bigrîn û li hesabandinên wî yên ji sala 1932 an bînin, ev rastî baştir diyar dibe. Nisbêta dengê “x” ya Kurdî di nav hemû dengên Kurdî da % 1.9, ya “û” ya Kurdî %2.5, ya “u” ya Kurdî % 0.7, ya “w” ya Kurdî % 2 ne. Lê belê nisbêta dengê “ı” ya Kurdî, di nav hemû dengên zîmanê Kurdî da, li gor Mir Celadet Bedîrxan % 10.2 û ya dengê “i” yê ji % 4 e. Heke Kurdan di salên destpêka 1960 î da van dengên Kurdî, bi van tipên alfabeya Tirkî (ğ, u, ü, v) nişan dabî, yekûna van hemû dengan (% 1.9 + % 2.5 + % 0.7 + % 2) dibe % 7,1 . Em dîkarî van nisbetan bi şîklê wêneyî, bi vî awayî deynî:



Îca, gava bî kêmasî ev bîst sal in ku pîrsîne weha nînin û ev deh donzdeh sal in ku lî ser dengekî Kurdi, ku nisbete wê % 10,2 ye, tevlihevi û sergêjayî heye, gelo meriv bî çî aqilî pîrsên xeyalî û pîrseke ewende ciddî wek hev kare nişan bide. Ew lî ciyekî dîbêjî, ev deh sal in ku Kurd jî sedema tipên “î”(î) -“î” (î) yê, du alfabeyên cîhê bî kar tinin; disa eynî ew, lî ciyekî dm dibêje “tenê bî dûvîka î, î’yê girtin, înadeke bêbingeh e” û ew hîn sergêjayiyên xeyalî pêşniyar dîke. Ev yek baş dide xuyakirîna ku, dî rastiyê da ew hebûna pîrsek weha înkâr dîke.

i. Kurdan kengê alfabeya C. Bedîrxan ditîne ?

S. Rêving dibê dî salên 1960 î da “ *Dibe ku hîn alfabeya Celadet nehatibû ditîn, yên dîtîbin jî hem jî ber nebûna makîne û çapxaneyên ku îşareta (^) yê binivîsînîn, hem jî jî ber ku bî Tirkî alfabetîze bûbûn û nêzî alfabeya Tirkî nivîsandin jî wan re hêsantir dihat, bêtî ku lî ser karê xwe bifikirin, weha nivîsandin.*”

Gava S. Rêving qala nivîsên salên şêst û heftîyan dîke, wek bêtî “*bêlome bû*”, ew bêtîfîreh e. Lê gava ew tê ser salên heştîyan, ew bêtîfîrîhiya wî wenda dibe. Ew weha dibê: “*Lê piştî salên 1980’î Kurdên ku alfabeya Celadet ditîne, lî Ewrûpayê bûne xwedî îmkânên makîne, weşanxane, çapxane, lê dîsa jî bî îsrarî î-dî dinivîsînîn,*..

...

...Îro hejmarî kes, weşanxane, pirtûkên ku î,î dinivîsînîn, pitir e jî yên ku î, î dinivîsînîn, lê dî xwendin û nivîsandina î, î yê de problemeke ewqas mezin ku pêwîstî guherandinê be, derneketîye pêşîya me.” (1992)

Bê şîk, piştî salên 1980 î lî Ewrûpayê geşbûn û pêşveçûna weşanên Kurdi, zêdebûna çapxane û weşanxanan, jî bo me Kurdan dîlxweşî û serfirazî ye. Ev xebatên lî dervayê welêt baş

nişan dıdın ku, gava Kurd keys û mecalan bîbinin, ew dıkarın çanda xwe, zımanê xwe bîhonin, geş bîkîn û pêşve bîbîn. Lê gava S. Rêving dîbê, Kurdan pîştî salên 1980 i alfabeya Celadet Bedîrxan ya bî “î-i” ditîne, û loma ji, hêdi tu maneyek tê da tune, ku disa ji ew, “*bi israri i-i*” ya kevn bî kar tinin, ew dî nav şaşiyekê da ye. Jî ber ku, Kurdan alfabeya Celadet Bedîrxan, pîştî salên heştêyi nedine. Wek me berê ji got, alfabeya K. Badîllî (1965) û ya Celadet Bedîrxan, jî bîlî tipekê, wek hev in. Musa Anter dî sala 1967 an da, alfabeya Celadet Bedîrxan bî kar anî. Alfabeya M. Emin Bozarslan û ya C. Bedîrxan zêde jî hev cuda ninm. Dî sala 1976 an da kitêba Dr. K. Bedîrxan - S. Şivan ‘*Zmanê Kurd, Kava Yayınları*’ derket. Dî sala 1977 an da, kitêba Dr. K. Ali Bedîrxan “*Türkçe izahlı Kürtçe Gramer, Özgürlük Yolu Yayınları*” lî welat çap bû. Heke S. Rêving alfabeyên ku dî nav van her du kitêbên paşiyê da ne, lî dervayi alfabeya C. Bedîrxan bîbine, mîxabîn ew jî rastiye gelekî dûr e.

Kurdan alfabeya Celadet Bedîrxan ne lî Ewrûpayê, lê lî welat dine. Ê herwesa ji, ew wek Mîshefa Reş an Quranê ne hebandine, her ew dî jiyanê da ceribandine, gav bî gav dî nav xelkê da belav kirine. Loma ji, gava S. Rêving ditîna alfabeya Celadet Bedîrxan bî Ewrûpayê dîde destpêkîrîn, wan tecrûbên salan û qonaxên diroki yê ku alfabeya Mir Celadet dî nav xelkê da derbas kirîye, nabîne.

Wesa dîxuyê ku S. Rêving zêdebûna hejmara kes, weşanxane û pirtûkên ku bî tipên “î-i” dînivîsîn, jî bo rastiya ditînen xwe, wek delil nişan dîde. Bê şik zêdebûneke dî wî wari da hebe, -çî bî î-i yê û çî ji bî i-i yê be, me hemû Kurdan kêfxweş dîke, lî diji asimilasyonê pîştî me qayimtir dîke. Lê dîvê meriv jî nêzik va lî vê pîrsê bînêre, ne ku wek delileke jî bo iddiayên xwe yê şaş bîde pêş û xwe bî hm tîştan qure bîke. Mîxabm, jî bîlî “*Rojnam*”ê, ku tenê yek hejmar derket, çî kitêb, çî kovar û çî ji rojnameyên Kurdi bm, hejmareke pîr kêmtên çapkirinê û yê ku wan dîkarin û dîxwinin jî, lî gor salên heftêyan kêmtir m. Çend nîmûne: Tiraja her hejmarek kovara “*Özgürlük*

Yolu” (Riya Azadi), li dor 10 000 an, ya kovara “*Rızgari*” di nav 7000-10000 an da, ya “*Roja Welat*” di navbera 7000 - 10000 an da, ya kovara “*Tirêj*”ê 4-5 hezar nusxe bûn (83). Em dîzanin ku ev kovarên salên 1970 i, bi awaki militani di nav xelkê da dihat belav-kirin û loma ji xwendin û tesira wan, ji yê li dervayi welat, -ku di nav komîkek teng da belav dibûn-, berfirehtir bû.

Nêziki sed sal berê, ji her hejmara rojnema Kurdi ya pêşin “*Kurdistan*” (1898-1902), ku li dervayi welat derdiket, 2000 nusxe ji bo Kurdistanê dihat şandin (84).

Divê em Kurd li ser vê pîrsê bi hûr û kûri bisekinin, serê xwe pê bi-êşin, çima weşanên bi Kurdi kêmnusxe tî çapkirinê û xwendevanên wan kêman. Bê şik ev pîrs, ne tenê bi pîrsa alfabeyê va, lê bi gelek pîrsên din va ji girêdayi ye.

Iddiaya ku, ew kesên ku di salên şêsti da alfabeya Celadet Bedirxan guhertin, bi Tîrki alfabetize bûbûn û nêzi alfabeya Tîrki nivisandin ji wan ra hêsanîr dihat, ne rast e. Wek me li jor da zanin, sedemê sereki yê nivisina bi alfabeya Tîrki, nenasina alfabeya Hawarê bû û piştî nasina wê ji, diwiya demek ew di jîyanê da bihata ceribandin, ka heta çi radeyê, bi awaki sivik û zelal dê di nav xelkê da ci bigirta. Pîrsa alfabetizebûyina bi Tîrki, divê meriv bi pîrsa perwerdebûyina di mektebên Tîrki da, bi pîrsa asimilasyonê va girêdayi rahêje dest û li serê raweste. Ne ku, wek sloganekê bi kar bine. Bê şik, diyar e ku iro asimilasyona li Kurdistanê, ewqas zêde û texripkar e, ku hêdi ne qabil e ku meriv bi salên şêsti ra bide ber hev. Heke iddia û qesda S. Rêving ew be, ku alfabetizebûyina bi Tîrki di salên şêsti da ewende zêde bû ku, Kurd rabûn, ji bo ji wan ra hêsanîr e, alfabeya Celadet Bedirxan guhertin û bi awayê alfabeya Tîrki nivisin; lê belê iro, şikar me xwe ji vê xeterê xelas kiriye û bi serfirazi, em bi alfabeya C. Bedirxan dinivisin, ev iddiayek ji rastiyê gelek dûr e. Li gora statistikên dewleta Tîrk bi xwe, di sala 1960 i da, xelkê herêma Diyarbekirê % 65.9, yê Sêrtê % 71.2, yê Bedlisê % 64

bı Kurdi diaxivîn (85). Dîvê bala xwendevan bê kışandin ku, ev statistik yê dewletê bı xwe ne û di gel ewqas zulm û zor-dariyê ji, disa gelê Kurd bızıviye û bı zımanê xwe serfirazbûyina xwe diyar kırıye. Helbet, dı rastiyê da ev reqem hê bılındtır in.

Lı ser pırsa asimilasyonê M. Lewendi xetera ku lı pêşiya me ye, bı vi awayi ramı me bıke: “*..wek kesekî Diyarbekirî ez bi texmînî dikarim bibêjim ku ji % 60’ê Kurdên Diyarbekirê bi Tirkî qise dikin.*” (82).

5.1.3. Pırsa “xwe nêzıkkirina elfabeya Tirkî”:

Ditınên S. Rêving yê lı ser pırsa tipên “î-i” (i-ı) yê, dı nıvisara wi ya dawı da (1993) zelaltır dıbın. Ew, tıştên rast yê ku wi dı nıvisa xwe ya sıbata 1992 an da gotıbûn ji, tekzip dıke.

Heta ji destê wi tê, ew dıxwaze elfabeya Kurdi ya latini, ji ya Tırki ya latini dûr nişan bıde, û bı vi awayi ji, karıbe izaheke ji bo parastına kumık û nıqutê peyda bıke. Lê ji ber ku ditınên Celadet Bedırxan lı ser vê meselê gelek zelal m, S. Rêving, bı navê xwe sıpartına Celadet Bedırxan, hm gotınan ji ber xwe va çêdıke û wek ku gotınên Celadet Bedırxan bm dıde pêş. Ew dibê, her çıqas Mir Celadet, ji bo ku Kurdên Kurdistana Tırkiyê bı hêsanı bıkarıbın hini elfabeya wi bıbın û xwendın û nıvisandına Kurdi ji bo wan hêsanıtır bıbe, elfabeya xwe bı zanın nêzi ya Tırki kırıbe ji, lê ev nêzıkkırm bı “*..qasî ku sîstema dengên di her du zımanan de rê daye û li gor guncîna hîmên din yê ku wî ji bo elfabeya xwe danine,..*” pêk hatiye. Paşê, lı ser ku ka bı çı awayi Mir Celadet ji bo dengên zımanê kurdi şıkl danine, weha dibê, “*..li gor fonetıkbûna elfabeyê û li gor hîmên elfabeya xwe û ji hemûyê giringtir li gor sîstema dengên zımanê Kurdi şıkil(tîp) ji dangan re dest nîşan kirine.*” (86).

Bı vi awayi, lı ser vê pırsê, S. Rêving sê tıştan nışan dıde: 1- Fonetıkbûna elfabeyê, 2- Hîmên elfabeyê, û 3- Sîstema dengên zımanê Kurdi (ku lı gor wi, ev ya heri giringtır e).

i. Teoriya “Sîstema dengan”:

Her çiqas di nîvisara xwe ya sal û niv berê da, S. Rêving li ser hinên alfabeyê (şêş destûr, an jî destûra bi şêş bendan) bi dût û dirêji sekîne ji, her çî hikmet e, ew iro wan kêr dîbine û bi navê Mir Celadet di tîştên din li wan zêde dike (fonetîkbûna alfabeyê û sîstema dengan). Û di vê kirina xwe da jî, mixabin gelek tîştan tevli hev dike. Gava em li sê prensibên ku, S. Rêving dibê jî bo bi şikil nîşankirina dengan hatine qebûlkirinê, dinêrîn, ev yek baştir dîxuyê.

Ji sê prensibên wi yê yekem, “*fonetîkbûna elfabeyê*” ye. Ew vê prensibê, jî dervayê himên alfabeyê, wek prensibeke bi serê xwe tine. Ev yek şaş e. Ji ber ku, di nav wan destûran da ku Mir Celadet jî bo alfabeya xwe bîgeh girtiye, du bend (destûrên 3 û 4) hene ku, derheqê fonetîkbûna alfabeyê da ne. Loma jî, girtina “*fonetîkbûna elfabeyê*” li dervayi destûran û pêşkêşkirina wê wek prensibekê cihê şaş e.

Ji hêla din, gava ew prensiba xwe ya sisiyan dide pêş û wê jî himên alfabeya Mir Celadet girîngtir nîşan dide, diyar nine qesda wi çiyê. Heçî gotmên “*sîstema dengên zimanê Kurdî*” ne, Celadet Bedîrxan li tu derî ev gotin bi kar neanîne. Ev gotin yê S. Rêving in û gotinên gulover û jî zanyariyê dût in. Gelo çewa dibê ku Mir Celadet alfabeyekê çêdike û jî bo danina wê jî xwe ra himan qebûl dike, lê hin tîştên ku hê jî himên wi girîngtir in jî, bi nav nake û li ser wan nasekme? Heke qesda S. Rêving jî “*sîstema dengan*”, xîsûsiyetên dengên zimanê Kurdî yê jî bo danina alfabeyê be, Mir Celadet jî wan ra dibê “*denganîya zimanê Kurdî*”, di warê zimanzanîyê (linguistic) da, jê ra “*fonetic*” tete gotm. Na, heke mexseda Rêving jî van gotinan tîşteki din be, wek, ku ka çî lebat m (organ in) û ew bi çî awayî van dengan dertinm, ev deng çewa dihişin guh û mêjiyê guhdarên Kurd, ferqên di van prosesên da li gor zimanên din çime,...û hwd, wê demê divê ew terminolojiyeke din bi kar bîne (terminolojiya anatomi, fizyoloji, fizik û ya

nevrofizyolojiyê). An na, diyar nine ka ew dibê çî. Heke em qebûl bikin ku, qesda wi “*denganiya*” zımanê Kurdi ye, wê çaxê diwiya bû ku, gava ew xwendevanên xwe li ser çêkirina şiklên (tipên) alfabeya C. Bedîrxan serwext dîke, li gor pivanên Celadet Bedîrxan biçûya.

Vêca, gelo qê di çêkirina alfabeya xwe da C. Bedîrxan xîsûsiyetên denganiya zımanê Kurdi (li gor Rêving “*sîstema dengên zımanê Kurdî*”) nedane ber çav.? Belê, dane ber çav. Em vê yekê disa jî destûrên wi yên ku himê alfabeya wi li serê hatme avakirinê, fêhm dikin. Ew di destûra xwe ya yekê da, bala me dîkşine ser hın nîqutên ku “*xasê denganiya zımanê kurdî ne,*” û jî dervayî wan, ew alfabeya xwe nêzi ya Tırki dîke. Ew di destûra çaran da, li ser têkiliyên ku di navbera denganiyê û alfabeke fonetîk da hene, radweste û weha dibê, “*Ev awa ji fikra çêkirina elfabekê bi hindik herfan an ji qesda qenc lisersekinandina denganiyê dikare bizê....*

Ji xwe di tu zımanî de dengani û nivîsandin ne lêvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zımanî bê. Lewre ko kitkit û rengên denganiyê bi elfabeyê nayên nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin.” . Mir Celadet di destûra şeşan da diyar dîke ku, paş “*Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di zımanî kurdî de dengên bîngehî ev sîh û yek deng in.*” .

Jî van gotmên wi jî baş dîxuyê ku Mir Celadet di nav destûrên xwe da, denganiya zımanê Kurdi dîde ber çavan. Loma jî, ditîna S. Rêving bî du awayî şaş e; Him jî ber ku ew “*sîstema dengên Zımanê Kurdî*” li dervayê himên (destûrên) alfabeya C. Bedîrxan nîşan dîde û jî wan girîngtir dibîne, şaş e; û him jî, bikaranîna van gotinan, di warê terminolojiyê da şaş e.

Bî kurtî em digijî vî encamê ku, herwek Mir Celadet bî xwe jî dibêje, ewî danîna himên alfabeya xwe di wan şeş destûran da cıvandiye, ku denganiya zımanê Kurdi û alfabeke fonetîkî jî di nav wan da ye.

Çewa berê jî hat gotin, S. Rêving her di nav hewildanekê da

dêlva ku bî awayên zanîstî lî meselê bînêre, ew xwe jî hissên xwe xelas nake. Jî wî ştirê, nêzîkbûna alfabeyên Kurdi û Tirkî, tê wê manê ku ev her du zîman nêzîkî hev in. Gava ew, beşek jî nivîsandina Ç. Bedîrxan dîgre, ew bî xwe nîkare, pêra pêra îzahekê pêva dîzelîqîne: “ ‘...Ji aliyê şîkil 17 tîp di elfabeya her zîmanî de bi ferqîne kîçîk yek in: *b d f g h k l m n p r s t v w y z*’ (Hawar, hej. 2. rûp. 7) *Anku ev tîpên he ne yên elfabeya Tirkî, lê yên latînî ne.*”(Rêving). Dî navbera nivîsandina Ç. Bedîrxan ya eslî û ya ku S. Rêving hilaniye jor, bêyî ku mane bê guhertin, piçek ferq heye.. Eslê wê bî vî awayî ye: “*..ji sih û yek dengdarên kurdî, dengên hevdehên jêrîn, di elfabeya her zîmanî de, bi ferqên kîçîk, yek in. b d g h k l m n p r s t f v w y z*”(87).

Wek dîxuyê, Ç. Bedîrxan nabêje ku, ew alfabeya Tirkî dî nav wan alfabeyên ku tîpên latînî bî kar tinin, naheşîbine. Bê şîk, ev tîpên ha, çiqas yên alfabeyên Kurdi, Îngilîzî û zîmanên din bin, ewqas jî yên alfabeya zîmanê Tirkî ya latînî ne (Jî xweynî tipa “w” ku dî alfabeya Tirkî da nîne). Jî xwe gava em lî destûra yekê ya Ç. Bedîrxan dînerin ev yek hê zelaltir dibe. Ew dibê:

“1- *Ji wan niqtan pêve ko xasê denganiya zîmanê kurdî ne, di şîkil û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nîzing xistin û jê ne dûrketin...*” . Îca divê meriv piçeki lî vir bisekme û jî S. Rêving bîpîrse. Jî bîlî tipa “w”, gelo jî wan hevdeh herfan kîjan xasê denganiya zîmanê Kurdi ne, ku ew dîxwaze jî alfabeya Tirkî dûr bike. Gelo dî navbera cîhderka dengên “b”, “d”, “g”,....hwd yên Kurdi û Tirkî da çî ferq hene, ku S. Rêving dîxwaze dî navbera tîpên mîqabîlê van dengên yên her du zîmanan da, diwarekî lêke.

5.1.4. Disan pîrsa kumîk û nîqutê:

Gava S. Rêving lî sedemên ku çîma Mir Celadet tîpên “c”, “ç” û “ş” jî alfabeya Tirkan girtiye û xistiye nav alfabeya xwe dîgre, ew dîghîje wê encamê ku “ *Lî gor sîstema dengan*”,

dengên ku cihderka wan yek in, dirêjbûn û kimbûna wan bi qasi hev in, Mir Celadet bi tipên alfabeya Tirkî nişan kirine. Lê belê her çiqas cihderka wan wek hev bin jî, gava di dirêji û kimbûna wan de ferq hebin, ewi bi tipeke jî alfabeya Tirkî cihê ew deng nişan kirine. Bi vî awayî S. Rêving tê ser mexseda xwe ya rasti ya ku, ewi ev teoriya “*Sîstema deng*” jî bo çî afirandiye. S. Rêving dibê “*Lê di mesela -î- û -i-yê de ne weha ye. Ji aliyê deng ve tevî ku cihderka wan yek e jî lê î ya Kurdî dirêjtir e ji ya Tirkî. Di navbera î ya Kurdî û î ya Tirkî de ferqeke mezintir heye. Ne eynî deng in, cihderka wan ne yek e.*” (1993).

Jî bo zelaliyê, bi kurti em ditma wi dubare bikin: S. Rêving dibê, her çiqas cihderka “î” ya Kurdî û ya Tirkî yek bin jî, lê jî ber ku dengê “î” ya Kurdî jî ya Tirkî dirêjtir e, ew bi tipeke cihê hatiye nişankirin. Ferqa di navbera “î” ya Tirkî û “î”(1) ya Kurdî de hê zêdetir e. Jî ber ku cihderka dengên van tipan di Tirkî û Kurdî de ne yek m.

Di eslê xwe da ev ditin ne ditina S. Rêving e, lê ya R. Zilan e. Hê di sala 1982 an de, R. Zilan ev iddiaya xwe jî bo parastina kumikê wek delilek dîda pêş. Ewi digot: “*...hem -î- û hem -i- ya Kurdî ne wek -i- û -i-ya Tirkî ne. Ji aliyê fonetîki de ferqeke pir mezin di navbera wan de hene. Heçî -i-ya Tirkî ye, li gor ya Kurdî, kurt e.*” û ev yek jî bo ditmên R. Zilan dibû bingeha kumika li ser “î” yê. Jî ber ku, berê bi dûr û dirêji li ser ditinên R. Zilan hatiye sekınandin û her wesa, jî qelema mir Celadet bi xwe jî, sedemên kumika li ser “î” yê û nîquta li ser “î” yê hatine serwext kirin, li vir hêdi hewce nine ku, em van gotman dubare bikin. Lê divê bê gotin ku, gava S. Rêving sedemên kumik (bîlîndek) û nîqutê jî nîvisara Mir Celadet neqili nîvisara xwe ya nû dike, ew di ser ciyê heri giring ra qebaz dide, û her wesa ciyê ku di nîvisara Mir Celadet da ne tiştê sereki ye, di warê giringiyê da yê dereca dîduyan e, ew bi herfên qelew û reşkirî dide pêş. Bi vî awayî, ew dixwaze bide nişandan ku, jî ber xîsûsiyetên dengên her du zımanan jî hev cihê ne, loma jî C. Bedîrxan “î” ya bînîqut(1) bi kar ne aniyê.

Û bî vi awayî S. Rêving jî hîn ditinên Mir Celadet, xwe dighijîne van encamên li jor: Ango, jî ber ku dengê “î” ya Kurdi jî ya Tirkî dirêjtir e û jî ber ku cihderka dengê “î” ya Kurdi û ya Tirkî ne yek in, Mir Celadet tipên jî bo van dangan, jî yên alfabeya Tirkî bî cihê nivisiye. Ewî nîquta li ser “î” ya adeti rakirîye û jî dêlva wê va kumîkek daniye serê û her wesa “î” ya adeti jî, jî bo nişankirina dengê “î” ya Kurdi bî kar aniye.

S. Rêving li ser vê pîrsê, di nîvisara xwe ya sala 1992 an da jî ditinên Mir Celadet hm encamên din derdixist û tiştên maqûl digot. Piştî ku ewî jî nêzik va li ditinên C Bedirxan dinêri, weha digot: “...*eger Celadet Bedirxanî niqteyek nedanîba ser î yê û wek î bihişt, wê Kurdan ev herf. wek î ya alfabeya Tirkî bixwendana? Na. Ji ber ku em qala du zimanên cuda, û du alfabe-yên ku li gor dengên wan zimanan hatine çêkirin, dikin. Dirêjtir, yan kintirbûna î ya Kurdî jî ya Tirkî di vî warî de hîç rolekê nalîze. Çunkî yên ku deng dide îşaretan em in. Neku jî bo her dengêkî dengdar, yan bêdeng îşaretek standard heye û her mîlet wan bi kar tînin...*”, “...*Sedemên ku Celadet Bedirxan mecbûrî bikaranîna (^) bilindekê dikin, ne dirêjbûna î, ê, û yê ye...*

...Eger armanca Celadet Bedirxan bi danîna şiklê î jî bo dengê î ve-qetandina î-ya Kurdî jî i-ya Tirkî bûya, wê ev nîşan danîba ser a-ya Kurdî jî, çunkî a-ya Kurdî dirêjtir e jî ya Tirkî, lê wek şikil her du jî eynî ne û ev nayê wê manê ku dema em a-ya Kurdî dixwînin, yan dibêjin, jî ber ku bilindek li ser tune ye, em wê qasî a-ya Tirkan kin dixwînin.” (88)

Diyar e ku ew bî nîvisara xwe ya nû, van xetên xwe yên li jor tekzip dike.

5.1.5. Hêviyên bilind, rastiya tehl û asimilasyon:

Di dawiya nîvisara xwe da, S Rêving dibê: “*Eger problem bi tenê î û î ye, ger heta cihekî hêsanbûneke kêr bi xwe re bîne jî*

(Diyar e ku, bî şermoki be ji, ew carna vê rastiyê dibine-CÇ), *ne peyvîst e bên guhertin. Ji ber ku kîjan çareya siyasî ji gelşa Kurd a li Kurdistanê Tirkî re bê dîtin jî- çi mafên kulturî, ziman û serxwebûna îdarî, çi otonomî, çi federasyon û çi jî serbixwebûna kamîl- wê li Kurdistanê zimanê Kurdî bibe zimanê resmî, zarok wê di xwendin-xaneyên destpêkî û yên pê re bi tenê bi Kurdî bixwînin û binivîsin, zimanê weşan çapemeniyê bi yekcarî bibe Kurdî û bêguman bere bere wê zimanê xwendina bilind jî bibe Kurdî, wekî ku îro li Kurdistana başûr bi cih bûye. Wê nîşîne nû rabibin ku bi tenê Kurdî hîn bibin û zimanê Tirkî jî wek her zimanekî xerîb, hîn bibin.*" (1993).

Dî sibata 1992 an da, ewi dîgot ku kes nîkare tarîxa damezrandina dezgehên xwedî otorîte û zanîstî bide destê Kurdan û loma jî em nîkarm pîrsên alfabe û rastnivisandinê li hêviya dezgehên weha bîhêlin. Dîvê ev pîrs bêne munaqêşekirin û jî bo pêkanîna yek cure alfabe û rastnivisandinê hewl bêne dayin. Lê wesa dixuyê ku, ewi dev jî vê ditîna xwe jî berdaye. Ewi, qaşo nedixwest van pîrsan li hêviya tarîxa damezrandina dezgehên xwedî otorîte bîhişt, lê niha ew rabûye van pîrsan li hêviya çareserkirina siyasî ya pîrsa Kurd û Kurdistanê dîhêle (!?).

Ji hêla din, ew gelek li rû li mesela pîrsên alfabeyê û yên asimilasyonê dînê. Her çiqas ew bî dilek paqîj dibê, wexta mesela siyasî -bî çî awayî dibê bîla bibe-, çareser bibe, û ev yek jî wê zimanê Kurdî jî nuh va vejîne, Kurdî dê bibe zimanê resmî...hwd, lê mîxabm ev proses, bî qasî ku ew dîde nîşandan, basît û hêsan nîne. Heçî dewleta Tirk e, ev heftê sal in ku ewê rasterast qîrkîrîna ziman û çanda Kurdî daye ber xwe. Mîxabm, heta cîkî jî, ew bî ser ketîye. Lewra ewê ne tenê Kurdistanê dagîrtîye û îlhaq kîrîye, lê ya herî xerabtîr, tovê asimilasyonê dî mêjiyê Kurdan da rêşandîye, jî nûva şîklek daye mêjiyê insanên me. Dewlata Tirk, bî sedhezaran Kurd dane bawerkîrm ku, ne çand û ne jî zimanê Kurdî bî kêrî tu tiştêkî nayê. Hîn siyasethavên Kurd jî, bêyî haya wan jî wan hebe, dî bîn tesîra van ditînan dewletê da ne, û zimanê Kurdî

wek zımaneki stewr û ji bo siyasetê bikêrnehati dibinin.

Ev texribat mîxabm di her warê jiyanê da bi ci bûne. Kurd ne bi xwe, ne bi çanda xwe û ne ji bi zımanê xwe bawer in. Li Kurdistanê, ji bo insanê Kurd karibe kareki peyda bike, wek insaneki muamele bibine, şertê pêşin hinbûna Tirkî ye.

Îca di rewşek weha da, gava hemû dezgehên dewleta Tirk yê idari, dadgehi, perwerdeyi, siyasi, eskeri,...hwd, ku li ser tecrubên şêşed salên tenzîmkirina dewleta Osmani hatme avakirinê, ji piya bin û karbidestên Tirk bêjin, "*Fermo, ha ji wera mafê kultûrî, zıman û xwe idarekirinê !*", dê çi şansê zıman û çanda Kurdi hebe ji bo ku karibe bijî. Ev yek, dişiwe rewşa du kesên ku, wê bi hevra bikevin musabeqeyê mayin û nemayinê. Yek ji wan êlekê polayin li xwe kirîye ji bo ku gule di canê wi re neçin, çekên heri nûjen dane ser milê xwe, bi salan xwarina bi qewet xwariye û xwe talim kirîye, nexweşxana wi li ber destê wi ye,- ku gava birindar bibe, pêra pêra birinên wi bîne derman kirin û pêçandin-. Li aliyê dm, kesekî tazi ipela, gopalek derîzi di destê wi da, bi salan xela diti, qels û qa-riç, ne xwedî derman û nexweşxane. Qaziyê (hakimê) vê musabeqeyê ji, xwediyê nexweşxane, êlekê ji pola, çekên nûjen e û bi ser da ji, pismamê wi kesê pêşiyê ye. Û tê gotin ku, ev her du kesên ku wê bikevin vê musabeqeyê, azad û wek hev in. Baş e, şansê rebenê bê xwedî û bê muesece di vê musabeqeyê da çiqas heye ?. Netica vê musabeqeyê, hê di destpêkê da qê ne diyar e ? Mîxabîn, em yê bê xweyi, tazi û birçî ne.

Heke dewleta Tirk hêdi hêdi dev ji siyaseta xwe ya qirkirina çand û zımanê Kurdi berde û hin tavizan bide, ev tê wê manê ku, dewleta Tirk siyasetê diguhêre, lê her armanca wê ya ji bo windakirina çand û zımanê Kurdi dîmine. Ji dêlva ku, wek berê dîkir, bi qirika Kurdan bigrê an ji destê xwe deyne ser devê wan û wan bifetisîne, ew dê bi dezgeh û tenzîma civata xwe, rê bide ku her xwin ji wan birinên ku di çand û zımanê Kurdi da vebûne, biherike, heta ku rojekê hêdi ew laş zîwa û

hişk dibe û bî xwe dimre. Ev siyaset, siyaseteki nû nine. Lî gelek ciyên dinyayê bî ser ketiye. Loma jî, heta ku Kurd bî xwe nebîn xweyê mala xwe, tu garantiyek jî bo parastma çand û zîmanê Kurdi tune. Bîla S. Rêving lî ser vê pîrsê piçekî bîfikirê: Dî şertên iro da, ku dewleta Tirk bêje: "*Kurd dîkarin mektebên xwe vekin*", gelo lî ciki wek Diyarbekirê, dê sedî çendê Kurdan zarokên xwe bîşînin van mekteban ?

Heçî rewşa Kurdistanê Başûr e, dî vî wari da dî navbera me û wan da hî fêrgehê mezî hene. Çî demên dirêj û çî jî yê kurt bî, jî salên 1930 î û bî vîr da, her çiqas keys bî dest ketiye, Kurdan dî mekteban da bî Kurdi xwendîne. Dî nav van pêncî salên vê dawiyê da, em û ew dî eynî prosesê ra derbas nebûne. Jî xwe kesî hebûn û huwiyeta wan tucar red nekiriye. Yê xwestîbe red bike jî, ne bî ser ketiye û ne jî kesî zêde guhê xwe dayê.

Ev pîrs, pîrseke hîm girîng û hîm jî fireh e. Jî ber ku, ez naxwazim babeta ku em pê mijûhn, bela-wela bike û hecma vê xebatê bî hîm pîrsên dm hê firehtir bike, ez gotmên xwe lî vîr dibîrim.

5.2. DÎTINÊN MALMÎSANIJ û M. LEWENDÎ

Lı ser daxwaza Enstituya Kurdi ya Stenbolê, Malmisaniy û Mahmûd Lewendi derheqê alfabeya Kurdi ya latini da, ditinên xwe, her yek bi nameyekê jî berpirsiyarê Enstituyê ra şandin. Ev name vê paşiyê di kovara “Wan” da, li Swêdê hatin weşandin (89). Ji van her du nameyan wesa dixuyê ku, li ser pirsên alfabeya Kurdi ya latini, ditmên her du niviskarên me, kê m zêde weki hev m.

Herçend M. Lewendi li ser pîrsa ku, “*du babet dengên ‘P, K, Ç, T’ hene*” jî dîsekme, lê diyar nine, ka gelo ev pîrs ji bo wi û herwesa ji bo hin Kurdên din, pîrseke çiqas girîng e. Derheqê vê pîrsê, ditina Malmisaniy zelaltir e. Ew dibê: “*..hin kes behsa du tewir P, K, Ç, T jî dikin lê bi a min ev deng zêde problem dernaxin...*”. Em ê paşê vegerin ser vê pîrsê û piçekî jî nêzik va lê binêrin.

Lı gor Malmisaniy, û her wesa li gor M. Lewendi - her çend ewi, bi tesnîfî diyar nekiribe jî, lê di tevayîya nivîsara wi da baş dixuyê-, du problemên girîng yê alfabeya kurdi ya latini hene:

1- Problema “ı, i” û “î, î”.

2- Problema kêmbûna hin herfan; wek “ ‘E’ ya di navê “ ‘Eli’ da (‘eyna erebi), wek “ ‘h’ ” ya di navê “ ‘H’esen” da, wek “ ‘x’ ” ya di gotina “ ‘ax’ a” da.

5.2.1. Pîrsa “î-i” û ”i-i”-yê:

Derheqê sergêjayiya “î-i”(i-i) yê da, ditînên her du nivîskarên me wek hev in. Her du ji dibên, bîla dî alfabeya Kurdi ya latîni da, ku-mîka lî ser “î” yê û nîquta lî ser “i” yê, her wek ku dî Hawarê da hatiye danîn, bîmine. Jî bo vê ditîna xwe, her du ji tu delilên zanîstî yê dî warên zîmanzanî, pedagojî, psikolojî,...hwd da naynîn. Delilên wan, bêtir jî hm tecrûbên pratîkî tîn pê. Meriv dikare hemû delilên wan, bî kurtî dî yek hevokê (cumlê) da bicivîne: **Heta iro bî vî awayî hatiye nivîsandîn, bîla jî iro û bî şûn da jî bî vî awayî be.** Ev ditîn, bî awayên cîhê cîhê bîn jî, dî hemû delilên jî bo parastîna “î” û “i” yê yê Malmîsanîj û M. Lewendî da, her diyar e. Çend nîmûne:

a- Malmîsanîj dibê: *“Elfabeya Kurdî bi xwe bi vî hawî (î û î) hatiye danîn û bi awakî giştî heta iro bi vî hawî hatîye.”* Evê ditînê, M. Lewendî jî bî vî awayî tîne zîman: jî derketma Hawarê *“...heta iro (ger em alfaba latînî ya Tewfîq Wehbî û ya Kurdên Erîvanê hesab nekin) Kurdîya Latînî bi wê alfabê tê nivîsîn.”*

b- Malmîsanîj dibê: *“Heta iro li Tirkîyê, Surîyê û Awrûpayê bi vî alfabeyê bi sedan kitêb, kovar û rojname derketine. Ev mîras jî ber ku jî berhemên pêşîn pêk hatîye hêja ye. Eger em lî bikin I, î jî bikin i em jî xwendevanên van kitêb û kovaran re zehmetî derdixin.”* M. Lewendî vê ditînê firehtir datîne û dibê: *“...nêzî 300 kovar û rojname bi Kurdîya latînî derketine yan jî di nav rûpelên xwe de cih dane nivîsên bi Kurdî yê bi alfaba latînî. Dîsa jî roja ewilî heta iro nêzî 300-350 kitêbên ku bi alfaba Kurdîya latînî hatine nivîsîn derketine. Û jî % 98’ê van berheman hemû bi alfaba Hawarê hatine nivîsîn...”* (90).

c- Malmîsanîj dibê: *“Nivîskarên rojnameya Azadî, kovara Deng û hevalên ku wekî wan dinivîsin ne tê de, iro li welêt û li derve bi sedan nivîskar bi vî hawî dinivîsin. Di nav vana de*

kesên wek M. Emîn Bozarşan, Reşo Zîlan, Rojen Barnas hene ku ji salên 1960 û 1970 heta îro li ser Kurdî xebitîne, bi Kurdî nivîsîne. Iro him li welêt û li Tirkîyê him jî li derve piranîya nivîskarên Kurd, piraniya weşanxaneyên Kurdî, piranîya weşanên perîyodîk ên Kurdî bi i û î dinivîsin, çima jî nişkê ve ev pirani herfên xwe biguherîne, bike î ê î ?” (91). M. Lewendi dibê, jî xwe heta iro jî Kurdên “Kurdîstana Sûrîyê û Iraq û Iranê” ra, problemeke bi vi awayi derneketiye.

Lî gor M. Lewendi, bi pêşengiya jî bo destpêkirina munaqeseyên lê ser pirsên alfabeya Kurdi ya latini, Enstituya Kurdi ya Stenbolê gawek baş avêtiye. Lê ew dibê, divê di bîryarstendinê da, neyê lezandin.

Malmisaniy jî, li ser ditînên kesên ku dibê, divê tipên “i” û “î” jî dêlva yên “î” û “i” yê va bîn bi kar aninê, weha dibê: “..gelek caran dibêjin ‘Herfên î û i ji Kurdên Kurdistanê Bakur re hêsantir in’ û ez dizanim di vê gotinê de rastîyek heye.” . Her çiqas ew jî qebûl dike ku, bikaranîna tipên “i” û “î” jî bo Kurdên Kurdistanê Bakur, di xwendinê da hêsantir e, lê belê jî ber sedemên li jor, ew bikaranîna “î” û “i” yê baştir dibîne.

Heçî ditînên ku alfabeya Kurdi heta iro bi awayê ku hatiye danîn maye û hatiye nivisandin, û çend nîvîskar, weşanxane û meyleke siyasi ne tê da, heta iro piraniya Kurdan bi tipên “î” û “i” nivîsîne, ditînên jî rastîyê dûr m. Wek me berê jî dit, Kurdên Kurdistanê Bakur, jî destpêka salên 1960 i û bi şûn da, bi alfabeya Hawarê hîsiyane û ev alfabe di jiyanê da ceribandme. Bi derketina kîtêba Kemal Badîllî di sala 1965 an da, di nav Kurdan da li ser pîrsa tipên alfabeya Kurdi, lihevkuştin (consensus) bere bere zelal dibe. Jî wan salan heta sala 1980 i, bi tevayî li Kurdistanê Tirkîyê çî tişt hatibûn nivisandin, bi tipên “î” û “i”(î) hatine nivisandin. Carek li ser tipa “î” yê ne kesi gotûbêjek li dar xistiye û ne jî, di vi wari da tu tevlihevi derketine. Kêm nîvîskaran, wek nîmûne M. Emin

Bozarslan, lı gor alfabeya dı kîtêba K. Badıllı da hati danin, heta sala 1980 i ji, dengê “i” ya Kurdi bı tipa “î” dınvısand. Malmısanij û Rojen Barnas ji dı nav da, jı sedı notı bêtır Kurdan dı nıvisarên xwe da tipên “i-ı” bı kar anine. Malmısanij jı hêlekê va dıbê, bıkaranına “i” û “ı” jı bo Kurdên Kurdistana Bakur dıbe “*piçek hêsantir bin*” û jı hêla dın jı dıbê, heke ein “i” bıkın “ı” û “î” jı bıkın “i”, dê jı bo xwendevanên kîtêb û kovarên ku heta iro hatine çapkirinê, hın zehmeti derkevın. Lı vır dıvê merıv du pırsan jı Malmısanij bıke: Gava ku ewi bı tipên “i” û “ı” dı kovara Tirêjê da û dı hın kovarên dın de dınvısand, gelo çend xwendevanan jı wı gazınd dıkırin, ku ew dı xwendına “i” û “ı” yê da zehıneti dıkışın ? Pırsa dın jı ev e û her wesa ev pırs jı bo M. Lewendi ye ji: Heke hûn dı wê baweriyê dane ku bı “i” û “ı” yê nıvisandın jı bo xwendevanên Kurd hın zehınetiyan dertının, çıma hê jı hûn dı hın kovaran da bı tipên “i” û “ı” nıvisarên xwe dıdm weşandın ? Bo nımûne, lı nıvisarên M. Lewendi û yên Malmısanij yên ku dı kovara “*Azadi*” û ya “*Rojname*” da derketine bıne.

Lı vır ein ê xwe bıspêrın sebra xwendevan û hın dıtınên xwe dubare bıkın: Jı inêj va bû ku Kurdên lı dervayi welat, xasme jı yên lı Ewrûpayê bûbûn mıhacı, bı tipên “î” û “i” dınvısandın. Pışti ku dı sala 1980 i da lı Tırkiyê derba eskeri çêbû, Kurdên sıyasi mecbûr man berê xwe dan riya mıhacıriyê û bırek mezın jı wan hatın welatên Ewrûpi. Bı vi awayi cara pêşın dı navbera du tecrûbên cıhê da, dubendi derketın. Kesên ku bı salan lı Ewrûpayê mabûn û jı tecrûbe û cerıbandınên welat dûrbûn, nıvisandına bı tipên “i” û “ı” şaşıyek gelek mezın dıdıtın. Ewan wek Quran, an jı wek Mıshefa Reş lı Hawarê dınhêrtın û her çı tıştê ku ne lı gor Hawarê bûya, wek gunehkariyekê dıdan nişandan. Herçend rexneyên gelek cıddi lı vê dıtınê hatın gırtın jı, lê pışti ku vê dıtınê Enstituya Kurdi ya Parisê jı qe-bûl û beyan kıır, bere bere Kurdên ku bı awayê welêt dınvısandın, dan ser şopa ku lı mıhacıriyê lı dar ketıbû û dest pê kırin bı awayê ekola dervayê welat bınvısin..

Piraniya kesên ku dan ser vê şopê, di dîlên xwe da iqna nin bûn. Loma ji, ewan carna bi tipên “î” û “ı” û carna ji bi tipên “î” û “i” nîvisin û hê ji dînvîsin. Bêyi ku pê bawerbin, bi taybeti ji pîştî biryara Enstituya Kurdî ya Parisê, piraniya weşan û kesên ku berê bê nîqut (ı) û bê kumîk (i) dînvîsandin, bi mantiqa “*waye Enstituyê ji biryar girtiye û pirani hêdi bi vi awayi dînvîsinm. Nabe ku em hêdi pê bîkutî erdê. Wê xelk rexnan li me bigre û me bi bêberpîrsiyari û serhişkiyê itham bike*”. Îro ji, di sohbetên şexsi da hin ji van berpîrsiyaran dibêin: “*Heyra baş e, bila hemû kovar û weşanxanên Kurdan bi awayê bê kumîk û bê nîqut bînvîsin, soz em ê ji biguhêrin. Em ne li dîji guhertî ne. Lê, me carek guhertî û em naxwazîn di şa tenê bi serê xwe vegerî ser awayê berê. Ma qê tu pê nîzani, xelk ji xwe li manîyan ne û wê di şa dûvîkan bi me va bîkî.*”

Îca gava rasti bi vi awayi be, gotînen “ji ber pirani bi vi awayi dînvîsinm, ev awa rast e”, ji zanyari û tarîxê dûr in. Lewra di salên 1970 î de pirani bi tipên “î” û “ı” dînvîsandin. Heke ev mantiq mantiqê helkîrîna hin pîrsan bûya, di viya Mir Celadet Bedîrxan alfabeya Kurdî ya bi tipên erebi neguhertî bûya, lewra ew alfabe, ne bi deh salan lê bi sedan sal ji alî Kurdan va hatîbû bi kar anîn. Ji alî din va, ji dêlva “î” û “i” ya Hawarê, bîkaranîna tipên “î” û “ı” nayê wê manê ku, meriv dev ji alfabeya Mir Celadet berdide. Ber’eksê wê, bi ditîna min, pîştî tecrubên li welêt, meriv vê alfabayê hê tekûztir dike û dike malê xelkê Kurd.

Rast e, ji bo Kurdên Kurdîstana Îraq û Îranê û her wesa ji bo Kurdên Sûriyê, pîrsa “î” ya bi kumîk û “i” ya bi nîqut zêde sergêjayîyan dernayne. Lê divê em ji bir nekî ku, heçî Kurdên Kurdîstana Îraq û Îranê ne, ji sedî yekê nîvisên xwe bi tipên latîni nanvîsin û her wesa piraniya wan ji, nîzanî nîvisandînen Kurdî yê, -çî bi alfabeya Hawarê û çî ji alfabaya bi “i-ı” hatîne nîvisandîne-, bîxwînin. Kêm kesên ku xwe hîni alfabeya Kurdî ya latîni kîrîne ji, beriya ku hîni tipên latîni yê alfabeya Kurdî bîbin, ew zîmanekî Ewrûpi, û bêtir ji

Îngilizi hin bûne. Lê belê, di alfabeyên zîmanên Ewrûpi da tipa “i” mîqabilê dengê “i” yê ye. Loma ji, Kurdên Kurdîstana Îraq û Îranê ji, tê nagihîjin ku çima tipa “i” ya di alfabeya Kurdi ya Hawarê da ye, wek “i” ya adeti ya alfabeya latini nine, lê mîqabilê dengê “i” ya Kurdi ye. Çewa me berê ji nivîsi, hê di sala 1974 an da, zîmanzanê kurd Cemal Nebez, ku xelkê Kurdîstana Îraqê ye, pêşniyar dîkir ku, ji dêlva tipên Hawarê “i” û “î” yê va, tipên “ı” û “i” bîn bîkaraninê. Û ewi dîgot, bî vi awayi nivîsandin wê xwendina Kurdi sîvîktir û rewantir bibe.

Ji hêla din va, ha bî kumîk ha ji bê kumîk hatibe nivîsandin, ji bo Kurdên Sûriyê di xwendmê da zêde tevliheviyek dernayê. Wek M. Lewendi ji dibê, “*tu têkilîyeke wan û Tirkî bî hev tune..*” . Ango, ew bî salan di mektebên Tirkî da naxwinin. Min bî xwe heta iro tu Kurdekî ji Kurdên Sûriyê nediye ku gotiye, xwendina ew kovar û kitêbên ku bî tipên “i” û “ı” hatine nivîsandin, ji bo wi sergêjayî deranîne.

Wek me berê ji dit, ji xwe Mir Celadet alfabeya xwe nemaze ji bo Kurdên Kurdîstana Bakur daniye û loma ji ewi xwestiye vê alfabeyê heta ku ji dest bê, nêzîkî ya Tirkî bibe.

5.2.2. Pîrsa dengên “hışk” yên P, K, Ç, T û R-ya stûr:

Evê pîrsê hê di destpêka damezrandina alfabeya Kurdi ya latini da, rû dabû. Wek me berê ji got, li ser alfabeya Mir Celadet, rexneyên herî mezîn yên Osman Sebri bûn. Li gor wi, zaravayê Kurmancî bî dengên ç, p, k, t yên hışk dagirti ye. Lewra ji, diviyabû ku di alfabeya Kurdi ya latini da, ev deng bî tipên serbixwe bîhatana nişankirin. Mir Celadet ji ber du sedeman, van dengan bî tipên taybetî nişan nekiriye:

- 1- Ewi ev deng, nêzîkî dengên ç, p, k, t yên adeti ditîne.
- 2- Pêşî, pîştî sehêtikîrma li ser sê zaravên Kurdi, ewi sîh û yek dengên bîngêhin ji bo alfabeya xwe esas girtiye û ji bîlî tipên ji bo van dengan, nexwestiye hejmara tipên alfabeya Kurdi ya

latini bî hm deng û rengên dengan zêde bîke. Jixwe, lî gor wi
“...hemî elîfbêyên Awropî di navbera 29-31 tîpan da ne...”

Bî qasi ku ez pê dîzanîm, jî rehmetî Apê Osman Sebri pê va,
kesekî dm dî van si çîl salên vê dawiyê da, bî îsrarî dawê
nekirîye ku, divê jî bo van dengan hm tip bîn peyde kirinê.
Herçend Kemal Badîllî lî ser van dengan dîsekme û dibê divê
jî bo wan hîn tip bîn nişankirinê, lê ew lî ser vê hewcedariyê
îsrar nake û çareserkirina vê pîrsê jî bo pêşerojê dihêle.

Herwekî me bî hinceta hm meselên dîn jî çend caran behs
kırîbû; dî sala 1983 an da, bî pêşengiya Enstituya Kurdi ya
Parisê, pîsporên kurmancî cîvînek çêkırîm. Dî vê cîvînê da,
ewan lî ferhenga Qanadê Kurdo ya ku jî 34 000 gotinan
pêkhata ye, nihêrtm û lî ser nisbeta van dengan xebîtin. Lî gor
encama vê xebatê, dî nêzîkî 40-50 gotinên kurdi da (zaravayê
kurmancî) “ç” ya “hîşk” (pîsporên me jî vî dengî ra dibê “ç”
ya kerr”) heye. Ê her wesa “gotinên ku bi ç yê cihê tîn
bilêvkirin û wekihev tîn nivîsîn jî dehi kêmtir in û talûka tevli-
hevîbûna wan nîne.” . Çend nîmûnên jî vê xebatê:

Çar : jîmara 4	Ç’ar: xêlî
Ço ! (Dî ajotma kerê da)	Ç’o: dar

Dî fonetika Kurdi da, lî gor pîsporên Kurmancî, “k” ya kerr
(hîşk) dî nêzîkî 70-80 rayên (qırnên) bêjeyan da dîxuyê. Çend
nîmûne:

Ker: heywanek	K’er: kesê nabîhîze
Kew: kewandm	K’ew: K’ewa gozel
Kêm: edaba bîrîna kulbûyî	Kêm: hîndîk

Disa lî gor pîsoran, dî zîmanê me da gotinên bî “p” ya kerr
(hîşk), gelek kê m in û hejîmara wan nagîje dehan. Çend
nîmûne:

Par: beş, para mm	p’ar: sala çûyî
pir: 1-pergal, edeb	p’ir: jîma extîyar

Nisbeta “t” ya kerr ji, di zîmanê kurdi da gelek kê m e. Çend nîmûne:

ta: heta ta: ta girtm ta: dezi

Dî vê cîvîna pîsporîna da, her wesa lî ser pîrsa “r” ya stûr jî hatiye sekînanîn. Lî gor vê xebatê, “*Hejmara gotinên ku r ya zirav bi kar tînin bi çend sedan e...*” Û bî qasî ku dixuyê “*gotinên r yê cihê tî bilêv kirinê lê wekîhev tî nivîsîn û di karin di tîgihîştinê de şolî tî bidin peyda kirin...*” jî dehi kêmtir in. Lê divê lî ser hejmara wan ya rastî lêkolîn bîne kirinê. Gava talûka tevliheviyê hebe, pîsporên me pêşniyar dikin, ku lî şûna dengê reya stûr du r (rr) bî nivîsandin. Wek:

Pîr: Pîra Mala Badê

Pîrr: gelek, zehf

Ker: Heywanek

Kerr: Kesê nabîhîze

Pîştî vê lêkolînê, pîsporên kurmançî ev biryar girtin: Jî bo dengên ç, k, p, t yê hîşk (kerr) danîna hîn tîp an îşaretan “*ne licih e û hîn mahzûran dide peyda kirin. Jî ber:*

1- *Hejmara gotinên ku bi van 4 dengên tî bilêv kirin kê m e û gava ku ew bi tîpên ç, k, p, û t yê adetî tî nivîsîn talûka tînegihîştin an tevlihev kirina wan yekcar hindik e...*”

2- Sedemên pedagojîkî: Pîraniya gelê Kurd nexwendewar e û lî welêt şert û mercên hînbûna xwendinê dijwar in û rê nadin ku ev ferqên di warê fonetîkî da bî rêk û pêk bîne serwestî kirinê. “*..hîn gotinên ku lî hîn navçeyan bi k’ tî bilêv kirin lî cihine din bi k tî gotin û ewê xwendewar timî di nav dudilîyê de bimînin...*”

3- Sedemên teknîkî: “*...Divê ku em dijwarîyên nû saz nekin û pîrsên teknîkî, yê pêşveçûnên teknolojîyê timî bi bîr bin, jî veguherîniyên dinyayê dûr nekevin û bêpar nemînin.*”

4- Alfabe ya Hawarê tîra xwe dirêj e. “*Biservekirina tîpên nû*

ewê wê hê girantir û dirêjtir bike.” (92).


Lı ser vê pırsê merıv bı hêsanî dıbine ku, dı navbera nêrinên pısporên zaravê Kurmancî,- ku lı ser encama lêkolîneke têne pêşkêş kirinê- û yê Mir Celadet Bedîrxan da, ferqeke zêde mezin tunin. Ê bı dîtina mm ev her du dîtın jı, dîtınên zanistî û emelî ne. Loma jı, lı ser vê pırsê dı nav Kurdan da lihevkarîneke (consensus) bı gıştî çêbûye. Heke carna ev pırs jı nû va tê bira hın hevalan, sedemê vê yekê ne ku ev pırs bı xwe ye, lê disa munaqeseyên lı ser “î”(i) û “ı”(ı) yê ne. Mıxabın, jı nûva bıbiranina van, ne jı bo çareserkırına hın pırsan e, lê jı bo zêdekırına geremolan e.

Berîya ku em vê pırsê bıqedinin, divê çend gotm lı ser nisbeta van dengên hışk (kerr, cêwî) jı bên gotın. Lı gor lêkolina Baran Rızgar, jı sedî 68 ê dengên “k” ya Kurdi û jı sedî 42 yê dengên “ç” ya Kurdi, dengên hışk in. Lı gor van nisbetan, me lêkolina Mir Celadet ya jı sala 1932 an jı nû va dı ber çav re derbas kı. Bı vî awayî me xwest ku, em jı pırsa ku nisbeta van dengên hışk û “r” ya stûr ka dı nav hemû dengên Kurdi da çıqas in, bersivêkê bıbinin. Pıştî hın hesaban, em gıhıştın vê encamê:
Nisbeta “ç” ya hışk ya dı nav hemû dengên Kurdi da % 0.35; ya “k” ya hışk: % 2,5; ya “p” ya hışk: % 0.25; ya “t” ya hışk % 1.6 û ya “r” ya stûr: % 1.5 derket.

Dı navbera van nisbetan û lêkolina pısporên Kurmancî da, ferqîne mezin hene. Ew dıbêjm, “..k ya kerr..” dı 70-80 qırnên bêjeyan da dıxuyên. Lê lı gor ku me hesıband, hejmara “k” yê hışk jı hezari gelek zêdetır in. Her wesa ev ferq dı nisbeta dengên “ç”, “p”, “t” ya hışk û “r” ya stûr da jı diyar in.

Lı gor me hesıband (lı jêr binêre), dı sedî not gotınên kurdi da, dı navbera çar heta heşt deng (tip) hene û gotmên ku bı pênc tip in yê herî zêdetır in (% 25.5). Heke em vê reqemê jı bo hemû gotınan esas bıgırın (lı gor hesıbandına statistikî ev yek rast e, angî merıv dıkare reqema pênc-herfî jı bo hemû gotmên Kurdi qebûl bıke), bı ihtimalek gelek mezin dı ferhenga

Qanadê Kurdo da $34\ 000 \times 5 = 170\ 000$ deng (tip) hene. Heke hejmara “k” yê hışk dı navbera 70-80’i da bın, nisbetek gelek cihê dertê (% 0.047). Tişteke xerib û balkêş ev e ku, dı navbera lêkolînê nû û yê kevn da, dı pırsa nisbeta dengan de tu têkiliyek tune; ango hesabandinê nû nisbeta dengê “k” ya hışk, lı gor lêkolina kevn, 50 cari zêdetır nişan dıdın. Bê şik xebatên lı ser dengên ku nisbetên wan gelekî kêmtır in, xebatên akademiki ne, û dıvê encamên van xebatan ditina me ya lı ser pırsa alfabeyê û dengên hışk ne guhêrın. Jı bo danberheva nisbeta dengên ku babeta vi beşî ne, lı wêneya jêrê bînêre.



Danberheva bın dengên zımanê Kurdi

5.2.3. Dengên ‘eyn, h’ û x’:

Malmisanij û M. Lewendi lî diji rakırına kumık û nıqutê ne. Jî tevliheviyên kumık û nıqutê bêtır, ew bala xwe dıdın ser hın dengên ku dî alfabeya Kurdi ya latini da nehatine nişankırın. Her du jî lî ser hm dengan,-dengên “E” ya “Eli”, “x” ya “ax’a” û “H” ya “H’esen”- dısekinın û hın pêşniyariyan tinın.

Ev her sê deng, dî alfabeya erebi da, bî sê tipên cihê hatine nişan kırın: (ع), (غ) û (ح).

Lî mıqabilê bî “zêr û zıber” kırına tipa ‘eyna erebi, çend tipên latini yên dengdêr dıvê bên danini: Malmisanij çend nımûnan dıde:

“ ‘A: ‘ar, bê‘ar ...
‘E: ‘Elî
‘I: ‘inte-int
‘İ: ‘İsa
‘O: ‘orrî ..., ‘orre ‘or
‘U: ‘Usman ”

Û hım ew û hım jî M. Lewendi pêşniyari tinın, jî bo ku ev deng dî alfabeya Kurdi da bî apostrofeke (‘..) bête nişan kırın. Malmisanij dıbê her çend dıbe ku iro zehmet be jî, lê heke dengên “h’ ” û “x’ ” bî herfên cihê bêne ifadekırın dê baştır be. M. Lewendi jî, jî bo dengê “h’ ”, dî vê nêrinê da ye.

Dî danina alfabeya xwe da Mir Celadet lî ser dengên “h’ ” û “x’ ” ya lî jor jî sekmiye. Dî hejmara yekê ya Hawarê da Mir Celadet weha dıbê: Jî sıh û yek herfan “..pêve du herfên biyanî hene ko birek jî kurdan wan dibêjin. Lewre ko ew herfên ha di eslên xwe de ne kurdî ne.

Me ew ne êxistine nav elfabêya xwe. Ew jî (ح) û (غ) ne, me ew du herf bi danîna du deqan ser ‘h’ û ‘x’ nişan kırine.

ḧ - ḧal ẍ - ẍar

Ko ev du deq ketin ev herfên ha vedigerin ser herfên kurdî û dibin h' û 'x'.

Ji xwe piranîya kurdan şûna (Ğ) (Ç) dibêjin;


ẍeyîdîn, xeyîdîn ” (93)

Her wesa di kitêba Celadet Bedîrxan & Roger Lescot ya bi navê “Grammaire Kurde”(wergera tırki-“Kürtçe Grameri”) da, ev du deng di alfabeya Kurdi ya latini da, bi awayê li jor hatine danin (h, x). Di vê kitêbê da tê nîvisin ku, ev her du deng ne du dengên ku bi tevayî di nav kurmanciaxêvan da tene bîkaraninê, lê du dengên ku mexsûsê hin devokên kurmanci ne (94).

Çewa Malmisanij û M. Lewendi ji dibêjin, wek deng eslê wan ji kijan zîmanî hatibe bila bîn, iro ew di zîmanê Kurdi da hene û ev hebûn ji, di dirokê da ji zarûreteke civakî hatiye pê. Beriya ku em bersiva pîrsa ku, ka hewcedariya hm tipên taybetî ji bo van dengan heye an na bîdm, divê em binêrin ka nisbêta van a di nav dengên zîmanê Kurdi da çine. Kêm bm ji, hin lêkolîn di vi warî da hatine kirin. Di nav wan tipên ku bûne bîngeha lêkolîna Baran Rîzgar (72 521 tip) da, me nisbêta dengên “h’ ”, “x’ ” û “ ‘e” hesaband (95). Li gor vê hesabandinê nisbêta dengê “h’ ” ya Kurdi di nav hemû dengên zîmanê Kurdi da % 0.5; dengê “x’ ” ya Kurdi % 0.15 û dengê “ ‘e” ya Kurdi ji % 0.16 ye.

Li gor lêkolîna Baran Rîzgar, dengê “h’ ” % 21 ê hemû dengên “h” yê Kurdi ye; dengê “x’ ” % 10 ê hemû dengên “x” yê Kurdi ye û dengê “ ‘e” % 1.4 ê hemû dengên “e” yê zîmanê Kurdi ye. Li gor van reqemên dawiyê, di nav hemû dengên lêkolîna Mir Celadet da, me nisbêta van dengan hesaband. Encama vê hesabandinê bi vi awayî ye: Nisbêta dengê “h’ ” yê di nav hemû dengên lêkolîna Mir Celadet Bedîrxan da (17680 deng), % 0.4; ya “x’ ” yê % 0.19 û ya “ ‘e” yê ji dibe % 0.17 ê hemû dengan.

Wek dıxuyê, nisbeta dengên “h’ ” û “x’ ” dî nav hemû dengên zımanê Kurdi da baş zelal e. Lê belê, heke em lêkolina Baran Rızgar jî bo xwe esas bigrın, nisbeta wan dengên ku, Malmisani jî bî “ ‘A”, “ ‘E”, “ ‘I”, “ ‘Î”, “ ‘O” û “ ‘U” nişan dıke, dî nav hemû dengên zımanê Kurdi da diyar nabe. Loma jî me lêkolinek nû çêkır û nisbeta van hemû dengên ku mîqabilê “zêr û zıber” a harfa ‘eyna erebi ne, hesiband. Jî bo vê hesibandınê me ferhenga D. Îzoli, ku jî nêziki 30 000 gotinan pêk hatiye, bingeh girt. Ango, me nisbeta van dengên dî nav hemû xezina gotinên Kurdi da hesiband. Lî gor vê lêkolinê, dî ferhenga D. Îzoli da 288 caran dengê ‘eynê derbas dıbe. Jî 288 dengên ‘eyn, 155 deng yê “ ‘E”; 85 deng yê “ ‘A”; 30 deng yê “ ‘I-Î”; 15 deng yê “ ‘U-Û” û 3 deng jî yê “ ‘O” yê ne. Bî gotinek dın, dengên “ ‘E” û “ ‘A” bî hevra, mîqabilê nêziki % 83 ê hemû dengên ‘eyna zımanê Kurdi ne. Ger em nisbetên van dengên, bî şikil bıdın ber hev, dê ev wêne çêbibe.




Lê belê hê jî diyar nabe, ka nisbeta van dengên, ku jî dêlva hemûyan va em ê tipa “ ‘e” nişan bıkın, dî nav hemû dengên xezna zımanê Kurdi da çiqasın. Jî bo ku meriv karibe bersiva

vê pîrsê bîde, divê meriv zanibe ka dî ferhenga D. Îzoli da çend deng (tip) hene.

Bî awayê rasthati (korfelaqi-random) me hesiband, ka sedî çend gotmên Kurdi bî çend tipan tîn nîvisandin. Bî gotinekî dî, dî vê ferhengê da çend gotmên ku jî 1, 2, 3,...11, 12 tipan pêk hatine hene, me hesiband.


Encama vê lêkolînê bî vi awayî ye: Dî xezna gotmên Kurdi da, nisbeta gotinên ku jî yek herfê pêkhati % 0.1; nisbeta yên ku jî du herfan pêkhati % 2.3; yên jî sê herfan pêkhati % 9; yên jî çar herfan pêkhati % 13.3; yên jî pênc herfan pêkhati % 25.5; yên jî şeş herfan pêkhati % 20; yên jî heft herfan pêkhati % 13.2; yên jî heşt herfan pêkhati % 9.3,... û hwd. Me ev nisbet bî diyagramêkê nîşan kirin û li jêr danin.



Wek dîxuyê, jî sedî not gotinên Kurdi jî sîsê heta heşt herfan pêk hatine. Û li gor qaideyên zanyariya statistikê, meriv kare reqema 5,5 herfan, jî bo hemû gotmên Kurdi yên dî xezina ziman da hene, esas bigre. Ev lêkolîn li ser Ferhenga D. Îzoli hat çekirin. Wê çaxê em dîkarm bîhesibînin ka çend deng (tip) dî

gotinên vê ferhengê da hene: $30\ 000 \times 5.5 = 165\ 000$ (Binêre llawe-I).

Sedî çend gotinên Kurdi bî çend tipan in.



1	0,1%
2	2,6%
3	9,0%
4	13,3%
5	25,5%
6	20,0%
7	13,2%
8	9,3%
9	3,2%
10	3,0%
11	0,6%
12	0,1%

Jî xwe me berê da zanin ku, di vê ferhengê da, dengên ‘eyna Kurdi 288 caran derbas dibû. Wê gavê meriv dîkare bêje ku, di nav 165 000 dengên (tipên) ku di xezna zîmanê Kurdi da hene, tenê 288 ên wan dengê ‘eyna Kurdi ne. Jî vê encamê jî, ev nisbet dertê: Di xezîna gotinên zîmanê Kurdi da nisbete dengê ‘eynê (‘e) % 0.17 ye. Bî gotinek dîn, jî deh hezar dengên Kurdi tenê 17 deng, dengê ‘eyna (‘e) Kurdi ne. Bê şik ev nisbet, nisbeteki gelek kêr e. Nisbete ku me derani (% 0.17) û ya ku Baran Rîzgar dîde (% 0.16) hema hema wek hevîn.

Lî vîr dîvê em disa vegerîn ser ditinên Malmîsanîj û M. Lewendî. Her du jî xwe bî tîştên, ku dîvê di dereca sîsiyan an çaran da bî munaqêşekirîne mijûl dîkîn. Ango, ew dev jî “gamêşa qîrase ber dîdîn û serê xwe bî mêşê” dîêşîn. Gava meriv nisbete wan dengên ku her du nivîskarên me di nivîsarên xwe da

qal dîkîn, dîde ber hev, ev yek baştır diyar dîbe. Dî nav deh hezar dengên Kurdi da, 1020 degên “î”; 400 dengên “i”; 17 dengê ‘eyn (‘e), 40 dengên “h’ ” û 19 dengên “x’ ” hene. Em hejmara wan dengên ku Malmisanîj û M. Lewendi giring dîbinin bîdm ser hev, dîbe jî 10 000 dengan 76 deng. Gava em wan dengên ku bî rasti jî gelemşe û sergêjayîyan dertinin, lê mîxabîn her du nivîskarên me naxwazîn ku ev tevlihevi zû bêne çareserkirinê bîdîn ser hev, dîbe jî 10 000 dengan 1420 deng. Lî ser vê pîrsa giring Malmisanîj dîbê, jî ber ku heta iro weha hatiye, bîla weha jî here; M Lewendi jî dîbê, jî ber ku ev mesele gelek hessas e divê neyê lezandîn, lê belê dî eyîni wextî da ew sedemê vê sergêjiyê, ango kumîk û nîqutê diparêze. Jî ber vê yekê ye, mîxabîn dîtmên her du yan jî, jî bo çareserkirina vê pîrsê tu ronayîyekê nayîn, ew gelek lî rû lî vê meselê dînêrîn.

Bî dîtma mîn, maka hemû gotûbêjên ku lî ser alfabeya Kurdi ya latîni têne kîrînê, pîrsa “î” ya bî kumîk û “i” ya bî nîqut mîn. Loma jî, divê rojekê zûtîr ev pîrs bê helkîrînê. Jî ber wan sedemên ku me berê dani û yêî ku dî rûpelên pêş da ez dîtmên xwe lî ser ava dîkîm, helkîrîna herî maqûl û hêsan, rakîrîna kumîkê ye. Bî vî awayî pergala (rêza) herfên alfabeya Kurdi, wê bîbe wek pergala alfabeyên dîî yêî latîni. Ango, wê tîpa “i” berîya tîpa “î” bê. Jî ber ku, berê tîpa adetî jî bo dengê adetî tê nîşankîrîn û paşê jî, bî guhertîna wê tîpê, jî bo dengê ku cîhderka wê nêzîkî ya dengê tîpa adetî ye, tîpeke nû tê çîkîrîn. Lê divê tîpa nûçêkîrî lî dû ya adetî bê, ne ku lî pêşîya wê bê.

Dî pîrsa dengên “h’ ” û “x’ ” yê da rewş pîçek cîhê ye. Jî ber ku pîrî caran ev deng dengên herêî ne û nîsbeta wan dî nav hemû dengên Kurdi da gelek kêî mîn, ne hêja ye em jî bo van her du dengan tîpên nû deynîn û bî vî awayî herfên alfabeya xwe hê zêdetîr bîkîî û wê bî nîşanên nû “kîrêt” bîkîî. Jî xwe pîraniya maneyên ku ev deng dîdîn, dî nav hevokê (cumlê) da xweş diyar dîbîn û talûkeya tevlihevbûîna van dengan bî dengên “h” û “x” ya adetî ra, pîr kêî e. Heçî pîrsa ‘eyîna

Kurdi ye, bî ferqek, ez ditma Malmisanij û ya M Lewendi maqûl û lî ci dîbinim. Ango, ne jî bo bîkaranina rojanê, lê jî bo transkripsiyona klasikên Kurdi, bîkaranina apostrofeke, wê têgihîştina wan hêsantir bîke. Her çend, jî bo bîkaranina rojanê ez ne aligirê bîkaranina apostrofê bîm jî, lê jî ber ku ev îşaret nabe sebebê ku tîpek nû lî alfabeyê zêde dibe û her wesa jî, cîyên ku divê ew bîkaraninê gelekî kêr in (jî ber ku ev deng bî xwe kêr e), û bî ser da jî jiyanê car car wek zarûretek bî hîr nîvîskaran vê îşaretê daye emilandin, hewce nake meriv bî ser hîşki lî dij bîkarnanina wê derê. Jî xwe îşaretên bî vî awayî, bêyî ku ew dî pergala (rêza) herfên alfabeyê da wek herfeke taybetî bî dayînê, dî gelek zîmanan da hene. Wek nîmûne, dî “émigré” û “élan” a Îngilîzî da, dî “entrée” û “nattiné” ya Swêdî da, tîpa “é” tê bîkaranîn. Lê dî alfabeyên van her du zîmanan da, wek tîpek serbîxwe, tîpek bî vî awayî tune.

6. ÇEND BÎR Û RAY Lİ SER ALFABEYA HAWARÊ

6.1. Destûrên C. Bedîrxan û pîrsa kumîk-nîqutê:

Herçend Mir Celadet dibê, “*Gora destûrên me ên bîngehî ...diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabêya Tirkî dîr me kevin.*”

Li hir e, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dîr ketin.” (Ji destûra yekê dîrketin), lê bî dîtinê min, bî vî tîrî Mir Celadet ne ku jî destûrekê bî tenê, lê jî çar destûrên xwe dîr dîkeve.

a- Em destûra pêşî bîdî alîkî, jî ber ku ew bî xwe dibê, bî neqandîna van tîpan, ew jî destûra xwe ya yekem bî dîr ketîye.

b- Dî destûra dîduyan da ew dibê: “*Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî ên adetî ko di zmanên din de nas in, di elfabêya kurdî de hîlanîn û neguhertin. Bi vî awayî kurd dê bî karîna elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsanî fêr bibin.*” Heçî dengê herfa latînî ya adetî “i” ye, jî bîlî zîmanê Romanyayî, dî hemû alfabe-yên latînî de bî şîklê “i” têtê nîşankirin. Mir Celadet dengê vê herfa adetî hîlnayne nav alfabe-yê xwe û bî ser da jî, vê tîpê dîguhêre, nîqutê radîke û kumîkekê dîdî serê. Ev yek, jî sedî sed lî dîj vê destûrê ye.

c- Dî destûra çaran da Mir Celadet dibê, “*Her dengî bi herfe-ke cihê nîşan kirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dengên bî herfêkêxwe dan alî.*” Ne qabîl bû ku, vê sosreta îro ya ku dî nav Kurdan da heye û lî jêr hatiye qalkirin, ewî hê dî wê

demê da karîbûya bîdita. Lewra dî rastiya iro da, tipa “i” ya Hawarê, jî alî wan kesan va ku dî mektebên Tîrki da bî salan perwerde bûne, wek “i” ya alfabeya Tîrki têtê xwendin. Ev dijwariya hanê, bî kêmasî dî destpêka fêrbûna alfabeya Kurdî da gelek berbiçav e. Heke em lî xwendevanê Kurd mêzekin, ka nisbêta xwendma wi/wê çiqas bî Tîrki û çiqas jî bî Kurdî ye, ev dijwari baştir zelal dibe. Kurdên siyasi jî dî nav da, bî qasî ku Kurd bî Tîrki dixwinin, jî dehan yekê wê bî Kurdî naxwinin. Mîxabin, jî xwe pîraniya kovarên ku lî welat nivîsên Kurdî jî diweşinin, jî nivî bêtir nivîsên xwe bî Tîrki dihişînin xwendevanên Kurd (!?).

Eynî tip (i), gava dî nivîsandina Tîrki da ye dibe dengê “i” ya adetî û gava dî ya Kurdî da ye dibe dengê “î” yê (î-ya Hawarê). Baş e ka lî ku derê ma, ku xwe “*..ji awayê nîşankirina çend dangan bi herfekê..*” dûr xistin. Dibe ku hin heval xwe neqayil bikin û bêjin: “*Tu çima tip û dengên du zimanên serbixwe tevi hev diki?*”. Rast e, Kurdî û Tîrki du zimanên jî hev cihê, du zimanên serbixwe ne, lê gava Kurd bî hemdê xwe jî Kurdî bêtir bî Tîrki dixwinin û rûmetê didin tiştên bî Tîrki nivîsandî, wê gavê ez bawer im ev pîrs dê pîrseke dî cîda nin be. Lî pêş, bî firehî ezê dişa vegerim ser vê meselê.

ç- Lî gor destûra pêncan, diwiya Mir Celadet dî çêkirina alfabeya xwe ya latînî da, xwe “*Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû..*” dûr bixista. Ew dibê, “*Nîşan ji hêlekê di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide wenda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe ên eslî, bî nîşan, û tevî-hev dibin.*”

Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî dişwarîke din e. Ji lewre ji bona tevayîya herfên bi nîşan me ev (^) pejirand, û bîlîndek nav lê kir...Ji xwe boş bûna nîşanan nivîsandinê kirêt dîke.” Lî cîyê ku qet hewce nake, Mir Celadet tipa “i” ya adetî ya latînî, bî nîşanek nû bardike û ew dibe “î”. Livandina qelemê jî bo kumîkê, jî ya nîqtê zêdetir wext digre. Loma jî, bî

vê nişana nû dî nivisandîna Kurdi da wext kê mabe, zêdetir dibe. Bî terikandîna “i” ya adeti ya latini, ew mecbûr dibe kumîkê qebûl bike. Jî hêla din va, bî anîna nîqta lî ser “i” yê, çar tevlihevi çêdibîn:

Yek, biyani “i” ya Hawarê (dengê “i” yê), wek “i” ya latini ya adeti dixwinîn;

Dîdo, hejmara nişanên cihê zêde dibîn;
Sîsê , bî zêdebûna nişanên lî ser tipan ra, nivisandîna qirêj (kîrê) dibe.

Û ya çaran, bî du nişanan (nîqut û kumîk) wextê jî bo livandîna qelemê, jî wextê jî bo livandîna yek îşaretekê dirêjtir e.

Heke Mir Celadet tipa adeti ya latini “i” yê jî dêlva dengê “i” ya Kurdi bigirta û wek dî çend tipên ku dî alfabeya latini da tunîn (c, ç, ş), jî dêlva dengê “i” ya Kurdi, tipa “i” ya dî alfabeya Tirkî da bigirta, dê ev tevliheviyên lî jor çênebûna. Jî xwe, dî warê zîmanzanîyê da tu xîsûsiyeteke nîqta lî ser “i” ya Hawarê nine. Heke jî vê nîqtê mextsed nişankirîna dengdêrên kî bûya, dîvîya bû ev nîqut bîhata ser herdû dengdêrên kî “e” û “u” jî. Nexwe, jî serhîşkiya me pêva, çî sedemek heye ku em iro vê nîqutê lî xwe dîkî bar û alfabeya xwe bî wê “kîrê” dîkî ?.

6.1.1. Tevliheviya dî pergala alfabeya Mir Celadet da:

Dî pergala alfabeya Mir Celadet da, piçek tevlihevi heye. Gava meriv alfabeya latini û alfabeyên din yê ku jî ber wê hatine çêkirinê, dîde ber hev, hî tîşt bala meriv dîkîşîn. Wek nîmûne, her mîletê ku alfabeya latini jî bo alfabeya xwe bîngêh girtiye, wek dî destûra Mir Celadet ya dîduyan da jî tê diyarkirin, berê herfên (tipên) latini yê adeti, ku mîqabîlê hî dengên zîmanê wan in, dîgrî nav alfaba xwe. Paşê, jî bo wan

dengên ku dî alfabeya latini de berdêla wan hiç tip nînin, tipên nû çêdikin. Dî çikîrîna tipên nû da, wek prensib jî tipên latini yê adeti tê istifadekirin. Cihderka wî dengê xasê wî zîmanî, nêzîkî cihderka kîjan dengê ku bî tipa latini hatiye nişankirînê be, lî ser wê tipa latini ya adeti hî gihertî tî çêkîrmê û bî şîklê giherti, ev tipa nû jî bo wî dengê xas dibe tip.

Hî zîman van tipên nû dî dawîya rêza alfabeya xwe da nişan dîdî. Dî pîranîya alfabeyên zîmanên dm da, ev tipa nû pîştî tipa ku hatiye gihertî tî. Jî hî alfabeyên cihê çend nîmûne:

Jî bo bîrra pêşî, alfabeya Swêdî; dî dawîya vê alfabeyê da ev tip hene: å, ä, ö.

Nîmûnên jî bo bîra dîduyan:

Alfabeya Polonî, a-a, c-c, e-e, n-n, s-s, z-z;

Ya Serbokratkî: c-c-c, s-s, z-z;

Ya Çekî: a-a, c-c, e-e, n-n, r-r, s-s, t-t, u-u-u, z-z.

Dî vî wî da, hî dî alfabeya Tîrkî da û hî jî dî ya Kurdî da şaşîyek heye. Dî rêza tipên ku dîşîbî hev da tevliheviyek çêbûye. Alfabeya Tîrkî dî rêza tipên c-ç, g-ğ, s-ş, o-ö, u-ü da, kîrîna wek alfabeyên dî. Herwekî dî alfabeya Kurdî da, jî bo van tîpan bî wî awayî hatiye kîrî: c-ç, e-ê, s-ş, u-û. Dî van hemû cottîpan da, ya pêşî ya latini ya adeti û ya bî dûra ya nûçêkîrî ye. Lê, gava em lî tipên î-î (alfabeya Tîrkî) û î-î (alfabeya Hawarê-alfabeya Kurdî) dînêrî, ev tîşt berepaşî ye.

Her çiqas dî şîklî da “î” ya Hawarê wek “î” ya adeti ya latini be jî, wek me berê got, ev tip ne mîqabilê “dengê herfa latini” ye. Loma jî ev rêzkîrîna şaş intîbayeka wesa dîde meriv, ku wek “î” ya alfabeya Tîrkî û “î” ya alfabeya Hawarê tipên adeti yê latini bî û “î” ya alfabeya Tîrkî û “î” ya Hawarê, jî

guhertina van tipên adeti hatıbın bîdestxıstın. Lê belê, rasti ber'eksê vê yekê ye. Bî ditina min ev yek giring e. Lewra, heke Mir Celadet di çêkirina alfabeya xwe da, rêza tipên alfabeya Tırki jî bo ya xwe bîngeh girtibe, ev yek dibe ku wi mecbûr hîştibe, beriya ku ew tipa "î" ya latini ya adeti têxe alfaba xwe, jî bo dengê "ı" ya zımanê Kurdi lî tipekê geriyabe. Û gava ew, wê gelemşa di zımanê Tırki da ya ku lî ser "ı" ya ku di nav hin tipan da wenda dibû, dibine, "î" ya adeti ya latini jî ber bî nıqute û di nav hin tipan de wenda nabe, jî dêlva dengê "ı" ya Kurdi dıgre nav alfabeya xwe. Jî xwe Tırkan jî, jî bona veqetandina tipa "ı" yê jî hin tipan, îşaretek dianin ser wê herfa beriya tipa "ı" yê. Jî ber hêdi di destê wi da tu tipên din jî bo dengê "î" ya Kurdi namine, ew mecbûr dibe ku, nıqta lî ser "ı"-ya adeti bavêje û kumîkekê deyne şûna wê. Gava Mir Celadet bî vê pîrsê mijûl dibe, di senifandina tipên adeti yên latini û yên ku divê bî guhertinên lî ser wan bîn bîdestxıstınê da, lî gor alfabeya Tırki dıçe. Ew weha dınvisine:

"e, î - ê, î.

Di destê me de tu herfên din ne ma bûn, û gora destûreke me diviya bû em herfên hevduanî (hevedudani-CC) emel mekin. Ji lewre jî bona nîşankirina tofa paşîn (ê, î-CC) me ev (^) nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek" Wek dıxuyê, yên "tofa pêşîn" yek jê (e) dengê tipa latini ya adeti dıde, lê ya dm (i) ne dengê tipa adeti ya latini ye, mîqabilê dengê "ı" ye.

6.1.2. Feyde û zerarên kumîk û nıqutê;

Nisbeta dengên "î" û "ı"-yê:

Gava Mir Celadet bî pîrsa danina tipên "v" û "w" mijûl dibe, çewa me berê jî qal kır, ew dibine ku nisbeta tipa "w" jî ya tipa "v" zêdetır e. Lî ser vê yekê ew jî xwe dıpirse: Tipek (w) ku nisbeta wê jî ya dın (v) bêtır e, lê di nıvisandinê da jî ya kêmnisbet zêdetır wext dıgre. Ew dibê, ev yek lî dij destûreke wi ye. Lê jî ber feyda ku, bî van tipan ra wekheviya alfabeya Kurdi û yên navnetewi pêk tê, ew vê destûra xwe feda dike. Baş e, divê lî vir bê pîrsin: Bî tipa "î" ya Hawarê, alfabeya

Kurdi him ji alfabeya navnetewi dûr dîkeve û him ji di nîvisandinê da, lî gor alfabeya navnetewi (i), zêdetir wext digre. Heke em lî gor awayê Mir Celadet lî vê pîrsê binêrin, divê em cardin bîpîrsin: Baş e, jî bo em van herdû dijiwariyan têxin nav al-fabeya xwe, feyde û qazanca me çiye ?. Mixabîn, hiç tîştêk jî nîne. Gava meriv lî nisbetên “v”(% 1), “w” (% 1.6) û “î” yê (%4) dinêre, diyar dibe ku di zîmanê Kurdi da dengê “i”(î) yê, lî gor dengên “v” û “w”, dengêkî bîngehitir e. (Lî ser nisbêta dengên “v” û “w” di dest da, reqemên cihê hene. Yê lî jor, yê Mir Celadet bî xwe ne. Lî vir, jî reqeman bêtir, awayê mantiqa wi jî bo me girîng e.)


Em vegerin ser tipa “i” ya Hawarê (1). Lî gor metoda Mir Celadet ya jî bo sıvîk û rewan kîrîna nîvisandinê zîmanê Kurdi, divê nîqûta lî ser “i” ya Hawarê bête rakirin. Lî mîqabîlê vî dengê Kurdi, wek me berê jî da zanîn, di alfabeya latîni ya adetî de, dengê tîpekê tune. Lewra divê tîpek bête çekîrmê. Em jî nêz va lê hûr bûn, ka bî çî awayî “i” ya Hawarê peyda bûye. Ê her wesa, lî jor me got ku di warê zîmanzanîyê da tu xîsûsiyeteke (fonksiyoneke) nîqûta lî ser “i” ya Hawarê tune. Di danîna alfabeya xwe da, lî gel şeş destûrên xwe, wek me berê da zanîn Mir Celadet ehemîyetek gelek mezîn daye nisbêta dengan. Hîn dengên ku nisbêta wan gelek kêr bûne, negirtîye nav alfabeya xwe, wek “h’ ” û “x’ ”. Ê her wesa, ewî gelek hewil daye jî bo ku dengên bî nisbêtek bîlind, bî awayek zelal û hêsan bêne nîvisandin. Gava em lî tipa “i” ya Hawarê (1) dinêrin, jî ber sedemê ku berê hat behskirin, ev prensîb neçûye serî. Heçî dengê “i” ya Kurdi ye, di nav sıh û yek dengan da, pîştî dengê “e” yê, dengê ku herî zêdetir e. Jî xwe Mir Celadet jî bo dengên “e” û “î” dibê, ew “bingehê dengdêrên zîmanê Kurdi” pêk tînin (96).

Ev rastî, ne tenê di lêkolînê Mir Celadet bî tenê de dixuyê, lê di çend lêkolînê nû da jî baş diyar dibe. Lî gora lêkolîneke M. Celadet nisbêta dengê “i”(î) yê % 10.2; lî gora lêkolîna Zagrosê Hajo, % 10.26 (97) û lî gora ya Baran Rîzgar, % 8.5 ye (Lî wêneyan binêre).

Vêca em ê çima nîquteke bê mane lî ser tipa vi dengê, ku di zîmanê Kurdi da dengêki bîngehi ye, bîhêlîn. Û bî vi awayî ji, xwe jî prensibek Mir Celadet dûr bêxîn. Jî xwe, ew sergêjayiya ku bûbû sebêbê vê tevliheviyê jî, iro nemaye.

	accented unaspirated	unaccented aspirated	total	%
a			5882	8
b			3180	4.4
c			661	0.9
ç	%42 350	%58 475	825	1.3
d			2744	3.8
e	%1.4 116	%98.6 8394	8510	11.8
ê			1577	2.2
f			677	0.95
g			1426	2
h	%21 386	%79 1476	1862	2.5
i			6190	8.5
î			3855	5.3
j			620	0.95
k	%68 1770	%32 820	2590	3.6
l			2237	3.1
m			1888	2.6

	accented unaspirated	unaccented aspirated	total	%
n			5806	8
o			1316	1.8
p	%37 417	%63 723	1140	1.6
q			1002	1.4
r	%25 1344	%75 4036	5380	7.3
s			1914	2.6
t			1443	2
l	%27 660	%73 1799	2459	3.4
u			797	1.1
û			904	1.3
v			1363	1.9
w			1153	1.6
x	%10 110	%90 996	1106	1.5
y			731	1
z			1283	1.8
	8.7 6,292	%91.3 66,229	72,521	100



Nisbeta dengên Kurdi lî gor Baran Rîzgar (98)


Jî hêla dîn va, çewa me berê jî dit, bî vê nîquta lî ser “i” ya Hawarê, ev tipa ha bî tipeke alfabeyên biyani tevlihev dibe. Wek “i” ya Tîrki, ya Îngîlîzî, Almanî, Fransîzî, Swêdî,... û

hwd. Heke ev tip mîqabilê dengêki kêr yê zîmanê Kurdi bûya, meriv karibû bigota, xem nine ev tevlihevi sergêjayiyeke biçûk e. Lê mixabin ne wesa ye. Ev tip, wek me berê ji got, yek ji wan du dangan nişan dike, ku heri bmgêhin yên zîmanê Kurdi ne. Ez bi xwe nikarim, loma ji ez ê ne carekê sed carên din ji bîrîsim, gelo çima em pê dikutin erdê, ji xîştina xwe nayên xwarê û vê nîqutê dîparêzm; ji sergêjayi, tevlihevi û gelemşan pêva, feyde û qazanca vê nîqutê ji bo me çiye ? Divê em xwe disa bîspêrîn himdarê vê alfabeyê; Mir Celadet Bedîrxan. Dî danîna alfabeya xwe da, ew li ser çend dangan bi dûr û dirêj difikire, hîn tecrûban çêdike û paşê digiye hîn enca-man.

	%
a	8.4
b	3.2
c	0.4
ç	0.8
d	5.1
e	10.5
ê	5.3
f	0.3
g	1.4
h	2.5
î	10.3

	%
î	3.0
j	1.4
k	3.6
l	2.7
m	2.5
n	9.0
o	1.5
p	1.0
q	0.2
r	5.8
s	2.0

	%
ş	1.5
t	3.5
u	1.4
û	2.7
v	2.0
w	3.0
x	1.6
y	2.3
z	1.1
31 tip	100.0



Nisbeta dengên Kurdi li gor Zagrosê Haco

Wek me berê ji dit, du tipên ku di vi wari da bî mehan ew mijûl kirine, tipên “k” û “q” ne. Piştî ew ji nêzik va dina xwe dide ser gelek zîmanên Ewrûpî, bî gelek kesan dişêwîre û hîm gotmên bî van dangan bî wan dide bilêvkîrî, ew bîrîyara xwe dide, ku jî bo dengê “k” ya Kurdî tipa “q” û jî bo dengê “q” yê jî, tipa “k” yê bî kar bîne. Sal û du meh bî van her du tipan di Hawarê da tişt tîn weşandin. Piştî vê dema ceribandmê, ew pê dihişî ku di vi wari da şaşîyek heye û bêyî ku ew, vîr da wê da jêra maniyan bigere, di yek carê de, van her du tipan bî hev diguhêze. Baş e çî ferq heye, wê demê tipa “q” ya Mir Celadet, mîqabilê dengê tipa “k” ya gelek zîmanan bû. Ewî ev rastî dit û şaşîya di alfabeya xwe da rast kir. Îro jî, “î” ya Hawarê (î) di warê şikîl de, wek “î” ya navnetewî ye, lê di warê deng da ne mîqabilê wê ye. Wê çaxê tiştê ku di vî bête kirînê, her wek Mir Celadet kir, rakirîna nîqta lî ser “î” ya Hawarê ye. Wê demê tipa nû ya vî dengî (î), wek deng bî xwe, wê bî hiç tipên dm tevlihev nebe. Bî qasî mîsqalekê şîka mm lê tune; heke dema ku Mir Celadet alfabeya xwe dani, di nav Tîrkan da lî ser tipa “î” yê gotûbêj tune bûna, bêyî ku ewende jî destûrên xwe dûr bikeve, dê ewî yekser ev tip (î) têxistî nav alfabeya xwe. Û herwesa, ez di wê baweriyê da me, heke ku Mir Celadet îro lî jîyanê bûya, jî ber ku di nav Tîrkan da tu gotûbêj lî ser vê tipê (î) nemane û bî ser da jî, “î” ya Hawarê bî xwera gelek gelemşên nû jî bo Kurdan deranîne, dê wî di nav bist û çar seetan da ev nîqta lî ser “î” ya Hawarê biqewîranda.

Em ê destûr, prensîb û mantiqên ku Mir Celadet di danîna alfabeya xwe da, lî ber çavan girtme, lî vîr biqedinî û jî çend aliyên dm va lî ser vê pîrsê hûr bîbm.

6.2. Kumîk-nîqut û asimilasyon:

Bî ditma mîn, di navbera tevliheviyên di alfabeya Hawarê û bişaftî û helandîna (asimilasyona) zîmanê Kurdî da hîn têkîlî hene. Me jî xwe ra kirîye adet, gava dor tê ser axaftîna lî ser asimilasyonê, em yekser berê tirên xwe yên tûj didî ber bî nî-

jadperesti û hovitiya siyaseta Dewleta Tirk. Bê şik, dî vê kîrîna xwe da, em her çî bîkî, heqê me heye. Lê dî vê bendê da mebesta min ne ew e, ku ez jî, wek pîrî nivîskarên Kurd, hemû lanetê lî vê siyaseta hov û har bîbarînim û bî vî awayî piçekî dilê xwe rehet bîkî. Heçî Dewleta Tirk e, ew dijmin e. Û jî ber ku dijmin e jî, bê minetî ye. Lê gelo, dî bîşaftî û helandîna zîmanê xwe da, hî malxerabîyên ku em Kurd bî destên xwe dîkî tunî ? Çewa tunî, çî bî zanî be û çî jî jî nezaniya me be, hm tîştên ku em bî xwe dîkî, karê dijminê me hêsantîr dîke. Ez ê, raste rast werim ser pîrsa ku em lê mijûlm. Bî dîtîna min, herçend tîştîna ku dî alfabe-yê da hene, ku dî xwendîna Kurdi da dîbîn sebebê sergêjayî û tevliheviyê, ewçend ew xwendevanê Kurd jî xwendîna Kurdi sar dîkî û sur'eta xwendîna wî kêmkî dîkî, dî xwendîna da pê tavên berê û wî dîlîcimî. Û herçend tîştên ku Kurdan jî xwendîna Kurdi sar dîkî, dîbîn sedemê ku ew kûlî kûlî dîxwînm, xwendîna Kurdi lî ber çavên Kurdan dîxî wek gîteki mezî, ewçend ew tîşt xîzmeta asimilasyonê dîkî. Te dîvê ev tîşt, tîpeka alfabe-yê be, ku bî xwendevan ra sergêjiyê çêdîke, an jî gotmek naylon be, ku jî bîlî xwedîyê gotmê kesî dî jê fêmanake, qet ferqet tune ye. Her du jî, xîzmeta asimilasyonê dîkî. Çima?

6.2.1. Zîmanê axaftîna û yê xwendîna-nivîsandîna:

Gava zarokek çêdîbe, ew hê berîya jî dayîka xwe bîbe, zîmanê xwe yê zîkmakî dîbîhîze û jî bûyîna xwe û bî şûnda, roj bî roj zîmanê dayîka xwe, wek şîrê wê, jî derûdora xwe dîmîje. Dî nav du sê salan da, bêyî ku yek jêra bêje dengên Kurdi weha weha ne, navdêr, lêker, rengdêr, daçek, hoker,...hwd; her yek jî wan lî kuderê û bî çî tehîrî dîvê bîkaranîna, ew van hemû deng û pîraniya qaydeyan, bêyî ku pê bîhîse, hî dîbe. Û dî nav salan ra, zîmanê xwe dîxemîline, wê şîrîntîr, zelaltîr û dewlementîr dîke. Gava ew heft salî ye, dî axaftma xwe da, jî bo ya dilê xwe bêje, tîşteki bîxwaze, behsa tîşteki ku qewîmiye bîke, tu zehmetîyekê nakîşîne.

Gelo zımanê vi zarokê Kurd, dı her wari da ediliye ? Na, ne ediliye. Ew dı axaftınê da, jı hevsalên xwe yên Tırk, İngiliz, Erebe, Çini.. ne kêmtır e û ne jı çêtır e. Lê belê axaftın tenê bı serê xwe beşeki jı zıman e, ne ku hemû zıman e. Jı bo keseki ku dı warê zıman da bıkemile, divê ew beşên dın yên zıman jı hin bıbe. Ev beş çine ? Xwendın û nıvisandın m. Ango, zımanê ku tenê dı qonaxa axaftınê da dımıne, zımaneki kême e. Divê yên ku wi zımani dıaxıvm, wi bıghıjının qonaxên bılındır, qonaxên xwendın û nıvisandınê.

Wek me lı jor da zanın, dı hınbûna axaftınê da, zarok bê mamoste, bê mekteb û bê hemdê xwe, jı heqê vi kari dertê. Lê heçi xwendın û nıvisandın e, ne bı vi awayi ne. Jı bo van tıştan, inanoste, mekteb, talım û terbiye divê. Ê jı bo vê yekê, ne ku talım û terbiyeke (perwerde kırıneke) çend rojan, lê belê ya çend salan divê. Ev yek ne tenê jı bo zarokên Kurdan, ku ew ne xwediyê mamoste û mekteban ın, lê jı bo zarokên wan mıletên ku jı bıli zımanê xwe yê zıkmaki, hiç zımanên dın xeber nadın jı, zarûretek e. Bı gotıneke dın, çıqas merıv jır be, xwedi dewlet û dewlemendi be, disa jı bêyi alikariya hınan (mamostan), merıv nıkare hini xwendın û nıvisandınê bıbe. Loma jı, lı hemû welatên dınyayê, mektebên jı bo vê armancê hene.

Lı vır, heye ku xwendevan bıpirse, ka têkılıyên van tıştan û babeta ku em pê mijûl dıbin çine ?. Gelek têkılıyên vê prosesê û babeta me bı hev hene. Jı ber ku, Kurd dı zarotiya xwe da hini axaftına zımanê xwe yê zıkmaki dıbin û jı şeş-heft salı û bı şûn da ew dıçın xwendın û nıvisandınê bı zımaneki bıyani (Tırki) hin dıbin. Baş e, ev rastiya tehl çıqas kare zımanê Kurdi yê axaftmê dı warên xwendın û nıvisandınê da bıedıline ? Bêyi ku merıv bı talım û terbiya çend salan, zımanê xwe yê axaftmê gıhandıbe qonaxên xwendın û nıvisandınê, gelo merıv dê çıqas karıbe jı heqê xwendın û nıvisandına zımanê xwe yê zıkmaki derê ?. Gava merıv, dı zımanê xwe yê zıkmaki da dı qonaxa axaftmê da asê ma be, û bı salan dı prosesı alfabetizebûna zımaneki bıyani da derbas bûbe, roja ku merıv

hewıl bıde û bı zımanê xwe bıxwine û bınvisine, dê meriv çiqas karıbe xwe ji wê talim û terbiya bı salan (alfabetizebûyin) xelas bıke, û meriv dê çiqas karıbe xwe ji mudaxela awayê xwendın û nıvisandina wi zımanê biyani dûr bêxine ? Tenê bı serê xwe û bêyi mekteb, ji nû va bı zımanê zıkmaki alfabetizebûyin, gelo çiqas kare şûna alfabetizebûna berê bıgre ?

i. Pêvajoya (prosesa) xwendinê:

Jı bo em karıbın bersiva van pırsên lı jor bıdın, divê em ji nêzik va lı prosesa xwendinê bınerın. Me berê da zanin ku, dı navbera axaftın û xwendinê da, hm ferq hene. Xwendın alikariya ji derva divê, mamoste û mekteb divê, wext û talim divê. Axaftın, ne tişteki lı ber çav xuyayi ye ku meriv dıbıne, lê meriv dıbhize, û herwesa nıvisa ku tê xwendın ji, tişteke ku nayê bıhistın, lê tê ditın. Axaftm, bı kêmasi dı navbera du kesan da derbes dıbe û pırı caran ew hev dıbinın. Ango dı warê zeman û mekani da, ew bı hevra ne. Lı gel nermi, hışki, nızmi û bılındi ya dengê axaftınê, her wesa yên ku dıaxıvın ji rû û rûçikên hev hın manan dertının ku, ew axaftınê tamam dıkm. Kesê ku dıaxıve, heye mırûzê xwe dıke an dev bıken e, bı hêrs e an tırsiyayi ye. Ev tiştme tev dı axaftınê da diyar dıbin. Meriv dıkare hevokeke Kurdi bı deh teşeyi bêje. Yên ku bı hevra dıaxıvın karın tesirê lı ser axaftına hev bıkın, berê wê ber bı ciyê ku ew dıxwazın va bıqşınm.

Heçi xwendın ne, ne bı vi awayê lı jor e. Dı xwendinê da meriv tenê bı serê xwe ye. Ew kesê ku wê nıvisarê nıvisiye ne lı ber çavan ne û pırı caran ji, ji nêz va nayê naskırm. Ki zane, ka ewi ev nıvisara xwe kengê û dı rewşeke rûhiya çewa da nıvisiye. Xwendevan nıkare tesirê lı ser nıvisarê bıke û wê bıguhêre. Xwendevan û hinde işaretên lı ser kaxezeki spi bı tenê ne û her du wek kerr û lalan, lı rûyên hev dınerın. Divê xwendevan lı wan işaretên lı rex hev bınerê û ji wan maneke derine, ku bê fêmkırinê . Jı ber van sedeman, xwendm talim û terbiye divê. Loma ji, lı hemû derên dınyayê, zarok dı mekteban da, bı salan tên temrin (talim) kırin, ji bo ku ew karıbın vi

hunerî bî dest bîxîn.

Her çend ferqîne dî navbera axaftîn û xwendînê da hebîn jî, divê neyê jîbirkırın ku, her du jî hev nabîn û her yek jî wan xîsûsiyeteke zıman pêk tîne. İca em vegerın ser pırsa xwe. Lı gora hın hesaban, lı welatekî wek Amerika, ku xwediyê gelek mekteb û imkanan e, tê hîzırkırın ku nîzıkî % 15-20 ê nıfûsa dî mekteban da derbasbûyî, dî xwendînê da zehînetiyan dıkşınm. Ev nımûne, tenê bî serê xwe nişan dıde ku, xwendm proseseke hêsan nîne.

Heinû prensiba ku xwendın lı serê tê avakırınê ev e: Bî talım û terbiyê, bî zarokan dıdm fêmkırınê ku ew dengên (fonemên) ku ew dî axaftınê da bî kar tının, bî hm nişanan lı ser kaxez hatine sekınandın. Lê tenê hınbûna van nişanan bî serê xwe, jı bo xwendînê têrê nake. Jı ber ku, divê ev nişan bên rexên hev û gotınan çêbıkın û xwendevan dî demeke gelek kurt da, hemû nişanan bıghijîne hev û jê maneyeke derine. Bî gotineke dın, divê zarok dî demeke dûrûdırêj da ewende bên talım kırın ku, ew bêyi ku bıfıkırın û bının bira xwe, ka ew işaret mıqabilê çı dengi ne, yekser dî derbekê da deng û işaretê bıghijının hev. Ev tışt tê wê manê, ku çewa çav işaretê bıbine, bêyi ku jı mêji bıpırse ka ev çı deng e, divê bî awayê otomatiki işaretê bıghijîne deng. Heke dî xwendînê da, jı bo her işaretekê meriv bî hemdê xwe lı dangan bıgeriya û bıaniya bira xwe û paşê bıxwenda, wê çaxê tu xwendın mımıkûn ne dıbû. Jı xwe, hemû armanca perwerdekırına mekteba salên pêşın, pêkanına vê otomatikkırına dî navbera işaret û deng da ye. Gava meriv wext digre û dıhesıbıne, ka kesekî ku dıxwine, dî deqıqekê da çend işaret û dangan dıghijîne hev, ev pırs zelaltır dıbe. Hın camêr rûnıştme û jı me ra ev tışt hesıbandıne. Lı gora van hesaban, gava ınerv tışteki nıvisandi dıxwine, dî deqıqekê da, dî navbera 400-800 deng (fonem) dıxwine. İca wextê jı bo her tipekê, jı bo ku xwe bî dengeki bıguhêze, lı dor 4,5-9 sanise ye. Dı demek ewende kurt da, lı ser tip û deng fıkırandın qabil nîne. Jı xwe, wek me berê jı got, zarok bî salan tên talımkırmê jı bo ku, ew ewçend dı vı kari da bıbın

otomatik ku bêyi hemd û irada xwe tip û dengan bîghijînin hev.

Ev rasti, راستی‌که zanîstî ye. Loma jî, gava zarokên Kurdan bî salan di mektebên Tırkan da, lî gor alfabeya Tırki talim û terbiye dîbîn, ew çewa tipa “i” dîbinîn, ewê yekser wek dengê “i” dîxwinîn. Jî hêla dm, çaxa zarokên Kurd jî bo zîmanê Kurdi di vê talim û terbiyê da derbas nebûbîn (Ev yek, şertê jî bo otomatîkbûyîna xwendmê ye) û çaxa “i” ya Hawarê bîxwinîn, dê çewa di 4,5-9 sanîsan da bê bira wan, ku ev tip, ne tipa jî bo dengê “i” yê ye, lê jî bo dengê “ı” yê ye. Ez nîzanîm, meriv wê bî çî aqlî vê daxwaz û hêviyê jî zarokên Kurdan bîke. Rasti çiqas tehl be jî, dîvê meriv bêje. Zarokên Kurd, çî lî Tırkiyê be û çî jî lî dervayî welat be, çewa tipa “i” dîbinîn, bê irada xwe, ewê yekser wek dengê “i” ya adetî bî lêv dîkîn, ne ku wek dengê “ı” ya Kurdi.

Herwek me berê da zanîn, dengê “ı” ya Kurdi, di zîmanê Kurdi da dengê bîngehî ye û bî tevlihevbûna vi dengî û dengê dîn, sergêjayî û alozî tê pê, ku ev yek bî xwe, zarokên Kurdan jî xwendînê sar dîke, xwendîna Kurdi bî wan dijwartir dîke. Bê şîk, ev yek jî bo zî-manê Kurdi ne qazancek e. Lê jî bo asimilasyonê hacetek e.

6.2.2. Bîngehê tevliheviyê:

Gava di zîmanekî da, dengê (fonemek) bî dengê dîn tevlihev bibe, ev xeterek gelek mezîn e. Herwekî em dîbinîn, “i” ya Hawarê jî dêlva dengê “ı” ya Kurdi têtê bîkaranîn. Me berê da zanîn ku, tipa “i”, jî bîlî alfabeya Romanyayî, di hemû zîmanên ku alfabeyên latînî bî kar tinîn da, mîqabîlê dengê “i” yê ye. Heke Kurd xwedî dewlet û mekteb bûna, xem nîn bû, bîla ev tipa Hawarê bîmaya. Wê gavê, bî talim û terbiya di mektebên Kurdi da, dê Kurd fêr bîbûna, ku ev tip mîqabîlê vi dengî ye. Lê sed heyf û mîxabîn, ne dewleta me û ne jî mektebên me hene. Em di prosesa alfabetîzebûnê da, ne bî al-

fabeya Hawarê, lê bî alfabeya latini ya ku kirasê alfabeya Tırkan lêkiri ye, derbas dibin. Prosesa alfabetizebûnê çiyê û çewa ye, lî jor em lî serê rawestiyan. Gava zarokên Kurd, tipa “î” ya Hawarê, ne wek dengê “i” ya Kurdi, lê wek dengê “î” ya adeti dixwinin, gotin tu mane nadm.

Em bêjin, di hevokekê (cîmle) da pênc-şêş gotin hene. Gava gotina, ku çend “î” yên Hawarê têda hene, wek dengê adeti yên “î” tên xwendinê, ew gotin tu mane nade. Bî gotinek din, çav vê gotinê dibine û dîşine ba mêji. Mêji jî, lî nav xezna xwe ya gotman digere û dîke û nake, tîşteki lî mîqabîlê wê nabine. Jî ber ku, xwendevan mana gotinê fêr nekiriye, mecbûr dibe eyni gotinê bî baldariyek zêdetir dixwine û pê dîhise, ku tipa “î”, ne dengê “î” yê, lê dengê “i” ya kurdi dide. Vê carê, mêji mesaja ku jî çav hatiye di nav xezna gotinan da, dîghijine gotina rast û bî vi awayî, xwendevan wê gotinê fêr dîke.

Ka em piçekî jî nêzik va, lî vê prosa lî jor binêrin. Beri her tiştî, xwendevanê Kurd, di xwendma hevokê da, tê lî gotinekê dilukume. Bî vi awayî, sur’eta xwendina wî kêr dibe. Jî ali din va, ew mecbûr dibe, ku zêdetir bala xwe bide ayni gotinê û jî nûva bixwine. Ev yek jî, bî wî wext dide wendakirinê. Heke ew hevoka, ku ew dixwine piçek dirêj û tevlihev be û çend gotinên bî vi awayî tê da hebî, xwendevan di xwendina xwe da dê gelek xewt wenda bike. Heçî mêjiyê mirov e, xwediyê du cure hafîze (hîş) ye. Hafîza kîn û ya jî bo demek dîrûdirêj. Di xwendina hevokan da, em jî hafîza mêji ya kîn istifade dikin. Di xwendinê da, gava em tîr dawîya hevokê, bî saya vê hafîza kîn e, ku em karin gotina dawiyê û gotinên pêşî yên hevokê bîghijînin hev û jî wan maneyêke gîştî derênin. Lê belê, ev hafîza mêji ya kîn, wek nav lî ser e, zêde dirêj nîne. Lî gora hîr hesabandin, ev hafîza kîn lî dor çend saniyan e. Gava xwendevanê Kurd, di hevokekê da lî çend gotman dilukume û mecbûr dimîne wan jî nû va bixwine, jî bo wî ew wextê hafîza kîn derbas dibe. Jî ber vê yekê jî, ew gotinên ku di destpêkê da hatme xwendin, nayên bira xwendevan. Loma, divê ew vegere serê hevokê û wê cardin bixwine. Ev tişt,

yekcar wextê xwendevan dıgre.

Bı kurti, ev yek ji çend sedeman sedemek e ku diyar dıke, çıma Kurd Kurdi gelek hêdi û kuli-kuli dıxwinm. “i” ya Hawarê, vi kari hisantır nake, mıxabin diwartır û aloztır dıke. Bê şık, ev yek dı riya ber lı asimilasyonê girtinê da, me qels dıke.

Jı xwe tıştek veşarti nine ku, Kurdên siyasi ji dı nav da, Kurdên Kurdistanê Bakur, tıştên bı Tırki nıvisandi, ji yê bi Kurdi nıvisandi sıvıktır û rewantır dıxwinm. Ev yek, ji bo sedi not û pêncên Kurdên ku ji vi perçê Kurdistanê ne, rast e. Ev rastiya tehl û nexweş baş nişanê me dıde ku, talim û terbiya bı salan dı mektebên Tırkan da, xwendına tipên zımanê Tırki çıqas otomatik kırıne. Heke ayni nıvisandın bı zımanê Tırki ji bo xwendevanê Kurd deh deqe kışandıbe, dê ya Kurdi bı kêmasi panzdeh deqe bıqşine (bê şık, ev wext ji bo hemû Kurdan rast nine. Jı bo Kurdên ku hê nû dest bı xwendına Kurdi kırıne, dirêjtır; ji bo ew kesên ku bı salan bı xwendm û nıvisandına Kurdi mijûl bûne, kurtır e).

6.2.3. Tevlihevkırına dengan û mêji:

Gotinên biyani û yê “nylon” gava dı nıvisandinê da tên bıkarandin, ew ji bo xwendevanan hın diwariyan dertinin. Xwendevan çaxa gotinên welê dıxwinın, tê nagihjin. Ev yek ji, tama xwendinê kê m dıke, xwendevan ji xwendinê sar dıke. Lê belê, ev gotinên biyani û yê beji, bı qasi tevlihevbûna dengan sergêjayi û gelemşan dernaynm pêşberi meriv. Em bêjin, dı destê me de nıvisarek yek rûpeli (A4) heye, û dı vê nıvisarê da, sê-çar gotinên biyani yan ji yê “nylon” hene, ku xwendevan tê nagije. Gava ew, wan cimlên bı van gotinan dıxwine, dıbe ku wan baş fê m neke. Lê ji tevayiya nıvisarê, ew kare hızır bıke, ka manên wan gotinan çıne. Dı nıvisarek yek rûpeli da, lı dora 2000-2500 tip tene nıvisandın. Lı gor hesabandına Mir Celadet, dı nav hemû dengên Kurdi da, nis-beta dengê “ı” ya Kurdi % 10.2, ya “i” ya Kurdi % 4.0 e. Bı van nisbetan, dı vê nıvisara yek rûpeli da, mımkmûn e ku dengê

“ı” ya Kurdi 200-250 caran û dengê “i” ya Kurdi 80-100 caran derbas bîbîn. Heke dengê “ı” ya Kurdi bî “i” ya Hawarê hatibe nişankırin, dibe ku xwendevan wan yekcar wek dengê “i” ya adeti bixwine. Bî vi awayi, jî nîşka va nisbeta dengê “ı” ya Kurdi dadîkeve reqemek gelek kê m û dengê “i” ya adeti, jî du qatan zêdetır dibe. Bê şık ev tevlihevi, jî bıkaranina çend gotinên biyani zêdetır zerarê dide zımanê Kurdi. Loma jî, gelek giring e ku, divê ew tipên jî bo wan dengên bîmgehî yê zımanê Kurdi ne, zelal û baş diyar bîn û bî hiç awayi bî hîn tipên dengên dm tevlihev nebîn.

Baş e, gava dî gotinekê da dengê bî dengê dm tevlihev dibe, çira sergêjayî çêdibî?

Me berê da zanîn ku, dî salên pêşî yê zarotiyê da, bêyi ku meriv pê bîhise, meriv zımanê xwe yê zıkmakî dıgre. Zımanê zıkmakî, bî dengên xwe va, bî gotin û qaideyên xwe va dî mêjiyê meriv da tê qeyd kîrîn (depo kîrîn). Gotinên ku dî nav salan da meriv fêr dibe, wek hafîze (hîş), dî mêji da tîn bıcıkırîn. Ev e, ku em jêra dîbêjîn xezîna gotinan (kelîman). Gava em bî yekê ra xeber dîdîn, ew gotinên ku yê lî hîmberê me dîaxive, yek bî yek bî bîhistîne dıghijîn mêji û eynî kelîmên ku dî mêji da depokîrî ne, hîşyar dîkîn. Jî xwe bî vê hîşyarkîrîne ye, ku meriv jî hev dû fê m dîke. Bê şık, ev proses, dî nav sanîsan da pêk tê. Prosesa xwendîne jî, wek me lî jor dît, nêzîkî vê prosesê ye. Dî axaftmê da, deng bî rîya bîhistîne, û dî xwendîne da jî, tip û komên tipan bî rîya dîtîne, dıghijîn mêji. Jî bo ku deng, tip û komên tipan karîbîn deriyên dî mêji da yê n ku, mana wan gotinan dî pîşt da qefîlkîrîne vekîn, divê gotin rast hatîbîn bîlêvkîrîn û xwendîna tipan jî, bî dengên wî zımanî hatîbe kîrîn. Gava dî xwendmê da, şıklê du tipan dîbîn sebebê ku hîn deng tevlihev dîbîn, tîştê ku çav dîbîn û dıgijînîn mêji, nîkarîn wan deriyan vekîn. Loma jî, tîştê ku hatiye xwendî nîyê fêmkîrîn.

Tevlihevkîrîn, çiqas pîçûk dîbîn bîla bîbîn, disa jî, dî têghîştîne da hm sergêjayîyan çêdîkîn. Herwekî du mîftên me

hebin û ew bî girani, bî şikil û mezınayıya xwe weki hevbin, lê tenê yek dıranên wan jî hev cihê be. Bî her du miftan yek deri venabe; her yek deriki cihê vedike. Wek, gava meriv di radyoyê da lî istasyonekê dıgere. Jî bo ku ew istasyon derê, divê meriv pêla wê bîbine. Jî dervayî pêla wê, ew bî tu pêlên din venabe. Gotinên ku di mêjî da qeydkirine jî, bî vî awayî ne. Jî bo ew bî hîşyarkirin, divê di dengên ku dîghijî mîjî da zelalî hebe, tevlihevi tunebe.

6.2.4. Tevlihevkirina dengên û morfolojiya (*)

ziman:

Herçend dengên (fonemên) “a” û “e” du dengên jî hev cihê û serbixwe bin, dengên zimanê Kurdi “ı” û “i” jî, ewçend du dengên serbixwe û jî hev cihê ne. Dibe ku cihderka wan nêzîkî hevbin, lê cardin ew du fonemên cihê ne. Loma jî, di alfabeyê da, ha dengên “a” û “e” tevlihev dibin, ha jî yên “ı” û “i” tevlihev dibin, di derketma sergêjayîyan da, zêde ferqek tune. Ev tevlihevbûn, ne tenê jî bo xwendevan aloziyan dertine, lê herwesa morfolojiya gotinên Kurdi jî xera dîke. Jî bo baş serwextkirinê, em ê li ser nîmûneyekê vê ditîna xwe piçek vekin.

Em rahêjne gotîna “mar” û piçeki jî nêzîk va, lê binêrin. Ev gotin, gotineke Kurdi ye û heywanekî dmîmîne. Ev nav jî sê dangan pêk hatiye; du dengdar û dengdêrek. Em her du dengdarên xwe li ciyên wan bihêlin (m ... r) û tenê dengdêran biguhêzm. Gava dengdêra “e” tê navbera “m” û “r”, ew dibe “mer”. Ev jî gotmek bî mane ye. Wek tê zanîn, “mer” hacetek wek bêrê ye ku meriv pê erdê dîkole. Em dengdêra “i” binîn, ew dibe “mir”. Ev jî gotinek Kurdi ye, wek Mirê Bota. Em “dengdêra “ı” binîn, ew dibe “mır”, yanî tîşteke bî can, mîriye. Em dengdêra “o” binîn, ew dibe “mor”, ku navê rengê ye. Em dengdêra “ê” binîn, ew dibe “mêr”...û hwd. Wek dîxuyê,

*Morfolojî: Beşekî zımannasîyê (linguistic) ye. Ew derheqê qayde û awayên tewandîna gotin û çêkirina gotinên nû ye.

tenê bî guhertîna dengêki, morfemek tê guhertîn, dibe yeka dîn û bî vi awayî, mana gotmê tê guhertîn.

Her car bî guhertîne, tiştên bî mane nayên pê, carna gotin an jî morfema nû bê mane dîmine. Îca, gava dengê “î” ya Kurdi, bî tipa “î” ya Hawarê têtê nişan kîrîn, wek me berê jî dit, ew tip wek tipa “î” ya adeti tê xwendîn û dengê “î” ya Kurdi wenda dibe. Bî guhertîna deng jî, gotm (an jî morfem) tê guhertîn û mana wê gotmê, yan wenda dibe, yan jî maneyeke nû dertê holê -wek nîmûnên lî jor-(mîr, mîr). Gava gotm bê mane dibe, xwendevan mecbûr dîmine disa lî wê gotmê vedigere û wê jî nûva dîxwine. Gava mane tê guhertîn û maneyek dîn dertê (mîr dibe mîr), wê çaxê, tiştê lî ser kaxez ku çav dîbinin û bî şîklê guhasti dîghijînin mêtî, dîçe lî deriyekî şaş dîxe û qefla wî derî vedîke. Îca, gotîna nû û yê dîm lî hev nayên û xwendevan dîvê disa vegere ser eynî hevokê û wê jî nûva bîxwine.

Gava hîn tipên alfabe ya zîmanê Kurdi dîbin sebebê tevli-hevbûna hîn dîngan, ew tip bî morfolojiya zîmanê Kurdi dîleyîzin û jî bo xwendevanê Kurd gelemşe û dîjwariyan derdîxin. Ê jî ber van sedeman jî, ev rewş jî bo zîmanê me ne feyde ye, lê zerar e û xîzmeta asimilasyonê dîke.

6.2.5. Kurdi xwendîn-nîvisandîn şêleke siyasi ye:

Zarokên Kurd lî Kurdistanê Bakur dî mekteban da bî Kurdi naxwînin. Îro bî Kurdi xwendm şêleke siyasi ye. Jî bo ku aqîlê meriv jî siyasetê bigre, dîvê dî warê biyolojîkî û hîşda meriv gîhiştîbe qonaxeke bîlmd. Lewra, welatevîni, şoreşgerî, dîn, welat,...hwd, gotm û ramanên abstrak (muceret) in. Loma jî, xort û keçên Kurd ancax pîştî 15-16 salibûnê, pîştî kamîlbûn û pîçek bî siyasetê eglebûnê, hewîl dîdm ku bî Kurdi bîxwînin.

Zarokên mîletên dîm yê xwedî dewlet û dezgeh, hê jî şeş heft salî ya xwe va, bî zîmanên zîkmakî dest pê dîkm, hînî xwendm

û nıvisandmê dıbin. Ev tê wê manê ku, bı kêmasi nivê ûmrê xort û keçên Kurd dı mektebên Tırkan da derbas dıbe û paşê ji, hm jı wan -mıxabın ne ku hemû-, pıri caran bı nivdılki dest pê dıkın, bı alfabeya Kurdi dıxwinın. Bê mamoste û bê dezgeh, bı tıştên lı ber dest û bı tewrek siyasi, ew bıryara xwe dıdın û dıkevın ser şıverêyekê...

Tevi vê rastiya tehl ya lı ber çavan, hm radıbin û dıbên: "*Ma çiye !? Yê bıxwaze, kare çend tıpan hin bibe !!.*"

6.2.6. Alfabetizebûyina derengmayi:

Dı jiyana merıv de, demek heye ku mêji her dıkemıle û dı her wari de pêş ve dıçe. Ev dem dı navbera jı dayik bûyinê heta balıxbûnê de ye. Tıştên ku merıv dı vê demê de hin dıbin, qurm û rehên gelek qayim dı mêji da datının. Yek jı van tıştan, zımanê zıkmaki ye. Ev zıman, bı awayê axaftınê be ji, jı giyan (ruh) û laşê merıv venaqete, dıbe beşek jı huviyeta merıv. Ev yek, heta radeyek jı bo alfabeyê ji rast e. Kijan alfabeyê merıv bı zaroti hin dıbe, ew jı merıv ra dıbe alfabeya bmgchin. Loma ji, alfabeya ku merıv pışti balıxbûnê, an ji pışti bist salibûnê fêr dıbe, -gava şert û mercên cıvatê bı tevayi neyên guhertın, gava merıv jı nû va dı prosesa sosyalizasyoneka nû ra derbas nebe û bı vi awayi neyê asimile kırın, an ji merıv jı cıvata xwe bı dūr nekeve-, ew tucar nıkare şûna alfabeya yekem bıgre. Ev dı warê biyoloji û fızıyolojiya mêji da qabıl nine. Xwendına ku pışti 15-16 saliyê dest pê dıke, wek ya 7-14 salı nabe otomatik. Mıxabın, vê dema ku carek dm bı destê tu kesi nakeve, dı mektebên Tırkan da jı zarokên Kurdan tê dızın.

Her weha Kurd, jı alfabeya latini ya Romaya Kevn derbasi ya Kurdi nabın, lê jı ya Tırki derbasi ya Kurdi dıbin. Şopa vê derbasbûnê dı xwendına tıpan da diyar e. Lewra gava ku Kurd kıt kıt tıpan bı lêv dıkın, ne wek alfabeya esli ya latini, lê wek alfabeya Tırki, wan bı lêv dıkın: be, ce, çe, de, fe, ge...

6.2.7. Kurdên asimilebûyi:

Iro tiştêk veşarti nîne, ku hema hema nivê nufûsa Kurdistanê Bakur, ji ber sedemên cihê cihê, di nav Tirkên da dijin. Bi milyonan zarokên Kurd, ne tenê di mektebên Tirkên da, lê mixabîn di malên xwe da ji bi Tirkî dipeyivin. Baş e, wê roj bê ev zarok mezûn bibin, wê ew bi welatvaniyê, bi kurdîbûna xwe bihîsin. Ji bo ku xwe ji wê valayîya bêkokbûn û ji xerîbbûna ji cîvata xwe xelas bikin, wê ew bixwazin û hewl bidin ji nû va zîmanê xwe hin bibin. Gelo ev Kurd dê çawa karibin “î” ya Hawarê wek dengê “ı” ya Kurdi bixwinin. Ew bê irada xwe, bêyî ku pê bihîsin, dê yekser “î” yê wek “ı” ya Tirkî bixwinin. Bi vî awayî, dengê “î” ya zîmanê Tirkî dê bîkeve nav Kurdi.

Ji bo ku ev kesên asimilebûyî karibin ji van gelş û tevliheviyan dûrkevin, heke hîn tişt di destên me da bin û ji me bên, em ê çima ji vî kari bîrevm ? Heke em çav li vê tevliheviyê bigrin û mudaxele nekin, wê çaxê em bi xwe sûcdar in, ku em insanên xwe dehf didin ji bo bibin Tirk. Ji ber ku, yên ev asteng deraniye pêşberî wan, em bi xwe ne, ne ku dewleta dijmin e. Vêca ev astenge di xizmeta asimilasyonê da nin be, lê di ya kê da ye?

6.3. Xwe nêzîkkirina alfabeya Tirkî û pedagojî:

Mir Celadet ji bo xwendina Kurdi hêsantir bike, ji bo zîmanê Kurdi bi Kurdan şirintir bike, piştî diyarbûna alfabeya Tirkên, dev ji çend tipên alfabeya xwe berdide, hîm destûr û prensîbên nû dide ber xwe. Mir Celadet bi hêvi bû ku, wê rojê Kurd ji xwe ji nirê dijmin xelas bikin. Lê di sa ji, ewî tesîra mektebên Tirkî li ser zarokên Kurd didit. Ewî bi rastî ji dûr didit. Di dema wî da (1933), li hemû Kurdistanê yek lîseyek tune bû. Ji çend bajarên Kurdistanê (Diyarbakir, Wan, El‘eziz) pê va, li tu deran mektebên navîn (“ortaokul”) ji tune bûn. Ji zarokên Kurdan, tenê ji sedî 3,5 ên wan di mektebên Tirkên da dixwendin (99). Lê di sa ji, Mir Celadet digot: *“Ji wan niqtan pêve ko xasê denganîya kurdî ne, di şîkl û dengên herfan de,*

herçend heye, xwe li elfabêya tirkî nîzing xistin û jê ne dîrketin...

..bî vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabêya tirkî dinasin dê

bikarin bê dişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bihêsanî bixwînin." (destûra pêşî)

Bê şik, iro hejmara "lise" û "ortaokul"ên Tirkî yên ku li Kurdistanê ne, bî sedan, belku bî hezaran in. Heçî kesên ku iro alfabeya Tirkî dînasin, ewende pîr in ku, hêdi li yên çaxa Mir Celadet nayên mîqayesekirin. Ev yek baş nişan dide ku, Mir Celadet di danina alfabeya xwe da hîm prensibên pedagojîyê jî dane ber çavan. Di zanyariya pedagojîyê da, berî her tiştî ev prensib heye: Bî alikariya tiştên ku tên zanin, meriv xwe dişîjine tiştên nû.

Çi Mir Celadet be û çî jî heval û hogirên wî bin, yên ku di çêkirina alfabeya wî da xîzmet kirine, di mektebên Tirkî, yên bî alfabeya latîni da ne xwendine. Loma jî, ne mîmkûn bû ku, ewan hê jî wê rojê va hemû pîrs û pîrsgirêkên jî alfabeya latîni yên ku jî bo Kurdên bakur dertên, karibûna bîditîna.

Disa jî, meriv bî dilgeşî, bî serbîlîndî û bî pesîn kare bêje ku, çewa jî nîmûnên li jor jî diyar dibê, Mir Celadet hîn tişt bî birîne û hîzîr kirîne.

6.3.1. Sedemên ku alfabeya Kurdi û ya Tirkî nêzîkî hev dîkin:

Di nav wan inunaqêşên li ser alfabeya Kurdi ya latîni da ku vê dawîyê bî inisiyativa Enstituya Kurdi ya Stenbolê li dar ketin, li ser nêzîkîyî ku di navbera alfabeya Kurdi û ya Tirkî da heye, hîn sergêjayiyên nû peyda bûn.

Gava meriv alfabeya Kurdi ya latîni û ya Tirkî dide ber hev, gelo çima ew jî alfabe yên latîni yên mîletên din zêdetir nêzîkî hev in ?. Jî alî dm va, herçend di warê ortografîyê da ev

nêzikayi hebe ji, lê dî warên fonetik, morfoloji, sentaks, leksikoloji da, dî navbera her du zımanan da, ferqên gelek mezûn hene. Lî gor van pivanên zımanzaniyê, zımanê Kurdi, jî zımanê Tırki bêtır, nêziki zımanên dîn e yê ku alfabe ya latini bî kar tinin. Lewra, zımanê Kurdi endamê gruba zımanên Hindo-Ewrûpayi ye. Lê belê, wek tê zanin, zımanê Tırki endamê gruba zımanên Ûral-Altayi ye. Dî navbera van her du grûban da, ne tenê ferqine dî warê zımanzaniyê da, lê yê berbiçav yê dî warê tarixî da jî hene.

Nexwe, ev nêzikiya ku dî warê ortografîyê da heye, gelo jî çî sedeman tên pê? Bî ditina mî, sê sedemên bîngihin hene ku her du alfabe ya nêziki hev kîrîne:

1- Ev sedem, sedemeke tarixî ye. Çî Kurd û çî jî Tırk bî, ewan bî sedan sal alfabe yek muşterek bî kar anîne. Her çend tipên alfabe ya erebî (lî gor “zımanê Osmani” modifiyekirî) jî alî her du alîyan va hatibin bî kar anin jî, lê her mîletê, ew tip lî gor xîsûsiyetên zımanê xwe bî lêv kîrîne. Paş ewqas salan, her du mîlet, -kêm zêde dî eynî tarixê de-, her yek bî serê xwe, bîrîyar digre ku wê dev jî vê alfabe yê berdîn û dî şûna wê da alfabe yê nû wê bî kar binin.

2- Jî bo alfabe yê nû, her du mîlet jî terciha xwe lî ser yek alfabe yê, angî alfabe ya latini dîkin. Bî vî awayî, alfabe ya nû jî, wek ya kevî bî hm ferqên piçûk dibe alfabe ya muşterek (alfabe ya latini). Gava meriv piçek jî nêzik va lî vê prosesê binêre, baş diyar dibe ku, problemên her du mîletan, kêm zêde nêziki hev bûn: “*Jî bo filan tipa erebî ku mîqabilê filan dengê me ye, divê em kîjan tipa alfabe ya latini bî kar binin; jî bo bêvan tipa erebî ku mîqabilê bêvan dengê me ye, divê em kîjan tipa alfabe ya latini bî kar binin...?*” Pîraniya wan tipên alfabe ya erebî, dî alfabe ya her du zımanan da wek hev bûn. Loma jî, her du alî - angî Kurd û Tırk-, jî bo tipên muşterek yê erebî, lî hin tipên latini geriyane. (Bê guman, ne ku ew bî hev şewirine û wan gotûbêj kîrîne).

Mîr Celadet Bedîrxan jî sala 1919 an û pêva lî ser alfabe ya

Kurdi ya latini dixebite. Ew geh tipan lê zêde dıke, geh jê kêma dıke, geh tipên alfabeyên cihê cihê tine ba hev, geh wan jî alfabeya xwe derdixe, geh tipên hevedudani bî kar tine, geh jî dêlva wan va “bılındekek”ê datine ser tipekê adeti ya latini... Bî vi awayî, ew heta sala 1928 an, her cehd dıde ku, alfabeyeke tekûz û lihevhati pêk bine. Gava Tirk di sala 1928 an da dev jî alfabeya erebî berdıdm û dest pê dıkn ya latini bî kar tinin, Mir Celadet jî xwediyê alfabeyeke latini ye, ku ew jî bo zımanê Kurdi bî kar tine. Wek me berê jî dit, ev alfabe jî bîst û pênc tipên adeti û du tipên hevedudani (difong) pêk dıhat. (Bınêr rûpel 29).

Di alfabeya sala 1928 an da hın tevlihevi hene. Ewî çend deng bî herfek nişan kırine; Wek di nımûnên dengên “v”-“w” (bî tipa “v”), “g”-“x” (bî tipa “g”) û “i”-“ı”-“ê” (bî tipa “i”) da. Her wesa jî bo du dengên zımanê Kurdi herfên serbıxwe bî kar ne anine, lê yên hevedudani bî kar anine; wek di nımûnên dengên “ş” (herfên “ch”) û “û” (herfên “ou”) dıxuyê.

Di eyni salê da Tirk dest pê dıkn alfabeya latini lî gor zımanê xwe modifiye dıkn û bî kar tinin. Roger Lescot dıbê, alfabeya Tırki ya latini tesir lî C. Bedırxan kırıye (100). Bê şık, Mir Celadet jî nêzik va bala xwe dıda ser Tırkan, ka ew jî bo çareserkırma hın pırsên alfabeyê yên ku “*bûbû mijulahîya wî ya hergavî*”, çî rê dıdane ber xwe û bî çî awayî wan munaqeşe dıkrın. Ev baldayına lî ser alfabeya Tırki, tışteki gelek tabîi û rast e jî. Jî ber du sedeman tabîi ye:

a- Herçend Mir Celadet zımanzan bû û gelek jî jir bû, lê disa jî ewî di şertên gelek dıjwar da ev xebat dıdomandın. Rewşenbırên lî derûdora wî di warê zımanzaniyê da xwedî mehareteki akademiki nin bûn. Alikariya wan heta ciki, mehdût bû. Lê belê, çewa Roger Lescot jî dıbêje, Tırkan jî gelek zımanzanên biyani yên bî navû deng alikari dıgirtın. Loma jî, Mir Celadet di nav çar salan da, jî nêzik va lî vê alfabeyê guhdari kır, da ku zanibe ka di emilandma wê da, çî sergêjayî û tevlihevi jî bo xwendevanên Tirk dertên.

b- Mir Celadet, bî zanin xwest ku pîraniya dengên zîmanê Kurdi bî alfabeyeke bî tipên muşterek nişan bîke, da ku Kurdên Kurdistanê Bakur hêsantir hîni alfabeya Kurdi bîbîn, wê bixwinin û bî wê bînivîsin. Jî xwe wek tê zanin, Mir Celadet, di sala 1932 an da ev xala dawiyê, wek destûrekê jî bo himên çêkîrîna alfabeya xwe datîne.

3- Sedemê sîsiyan yê ku her du alfabeyan nêzîkî hev dike, him û bîngehên jî bo damezrandina wan in. Gava meriv her du alfabeyan dîde ber xwe û li wan hûr dibe, baş dixuyê ku “*esas û bîngehên*” ku jî bo her du alfabeyan bûne him, hema hema yek nînbîn ji lê pîr nêzîkî hev in. Bî taybetî bendên sîsê û çar yê destûrên Mir Celadet, jî bo danîna alfabeya Tîrki ya latîni jî rastin. Ango, Tîrkan jî her dengêkî zîmanê xwe bî herfeke serbixwe nişan kirîne û xwe jî bîkaranîna herfên hevedudanî dîr xîstîne (Destûra sîsiya ya Mir Celadet) û her wesa Tîrkan jî, her dengêk bî herfeke cîhê nişan kirîne, bî gotmeke din, xwe jî “*awayê nişankirîna çend dengan bi herfekê an dengêkî bi çend herfan*” danê alî (Destûra çaran ya Mir Celadet).

Jî xeynê destûra pêşî ya Mir Celadet, ku derheqê alfabeya xwe nêzîkkîrîna alfabeya Tîrki ye, destûrên din jî, du kêr çar zêde, jî bo alfabeya Tîrki rast in. Lê nemaze destûrên sîsê û çar m, ku alfabeya Kurdi ya latîni jî alfabeyên zîmanên din (Îglîzî, Fransîzî, Spanyayî, Almanî) dîr dixînin û nêzîkî ya Tîrki dîkînin. Jî ber ku di alfabeyên wan zîmanan da, jî bo nişankîrîna dengêkî carna çend herfên cîhê yan jî yê hevedudanî (li dijî destûra sîsiyan) û carna jî herfek jî bo çend dengan (li dijî destûra çaran) têne bîkaranînê.

Sedemê ku Mir Celadet van her du destûran danîne, sedemeke li ser prensîban e. Lewra ewî xwestîye, alfabeyeke fonetîk çêbîke. Bî gotmek din, alfabeyeke wesa dayne ku, heta jî dest bê, tipên serbixwe mîqabîlê dengên bîngehî yê Kurdi bînin (deng≈tip). Ew vê prensîbê, jî sedemên zanyariya pedagojîyê, dîcîbîne. Jî xwe jîyanê jî nişan daye ku, ecîbandîna vê prensîbê bîrîyareke rast û di ci da bû.

Ev hevnêzîkbûna alfabeyên latini yên Kurdi û Tırki, nêzîkbûneki dî şîkli da ye. Kurd tipên alfabeya xwe lî gor denganiya zîmanê Kurdi, Tırk jî yên xwe lî gor denganiya zîmanê xwe bî lêv dîkî. Bî gotîneke dî, nêzîkbûna du alfabeyan, nayê wê manê ku, du zîman nêzîkî hev dîbî.

6.4. Alfabeya Hawarê lî Kürdîstana Bakur:

Hawar pîştî sê sal û sê mehan, nema derket û dî sala 1935 an da, pîştî hejmara 26 an, heta sala 1941 î rawestîya. Dr Nûredîn Zaza lî ser sedemên vê rawestandîne weha dînvîsîne: *“Sebebên sekinandina wê pîr bûn. Bi kurtî bêjin ku xwendevanên wê kêr bûn û perê ku jî wan dihat nedihîşt ku ên pê mijûl bûn têra xwe nan bixwin. Kiriyaên (abonên-CC) HAWARê çend Kurdên Sûriyê û çend Behdînanîyên Iraqê bûn. Bi tenê carna, û bi dizî, dikete Kürdîstana Tirkîyê.”* (101).

Loma jî, dî nav wan salan da û salên bî dû da, alfabeya Hewarê dî nav Kurdên Kürdîstana Bakur da nehatîbû ceribandî, ku jî bo himdarê vê alfabeyê diyar bibe, ka bî vê alfabeyê jî bo xwendevanên Kurd çî gelş û sergêjayî dertên pê. Hemû xewn û xeyala Mir Celadet, daxwaz û miradê wî ew bû ku, rojekê Kurdên Kürdîstana Bakur bî alfabeya wî hin bîbî, bixwin û bînvîsî. Jî ber vê yekê ye, ewî xwestîye alfabeya xwe nêzîkî ya Tırkî bike. Heke daxwaza wî, ne wulo bûya, dê ewî alfabeya xwe nêzîkî ya Fransîzî û Îngilîzî bîkî. Lewra, wê demê Sûriye dî bî hukmê Fransayê da û Iraq jî dî bî yê Britanyayê da bûn. Heke daxwaza wî ya sereki, jî bo fêrbûna Kurdên Sûriyê, Behdînan û yên dervayî welat bûya, dê ewî ewçend gîringî neda ser nêzîkkîrma alfabeya Tırkî.

Bî kurt û kurmancî: Her pîrsa kumîk û nîqutê ye, yê ku her car pîrsên dîne yên lî ser alfabeya Kurdi ya latini tinî pê. Loma jî, dîvê ev pîrs hêdî ne yê gemîrandî û rojekê zûtîr bê helkîrî. Bî vê helkîrîne ra, em ê him jî tevlihevi û sergêjayîyên

ku lı jor hatın qalkırın bıfılıtın û hım ji, jı hın gelemşên ku bı
gotûbêjên lı ser vê babetê car car dertên pêşberi me, xwe xelas
bıkın. Dem jı bo vê guhertinê (modifiyekırinê) hatiye û derbas
ji dibe.

7. ENCAM

Dî vê xebatê da tevi pîrsa kumîka lî ser “î” û nîquta lî ser “i” yê, hîn pîrsên dîn yê alfabeya Kurdi-latîni jî hatme vedan. Gîraniya vê xebatê lî ser pîrsa kumîk û nîqutê ye. Heta jî dest hati, mîn jî nêzik va lî wan nêrin, iddia û delilên ku jî bo parastina kumîk û nîqutê tîn holê nîhêrt, wan da ber ditênên himdarê vê alfabeyê, pîvanên zîmanzanîyê û tecrûbên jî welêt.

Bî vê lêkolinê ez gîhiştîm van encaman:

1- Xebatên jî bo alfabeya Kurdi-latîni beriya xebatên Mir Celadet Bedîrxan dest pê kirîne.

2- Bî vê lêkolinê alfabeya Mir Celadet ya jî sala 1928 an derdikeve ronahîyê. Ev alfabe jî 25 tip û du diftongan pêk tê. Dî vê alfabeyê da tu kumîk nehatîne bîkaranîn.

3- Dî danîna alfabeya xwe da, dî gel şeş destûrên xwe Mir Celadet nisbetên dangan jî dane ber çavan.

4- Jî bo ku Kurdên bakur bî hêsani hînî xwendm û nivîsandînê bîbm, ewî bî zanîn alfabeya xwe nêzîkî ya Tîrkî kirîye. Jî xwe wan destûrên jî bo danîna alfabeya wî û yê jî bo danîna alfabeya Tîrkî gelekî nêzîkî hev bûn.

5- Sedemê danîna nîquta ser “i” yê, ne jî xîsûsiyeteke zîmanê Kurdi tê. Ev sedem jî “î” ya alfabeya Tîrkî tê, ku ew dî nav hîn tipan da wenda dibû û jî bo xwendevanên Tîrk dijwariyan derdiani.

6- Dî pergala (rêza) tipên alfabeya Mir Celadet û dî ya tipên

alfabeya Tırkan da tevliheviyek heye. Tipa ji bo dengê “i” ya adeti dî her du alfabeyan da pîştî tipa neadeti (modifiyekirî) tê. Wesa dîxuyê ku pîştî ku Mîr Celadet tipa “i” yê jî bo dengê “ı” ya Kurdi bî kar aniye, jî bo dengê “i” ya Kurdi tu tipên adeti dî destên wî da nemane. Loma jî jî bo dengê “i” ya Kurdi ew mecbûr dimine kumîkekê bine ser tipa “î” yê.

7- Bî danîna kumîka lî ser “î” yê Mîr Celadet jî çend destûrên xwe bî dûr dîkeve.

8- Mîr Celadet lî gor tecrubên jî jiyanê, dî alfabeya xwe da guhertin çikîrîne (Bo nîmûne, tipên jî bo dengên “k” û “q” yê bî hev guhaztîne). Ew dî riya tekûzkîrîna alfabeya xwe da ne muhafezekar bû.

9- Cara yekem, nêzîkî sîh sal pîştî çikîrîna alfabeya Hawarê, ew lî Kurdîstana Bakur hat nasîn û bîkaranîn. Himdarê vê alfabeyê bî xwe dî mektebên Tırkan da bî tipên latîni nehatîbû perwerdekîrîn. Loma jî ne qabîl bû ku ewî hê dî wan salan da bir bîbîra ku ka bî xwendîna bî vê alfabeyê, dê jî bo zarokên Kurd çî sergêjayîyan deraniya.

10- Jî bo demek kurt be jî dî destpêka salên 1960 î da Kurdan alfabeya Tırkî jî bo nîvisên Kurdi bî kar anîne. Sedemê vê yekê nenasîna alfabeya Hawarê ye. Pîştî ku ev alfabe jî alî Kurdan va hatiye nasîn, dî her keysê da wan wê bî kar anîne. Herwesa bî ceribandînen dî jiyanê da, Kurdan jî dêlva “i” û “î” ya Hawarê bîkaranîna tipên “ı” û “i” yê jî xwe ra qenctîr dîtîne. Jî xwe dî nav salên 1960-1980 an da lî ser vê modifiyekîrmê ne tu munaqêşe lî dar ketîne û ne jî bîkaranîna “ı-i” yê jî bo hîn kesan gelemşe û tevliheviyan deranîne.

11- Munaqêşên lî ser kumîka “î” û nîquta “i” yê, munaqêşên nû ne. Pîştî sala 1980 an gava du tradîsyonên jî alî mekan û tecruban va jî hev cîhê lî Ewrûpayê rasti hev hatîn, van munaqêşan dest pê kîrîn. Kurdên ku jî mêj va lî Ewrûpayê mabûn, yê nûhati ku wan tipên “ı” û “i” bî kar dîanîn, bî

ithamên gıran sũcdar dıkırın. Pışti ku dı sala 1983 an da Enstıtuya Kurdi ya Parisê bıryar gırt ku dıvê kumık û nıqut bê bıkaranın, hêdi kesi nexwest ku mora “bêberpırsıyariyê” lı wan bê xıstın. Bı vi awayi, ne bı baweri û jı dılûcan lê jı tırsa ithaman, hın kes û kovaran dest pê kırın kumık û nıqutê bı kar anin.

12- Nêrin, iddia û delilên ku jı bal hın kesın va jı bo parastına kumık û nıqutê tên pêşkêşkırın, jı zanıstiyê dûr m. Ew hissi ne û loma jı mirovan qanı nakın.

13- Pışti dengê “e” yê, dengê “ı” ya zımanê Kurdi dı nav hemû dengên zımanê Kurdi da yê ku nisbeta wê heri zêdetır e. Jı xwe ev her du deng (e, ı) bı hev ra, bıngêhê dengdêrên zımanê Kurdi pêk tinın. Loma jı dıvê dengên nisbetzêde bı tipên zelal bên nişankırın da ku ew bı tu tipên dın tevlihev nebın.

14- Bı alfabetizebûna bê mekteb û derengmayi, em nıkarın “ı” ya Hawarê (dengê “ı” ya Kurdi) bıparêzın. Lewra dı hemû alfabeyên serdest da (çı ya Tırki û çı jı yên mıletên dm) tipa “ı” yê mıqabilê dengê “ı” ya adeti ye û gava zarokên Kurd vê tipê dıxwinın, ew wê ne wek dengê “ı” ya Kurdi, lê yekser wek “ı” ya adeti dıxwinın.

15- Tevlihevkırına du dangan, nevrofizyolojiya zıman serûbınê hev dıke û herwesa bı morfolojiya zıman jı dıleyize.

16- Hemû tıştên ku dı xwendın û nıvisandına Kurdi da jı bo Kurdan diywariyan dertinın, wan dılukuminın û wan jı xwendına Kurdi sar dıkın, keysê dıdın asimilasyonê ku ew hê kûrtır û berfirehtır bıbe. Mıxabın wan sergêji û tevliheviyên ku jı ber kumık û nıquta lı ser du tipên alfabeya Hawarê hatine pê, lı dij asimilasyonê pıšta me qayımtır nakın, lê qelstır dıkın.

17- Bı rakırına kumık û nıqutê, zımanê Kurdi nêziki zımanê Tırki nabe. Jı ber ku em lı gora denganiya zımanê xwe tipan

bî lêv dîkîn; ne ku tip bî xwe lî hemû derên cihanê xwediyê dengên standart in.

18- Bî modifiyekirîna tipên “i-î” yên alfabeya Hawarê , Kurd dev jî vê alfabeyê bernadîn, wê hê tekûztir dîkm.

19- Rakirîna kumîk û nîqutê, ne tenê jî bo Kurdên Kurdistanê Bakur, lê herwesa jî bo yên Kurdistanê Başûr û Rojhelat jî dê xwendin û nivisandina Kurdi hêsantir û rewantir bibe.

20- Maka hemû munaqesên ku di van salên dawiyê da lî ser alfabeya Kurdi-latîni lî dar ketine, her pîrsa kumîk û nîqutê bûne. Loma jî divê ev pîrs rojek zûtirin bê çareserkirin. Jî bo çareserkirîna vê pîrsê, wesa dîxuyê ku rîya herî aqilane rakirîna kumîka lî ser “î” yê ye. Bî vi awayî him pergala tipên alfabeya me wê tekûz bibe û him jî, wek di alfabeyên mîletên din da, wê tipa “i” ya Hawarê bibe mîqabilê dengê “î” ya Kurdi.

21- Jî ber ku di nav hemû dengên zîmanê Kurdi da nisbeta dengên “h’ ” û “x’ ” yê gelekî kêmtir in û herwesa pîrî caran ew dengên devokên herêmi ne, hewce nake ku em di alfabeya xwe da jî bo van du dengan tipên taybetî deynîn. Heçî pîrsa dengên “hîşk” yên “p, ç, k, t” û “r” ya stûr e, di nav Kurdan da lî ser tipên jî bo van dengan lihevkarînek (consensus) peyda bûye û divê ev lihevkarî bê parastin.

22- Bêyî ku ew wek tipeke serbixwe bibeve nav alfabeya Kurdi, jî bo transkripsiyonên klasîkên Kurdi û di hîm ciyên zarûrî da, meriv dengê ‘eyna Kurdi dîkare bî apostrofeke nîşan bibe. Wek di nîmûna ‘Eli da.

23- Pîrsa yekîtîya zîmanê xwendin û nivisandinê, pîrseke ku bî qebûlkirîna alfabeyeke muşterek va girêdayî ye. Jî bo pêkanîna alfabeyeke bî vi awayî, divê alfabeya Hawarê ya bî du tipan modifiyekirî bîmgêh bête girtin.

Ez hêvî dikim ku wê ev xebat munaqeseyên ku di vi warî da

hene kûrtır û berfirehtır bıke û hın lêkolinên nû teşwîq bıke,
da ku rojeki zûtır pîrsên alfabeya me bı awaki ılmî bêne
çareserkırın.

8. ÇEND ÎLAWE

8.1. ÎLAWE -I

Hesibandina dî gotineke Kurdi da kêmezêde (bînavîncî) çend deng/tip hene:

X= Hejmara dengan/tîpan

f= Hejmara gotinên bî van dengan

fx= x . f

n= $\sum f$ = Yekûna hemû gotinên ku bî awayê randomî (rasthatî) jî ferhenga D. îzoli hatine hilbijartin.

$\sum fx$ =Yekûna hemû fx-an

x= Bînavîncî (average)

$$x = \frac{\sum fx}{\sum f}$$

$$x = \frac{11584}{2042}$$

$$x = 5,67$$

x	f	fx
1.....	2.....	2
2.....	53.....	106
3.....	184.....	552
4.....	272.....	1088
5.....	521.....	2605
6.....	408.....	2448
7.....	269.....	1883
8.....	190.....	1520
9.....	66.....	594
10.....	63.....	630
11.....	12.....	132
12.....	2.....	24
n=2042		11584

8.2. İLAWÉ-II

TABLOYËN CELADET BEDIRXAN:

TABLO -1

NİSBETA HERFAN

NİSBETA GİŞTİ

a:.....	1500	î:.....	700	ş:.....	160
b:.....	650	j:.....	300	t:.....	400
c:.....	120	k:.....	650	u:.....	120
ç:.....	150	l:.....	450	û:.....	450
d:.....	840	m:.....	550	v:.....	500
e:.....	2200	n:.....	1300	w:.....	350
ê:.....	1000	o:.....	400	x-x:.....	340
f:.....	150	p:.....	120	y:.....	200
g:.....	200	q:.....	140	z:.....	150
h-h:.....	350	r:.....	1100		
i:.....	1800	s:.....	340		

TABLO - 2

NİSBETA HERFAN LI GOR ZARAVÊN CÎHÊ

	BAKUR	BAŞÛR	ROAVAYÊ BAKUR (Palo)	ROAVAYÊ BAKUR (Sîwêrek)
a:	239	332	292	292
b:	73	90	67	68
c:	10	20	27	28
ç:	29	24	27	26
d:	101	109	95	94
e:	378	564	386	386
ê:	170	85	151	167
f:	12	6	13	12
g:	44	51	40	38
h:	56	47	53	53
i:	337	291	308	296
î:	139	160	142	145
j:	62	10	0	5
k:	116	137	88	89
l:	64	130	66	63
m:	112	140	114	114
n:	260	231	238	253
o:	60	44	115	121
p:	27	28	30	29
q:	11	14	14	13
r:	191	209	212	222
s:	41	45	39	41
ş:	57	69	75	55
t:	133	131	86	90
u:	29	37	38	38
û:	62	54	40	44
v:	65	0	69	71
w:	83	161	95	98
x:	50	33	39	41
y:	51	68	45	44
z:	38	36	77	76

9. ÇAVKANÎ

- 1- Cemal Nebez, Zmani Yekgirtûyi Kurdi, r. 84, 1976, Almanya.
- 2- E. M. Diyakonov, Tarixê Mad, r. 339, wergera farîsî, 1345, (Tehran
- 3- Yê jî Heredot neqıl dıke, Borekeyi Sefizade Seddiq, Mêjûy Wêjey Kurdi-I, r. 18, 1991, Baneh, Kurdistan.
- 4- Borekeyi Sefizade Seddiq, Mêjûy Wêjey Kurdi-I, r. 15-16, 18, 1991, Baneh, Kurdistan.
- 5- Borekeyi S. S., and, r. 22-23.
- 6- Campbell, G. L., Compendium of the World's Languages, Vol I, p. 126, 1991, London.
- 7- Borekeyi S. S., and, r. 17.
- 8- Soran Sineyi, Qewalla Konekani Hewraman Kontirin Belgeyi Nûsrawi Zîwani Neteweyi Kurd ke ta êsta dozrawetewa, Sırwe, hej. 67, r. 41-45, 1991, Wîrmiye.
- 9- Borekeyi. S. S., and, r. 19.
- 10- Borekeyi S. S., and, r. 20.
- 11- Musa Anter, Ferhenga Khurdî-Tirkî/Kürtçe-Türkçe Sıızlûk, r.164, 1967, İstanbul.
- 12- Şêx Muhamed Merdûxi Kurdistanî, Tarixa Kurd û Kurdistan, wergera 'Ebdilkerim Mihemed Seid, r. 302, 1991.
- 13- Şêx Muhamed Merdûxi Kurdistanî, and, r. 81.
- 14- Borekeyi Sefizade Seddiq, and, r. 20.
- 15- Borekeyi S. S., Nameyi Ferhengê İran-Defterê dovom, r. 16 (222)
- 16- Malmisanij & M. Lewendi, Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî 1908-1981, r. 56, 1989, Uppsala.
- 17- Badıllı Kemal, Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri, s. 23, İkinci baskı 1992, MED Yayıncılık, İstanbul.
- 18- Dr. Şıvan -Adara 1971-, dı pêşgotına kîtêba "Zmanê Kurd" da, r.15, 1976, Kava Yayınları, İstanbul.
- 19- Jîn 1918-1919, Cild 1, r. 6, jî Pêşkêşîya M.E. Bozarslan, 1985, Weşanxana Deng, Uppsala.
- 20- Cemal Nebez, Zmani Yekgirtûyi Kurdi, r. 79, 111, 1976, Almanya

21-Ekrem Cemil Paşa, Muhtasar Hayatım, s. 42-43, Beybun Yayınları, 2. baskı, 1992.

22-Hawar, jimar 13, Pêşgotinek, r. 1-2, ji pêşgotina Mihemed Bekir ya di çapa nû ya Hawar 1-9 da, hatiye girtin, r. XXI, Weşanxana Hawar, 1987, Stockholm.

23-Hawar, jimar 13, Pêşgotinek, r. 1-2 .

24-Kopiya vê destnîvisê ji arşîva Mihemed Uzun hatiye girtin.

25-Dr Nûredin Zaza, pêşgotina ji bo çapa nû ya Hawarê, 1975, Lozan

26-Osman Sebri, Elifbê ya Kurdî, Hêvi, hejmar 1, r. 19, 1983, Paris.

27-Hawar, hej. 2, r. 6-7, 1932, Şam.

28-Hawar, hej. 3, r. 4, 1932, Şam.

29-Emîr Celadet Bedirxan & Roger Lescot, Kürtçe Grameri, s. 36, tarix ?, Doz Yayınları, İstanbul.

30-Emîr Celadet Bedirxan & Roger Lescot, Kürtçe Grameri, s. 37,...

31-Hawar, hej. 2, r. 7, 1932, Şam.

32-Hawar, hej. 3, r. 4-5, 1932.

33-Hawar, hej. 24, r. 1, 1934.

34-Hawar, hej. 5, r. 6, 1932.

35-Hawar, hej. 6, r. 7, 1932.

36-Hawar, hej. 6, r. 6-7, 1932.

37-Hawar, hej. 8, r. 9, 1932.

38-Hawar, hej. 9, r. 8, 1932.

39-Hawar, hej. 10, r. 4; hej. 11, r. 5, 1932.

40-Reşo Zîlan, "Kovara Berbangê û Nivîsandina Kurdî", Berbang, hej. 1, r. 9-10, 1982, Swêd.

41-"Li ser wêje û ziman PANELEK", Berbang, Hej. 9, r. 3, 1985.

42-Reşo Zîlan, "Dîsan Pirsî Guhartina Alfabeyê", Bergeh, hej. 8, r. 79-85, 1990, Stockholm.

43-R. Zîlan, Dîsan Pirsî ..., and, r. 81-82.

44-Murat Yilmaz, "Çend gotm li ser nivîsandina dengdarên 'DÎTIN'ê", Berbang, hej. 2, r. 19-21, 1982.

45-"Ziman", Hêvî, Hejmar 1, r. 16-17, 1983, Paris.

46-R. Barnas, "Rastnivîsîna Kurdî", Hêvî, hej. 1, r. 25-28, 1983.

47-Osman Sebrî, ELİFBÊYA TİKÛZ, r. 16, 1982, Swêd.

48-"Xweyîyê Hawarê", Hawar, hej. 10, r. 5, 1932.

49-Cemal Nebez, and, r. 80.

50-Cemal Nebez, and, r. 80-83.

51-Cemal Nebez, and, r. 80-89.

52-Cemal Nebez, Zımanî Yekgirtûy Kurdi, r. 90. Eslê van hevokan bî soranî ye û bî vî awayî ye: "Herweha bo 'bızroke'; le cîyatî (î) wa bînûsîn: (î) - wek turkekan deynûsîn - w ew ca (î) jî awa bînûsîn (î). Ew deme le çokley ser (î) e ke rîzgar man debê."

53-Mîn bî xwe ev kîtêban nediye. Ev agahdari jî Kerim Danişyar hatiye girtin. Lî gor Malmisanîj ev kîtêb hatme transkribekirin.

54-"Ziman", Hêvî, hej. 1, r. 11, 1983.

55-Hawar, Hej. 1, r. 4, 1932, çapa nû (1987), Stockholm.

56-Qanatê Kurdo, Zımanê Kurdi-Rêzıman, Weşanên Komkar, r. 18, 1981. Dî nivisandîna orjînal da, nivîskar kumîk û nîqutê bî kar anîye. Weşanxana Komkar kumîka lî ser "î" yê û nîquta lî ser "i" yê rakirîye.

57-Qanadê Kurdo, and, r. 13.

58-Qanadê Kurdo, and, r. 11-12.

59-Bîneçey kurdan û bîncîney zımanî kurdi, danêr: Tewfîq Wehbi, wergêr: Teha Feyzîzade, r. 49, sal ?, Mehabad.

60-Reşo Zîlan, ..., Bergeh, 8/1991, r. 80, Swêd.

61-Reşo Zîlan, "Reformek Pêwîst e", Bergeh, 1/1989, r. 85, Swêd.

62-Hawar, hej. 2, r. 6, 1932.

63-Çend xebatên ku dî warê fonetîka Kurdi da hatme kirin: Dr. Ewrehmanê Hacı Marîf, "Zımanê Kurdi le ber roşîniyê fonetîk da", Kori Zanyarî Kurd, 1976, Bexda. Smirnova I. A., Eyyûbî K. R., Fonetîka Kurdsîkîgo Jazyka (Fonetîka Zımanê Kurdi, zaravayê Mukri). Weşanên Nauka, Leningrad, 1985, 340 r.

64-Reşo Zîlan, ..., Berbang, 1/82, r. 10, 1982.

65-Musa Anter, İleri Yurd, no: 500, 1959. Jı kîtêba Malmîsanij & M. Lewendî, Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981), r. 116, 1989, Swêd, hatiye girtm.

66-“CAV PIS”, Dicle-Fırat, Yıl 1 - Sayı: 1. Jı kîtêba Malmîsanij & M. Lewendî, and, r. 136, hatiye girtin.

67-Berga dawin a kovara Deng, no:1, jı kîtêba Malmîsanij & M. Lewendî, and, r. 153, hatiye girtm.

68-Kemal Badıllı, Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri-Kürmançça Lehçesi, s. 25-27, Med Yayınları, İkinci Baskı,1992, İstanbul.

69-Emîr Celadet Bedirxan & Roger Lescot, Kurtçe Grameri, Giriş, s. XVI, Doz Yayıncılık, İstanbul.

70-M. Anter, Ferhanga Khurdî-Tirkî, Pêşgotin, r. 4, 1967, İstanbul.

71-M. Emin Bozarslan, Alfabe, r. 3, 1968.

72-Kovara Karakoçan, r. 21, Nisan 1969, jı Malmîsanij & M Lewendî, r. 190 i hatiye girtm.

73-Dr. N. Zaza lı ser qapaxê dawiyê yê “Zmanê Kurd”, K. Bedirxan - S. Şivan, 1976, Kava Yayınları, İstanbul.

74-Rızgari, hej. 1, r. 86, 21ê Adara 1976, Ankara.

75-Rojen Barnas, “Ez Mendaleki Çar Sali me, Mamo !”, Tirêj, hej.1, r. 15-16, 1979, İzmir.

76-“Daxwuyaniyek”, Berbang, 4/1985, r. 14, Swêd.

77-Reşo Zilan, ..., Bergeh, 8/1991, r. 85.

78-Reşo Zilan, ..., Bergeh, 8/1991, r. 83-85.

79-Hawar, hej 10, r. 4, 1932.

80-S. Rêving, “Divê em xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xelas bikin”, Armanc, hej. 125, r. 6, Sibat 1992, Swêd.

81-Mahmûd Lewendî, “Em jî nebin wek ‘Ibix’an”, Armanc, hej. 134, r. 4, Çileyê Pêşîn, 1992, Swêd.

82-“Zmanê Kurdi”, Rızgari, hej. 1, r. 78, 1976, Ankara.

83-Malmîsanij & M Lewendî, and, jı rûpelên cihê cihê ev agahdari hatme girtm.

84- Wan, Hej. 6, r. 65-69, 1993, Stockholm.

85-DİE, 1960 Genel Nüfus Sayımı, s. 151-152, jı 1. Beşikçi -Doğuda Değişim ve Yapısal sorunlar, s. 88, 1969,

hatiye girtin.

86-S. Rêving, "Li ser rapora Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê", Armanc, hej. 142, r. 5, İlon 1993, Swêd.

87-Hawar, hej 2, r. 7, 1932.

88-S. Rêving, "Divê em xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xelas bikin", Armanc..., r. 7.

89-Kurdîstan (1898-1902), Wergêrê ji tipên Erebi bo tipên Latini û yê ji nûva daye çapkirinê: M. Emîn Bozarslan, Çapa nû 1991, Swêd. Ji bo vê agahiyê li Rûpelê pêşin yê hejmarê yekê binêre, Kurdîstan, r. 119, Cild I. Di cilda II da, ev reqem 200 hatiye nişandan. Di her du hejmarên (17 û 18) ku Malmîsanij peyda kirine û ji nûva daye çapkirinê da, ev reqem 2000 e.

90-Mahmûd Lewendî, "Ji serokê Enstîtuya Kurdî ya İstenbolê Şefîk Beyaz re.", Wan, hej. 6, r. 68-69, 1993, Swêd.

91-Malmîsanij, "Ji serokê Komîta Karger a Enstîtuya Kurdî Şefîk Beyaz re", Wan, hej. 6, r. 65-67, 1993, Swêd.

92-Hêvi, "Ziman", hej 1, r. 10-16, 1983, Paris.

93-Hawar, hej. 1, r. 4, 1932.

94-Emir Celadet Bedirxan & Roger Lescot, and, s. 5,

95-Baran Rizgar, Kurdish-English/English-Kurdish Dictionary, Statistics on the kurkish sounds, p. 379-382, 1993, London.

96-Emîr C. Bedirxan & R. Lescot, and, s. 8,

97-Zagrosê Hajo, "Alfabêta Kurdî", Armanc, hej. 109, 1990, Swêd.

98-Baran Rizgar, and, r. 379-382, 1993, London.

99-Celadet Ali Bedirxan, Bir Kürt Aydınından M. Kemal'e MEKTUP, r. 33, 1933, çapa nû: DOZ Yayıncılık, 1992, İstanbul.

100-Mir Celadet Bedirxan & Roger Lescot, and, Giriş, s. XIII, Doz Yayıncılık, İstanbul.

101-Dr. N. Zaza, pêşgotma ji bo çapa nû ya Hawarê, 1975, Lozan.